



**K.T.**

**Zanîngeha Artukluyê ya Mêrdînê  
Enstîtûya Zimanên Zindî yên li Tirkîyeyê  
Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî**

**Teza Lîsansa Bilind**

**ANALÎZA KURMANCIYA DEREGEZA  
XORASANÊ LI GOR HÊMANÊN  
ZIMANNASIYÊ**

**Mehdi Jafarzadeh**

**15711021**

**Şêwirmend**

**Doç. Alk. Dr. Necat Keskin**

**Mêrdîn, 2017**



**T.C.**

**Mardin Artuklu Üniversitesi**

**Türkiye’de Yaşayan Diller Enstitüsü**

**Kürt Dili ve Kültürü Anabilim Dalı**

**Yüksek Lisans Tezi**

**ANALÎZA KURMANCIYA DEREĞEZA  
XORASANÊ LI GOR HÊMANÊN  
ZIMANNASIYÊ**

**Mehdi Jafarzadeh**

**15711021**

**Danışman**

**Yrd. Doç. Dr.Necat Keskin**

**Mardin, 2017**

# TAAHHÜTNAME

## TÜRKİYE’DE YAŞAYAN DİLLER ENSTİTÜSÜ MÜDÜRLÜĞÜNE

Mardin Artuklu Üniversitesi Lisansüstü Eğitim-Öğretim ve Sınav Yönetmeliğine göre hazırlamış olduğum “**Analıza Kurmanciya Deregeza Xorasanê Li Gor Hêmanên Zimannasiyê**” adlı tezin tamamen kendi çalışmam olduğunu ve her alıntıya kaynak gösterdiğimi ve tez yazım kılavuzuna uygun olarak hazırladığımı taahhüt eder, tezimin/projemin kağıt ve elektronik kopyalarının Mardin Artuklu Üniversitesi Türkiye’de Yaşayan Diller Enstitüsü arşivlerinde aşağıda belirttiğim koşullarda saklanmasına izin verdiğimi onaylarım. Lisansüstü Eğitim-Öğretim yönetmeliğinin ilgili maddeleri uyarınca gereğinin yapılmasını arz ederim.

- Tezimin/Projemin tamamı her yerden erişime açılabilir.
- Tezimin/Projemin sadece Mardin Artuklu Üniversitesi yerleşkelerinden erişime açılabilir.
- Tezimin/Projemin ... yıl süreyle erişime açılmasını istemiyorum. Bu sürenin sonunda uzatma için başvuruda bulunmadığım takdirde, tezimin/projemin tamamı her yerden erişime açılabilir.

.../.../.....

Mehdi Jafarzadeh

## KABUL VE ONAY

Mehdi Jafarzadeh tarafından hazırlanan “Analiza Kurmanciya Deregeza Xorasanê Li Gor Hêmanên Zimannasiyê” adındaki çalışma, 28.09.2017 tarihinde yapılan savunma sınavı sonucunda jürimiz tarafından Kürt Dili ve Kültürü Anabilim Dalı, **YÜKSEK LİSANS TEZİ** olarak oybirliği ile kabul edilmiştir.

Doç. Dr. Rafik SULAIMAN

*R. Sulaiman*

(Başkan)

Doç. Dr. Hayreddin KIZIL

*H. Kizil*

Yrd. Doç. Dr. Necat KESKIN

*N. Keskin*

Onay

Enstitü Müdürü

Doç. Dr. M. Nesim DORU

## PÊŞGOTIN Û SPASÎ

Dema mirov bala xwe dide ser zimanê kurdî, şêweyên cihêreng û diyalektên curbicur tên bihîstin. Li her welatekî ku kurd lê dijîn zimanê wan jî ketiye bin tesîra zimanê wî welatî. Ji ber nebûna sîstema perwerdehiyê zimanê kurdî li gelek herêman pêş neketiye û biroj (update) nebûye. Gelek caran dema kurd li ser mijareke modern diaxivin, di zimanê xwe de kêmasiyê dibînin û bi zimanê ku pê perwerdehî dîtine rahettir dikarin xwe derbibirin. Ev mesele ji ber gelek sedeman rojbiroj kûrtir jî dibe. Li Xorasanê jî gelek kurd, ji zimanê xwe dûr ketine û êdî zarokên kurd bi zimanekî din diaxivin. Dayîk û bavên kurd jî helbet li ber vê meseleyê xemsar in û nediyar e gelo ayendeya kurmanciya herêma Xorasanê dê çi bibe. Kurdên Xorasanê piranî kurmancîaxêv in û devoka wan kurdiya bakur ango kurmanciya jorîn e. Li gor dîrokê, niha çend sede ji koçkirina wan ber bi Xorasanê ve, derbas dibe. Li gor amarên nefermî zêdetirî milyonekê kurd li Xorasanê dijîn ku hîn piraniya kesên mezintir ji 20 salan, kurdî diaxivin yan jî fam dikin. Ev lêkolîn hewldaneke biçûk e ku dixwaze behsa zimanê kurdiya kurmanî ya herêma Deregeza Xorasanê bike û kurmanciya wê herêmê wesf bike.

Ev xebat ji sê beşan pêk hatiye. Di beşa yekem de, dê mijar û meseleyên girîng yên di vê tezê de bînin ravekirin. Herwisa sinorên lêkolînê ji hêla erdnîgarî û mijarê ve tê ravekirin, û rêbaza lêkolînê dê zelal bibe. Paşxaneya demografîk li herêma Xorasanê û hebûna kurdan li wir tê eşkerekirin. Di beşa duyem de çarçoveya teorîk û têgehî tê şirovekirin û zimannasî û hêmanên serekî û beşên serekî di zimannasiyê de yên ku ji bo vê vekolînê pêwîst in, tînin ravekirin. Di beşa sêyem de analîza kurmanciya herêma Deregezê li gor hêmanên zimannasiyê, tê pêşkêşkirin. Ji bo kesên ku dixwazin zêdetir devoka Deregeza Xorasanê binasin, ev beş wêneyeke giştî li ber çavên wî/wê vedike. Di dawiya xebatê de pêvek û çîrok û ferhenkok hatiye zêdekirin ku çavkaniyên serekî ji bo vê xebatê tînin hesibandin. Herwisas ji bo kesên ku li ser zimanê kurdî û bi taybet ji bo kesên ku li ser devokên cuda yên kurmanî dixebitin, ev lêkolîn dikare bibe çavkaniyekê. Ji

ber ku ziman bi xwe beşeke girîng ji civak û folklorê ye, em di vê bawerê da ne ku ev çavkanî dikare bi kêrî civaknasan û folklorzanan jî bê.

## **SPASÎ**

Xwendina ziman û edebiyata kurdî li dibistan an zanîngehê hertim xeyala min bû, dema ku min bihîst li Mêrdînê beşa ziman û edebiyata kurdî hatiye vekirin, min biryar da ku ez jî herim û li wir xwendina xwe bidomînim, bi rêya dost û hevalan min xwe gihand zanîngeha Artukluyê lê di vê rêyê de gelek kesan alîkariya min kirin ku ez pêwîst dibînim spasiya wan bikim:

Pêşî ez spasdarê dê û bavê xwe me ji ber ku ew herdu yekemîn mamosteyên min yên rastîn bûn, wan çand û zimanê me parast û weke emanet û mîrateke giranbiha raberî min kirin.

Destxweşiya xanima hêja Fahriye Adsay dikim, wê weke xwengeke mezin û dilsoz alîkariya min kir heta min karî xwe bigihînim zanîngeha Mêrdînê.

Deyndarê Mihemed Emîn Cirik û malbata wî ya hêja me, bi dilgermî pêşwaziya min kirin û gelek alîkariya min kirin.

Spasdarî bo hemû mamosteyên min ên hêja li zanîngeha Artukluyê; Prof. Farûq Ismaîl, Mamoste Behruz Shujai, Doç. Alk. Dr. Mustafa Aslan, Dr. Mehmed Tayfon (Malmisanij), mamoste Mikail Bülbül, Doç. Alk. Dr. Shahab Vali, Doç. Alk. Dr. Yılmaz Özdil, Mamoste Remezan Alan, Dr. Remezan Pertev û hemû karmendên hêja yên beşa zimanê kurdî ku hertim bi her awayî alîkariya min kirin.

Spasiyeke taybet jî bo şewirmendê min Doç. Alk. Dr. Necat Keskin ku serê xwe di vê xebatê de êşand û ji bo bidawîanîna vê vekolînê, rêbazên zanistî nîşanî min dan. Herwisa spasiya endamên jûriya parastina têza xwe dikim; Doç. Dr. Rafik Sulaiman, Doç. Dr. Hayrettin Kızıl ku bi baldarî xebata min xwendin û hin xalên hewceyî serrastkirinê, destnîşan kirin.

Ez deyndarê mamoste Prof. Farûq Ismaîl, Dr. Behrûz Shujai û Mamoste Mikail Bûlbûl im, ji ber ku wan bi pisporiya xwe ya li ser zimannasiyê bala min kişand ser mijara zimannasiyê û bûn rênîşandêrên min ji bo vê xebatê.

Destxweşiya hevalê birûmet, Selîm Temo dikim ku pirtûkxaneya xwe ya şexsî li ser min vekir û gelek çavkaniyên kevn yên ku li ser kurmanciya Xorasanê hatibûn nivîsîn, nîşanî min da ku gelek bo lêkolîna min sûdmend bûn.

Herwisa ez spasdarê hevalên xwe yên hêja; Cemal Özer, Deniz Çakan û Evdilrehman Akin im ku wan ez weke endamekî mala xwe ya xwendekariyê pejirandim û alîkariyê min kirin.

Mehdi Jafarzadeh

Mêrdîn 2017

## **KURTE**

Ev xebat dixwaze kurdiya kurmancî ya li herêma Deregeza Xorasanê, li gor hêmanên zimannasiyê analîz bike. Kurdên Xorasanê bi devoka kurmanciya bakurî diaxivin. Kurdên wê herêmê li du parêzgehên Xorasana bakurî û Xorasana Rezewî niştecih bûne. Li gor texmînên nefermî nifûsa kurdên wê herêmê ji milyonek kes zêdetir e. Li vê herêmê gelek etnîk weke, kurd, tat, fars, tirk, tirkman û belûç dijîn. Wisa xuya ye ku piraniya van etnîkan ji deverên din hatine û li Xorasanê bi cih bûne. Zêderengiya etnîkî di herêmê de hin bandor li ser zimanê kurdî danîne. Ev xebat dê nîşan bide ku di kurmanciya kurdên herêma Deregeza Xorasanê de ferq û guherînên binyadî di kîjan hêmanên zimannasiyê de zêdetir pêk hatine.

### **Bêjeyên Sereke**

Ziman, zimanê kurdî, kurdiya kurmancî, Xorasan, Kurmanciya Deregezê



## ÖZET

Bu çalışmanın amacı, dilbilim unsurlarına göre Horasan Deregez bölgesindeki Kurmanci lehçesinin analizinin yapılmasıdır. Horasan bölgesindeki Kürtler, Kuzey Kürtçesinin lehçesini konuşurlar. O bölgedeki Kürtler, Kuzey Horasanda ve Razavi Horasanında yaşamaktalar. Resmi olmayan tahminlere göre bu bölgelerdeki toplam Kürt nüfusunun 1 milyondan fazla dır. Bu bölge etnik yapı olarak Kürt, Fars, Türk, Beluç, Türkmen ve Tat gibi farklı etnik gruplar barındırıyor. Öyle görülüyor ki bu etnik gruplar çoğunluğu farklı bölgelerden buraya göç etmiştir. Bölgedeki çok çeşitli etnik yapılanmanın Kürtçe dili üzerine az da olsa etkisi olmuştur. Bu çalışmada Horasan bölgesinin Deregez yöresindeki Kürtlerin konuştukları kurmancinin köken bakımından fark ve değişimlerini hangi dilbilim unsurlarına göre bir araya geldiğini göreceğiz.

### **Anahtar kelimeler**

Dil, Kürtçe dili, Kürtçe/ Kurmanci, Horasan, Deregez Kurmanccası

## **ABSTRACT**

This study is to analyse the Daragazi Kurmanji of Khorasan according to basics of linguistics. The dialect of Khorasani Kurdish is north Kurdish (Kurmanji). The Kurds live mainly in the two district, northern and Razavi Khorasan. The total number of the Khorasani Kurds can be estimated almost one million. This region, is characterised by a large ethnic diversity; Kurds, Baluches, Lurs, Turks, Turkmen, etc., though most of them have appeared here as a result of migration from other areas. The mixture of population in the region had some effect on Kurdish dialect that is spoken in that area. This study will focus on the most remarkable changes of basic characteristics of kurmanji dialect of the Daragazi Kurdish.

### **Key Words**

Language, Kurdish Languages, North Kurdish, Khorasan, Daragazi Kurmanji

## NAVEROK

<b>PÊŞGOTIN Û SPASÎ</b> .....	<b>I</b>
<b>KURTE</b> .....	<b>IV</b>
<b>ÖZET</b> .....	<b>V</b>
<b>ABSTRACT</b> .....	<b>VI</b>
<b>NAVEROK</b> .....	<b>VII</b>
<b>LÎSTEYA CEDWELAN</b> .....	<b>IX</b>
<b>LÎSTEYA WÊNEYAN</b> .....	<b>X</b>
<b>KURTEBÊJE</b> .....	<b>XI</b>
<b>DESTPÊK</b> .....	<b>1</b>
<b>BEŞA YEKEM</b> .....	<b>3</b>
<b>MIJAR, ARMANC Û RÊBAZ</b> .....	<b>3</b>
1.1.    Mijara lêkolînê .....	3
1.1.1.    Xebatên zimanî li ser herêma Xorasanê .....	4
1.2.    Armanc û girîngî .....	6
1.3.    Sinorên lêkolînê ji hêla erdnigarî û mijarê ve .....	7
1.4.    Rêbaza lêkolînê .....	9
1.5.    Kêşeyên lêkolînê .....	11
<b>BEŞA DUYEM</b> .....	<b>13</b>
<b>ÇARÇOVEYA TEORÎK Û TÊGEHÎ</b> .....	<b>13</b>
2.1.    Zimannasî (Linguistics) .....	13
2.1.1.    Dengnasî (Phonology) .....	14
2.1.2.    Bêjesazî (Morphology) .....	16
2.1.3.    Hevoksazî (Syntax).....	23
2.2.    Zimanê kurdî .....	24
2.3.    Dîrok û paşxaneya demografîk ya kurdên Xorasanê .....	27
2.3.1.    Hebûna kurdan li Xorasanê berî serdema Sefewiyan .....	28

2.3.2.	Kurdên Xorasanê; serdema Sefewiyan û pişt re .....	29
2.3.3.	Herêma Deregezê û kurdên Deregezê .....	32
<b>BEŞA SÊYEM .....</b>		<b>35</b>
<b>ANALÎZA KURMANCIYA DEREGEZA XORASANÊ LI GORÎ</b>		
<b>HÊMANÊN ZIMANNASIYÊ .....</b>		<b>35</b>
3.1.	Dengnasiya kurmanciya Deregezê (Phonology) .....	35
3.1.1.	Pevguherîna nedengdêran .....	36
3.1.2.	Dengdêr û pevguherîna dengdêran .....	40
3.2.	Bêjesazî (Morphology) .....	43
3.2.1.	Nîşankirina rewşê (Case marking) .....	43
3.2.2.	Nîşankirina rewşê û zayendê (Case and Gender) .....	45
3.2.3.	Bangnîşan (Vocative); .....	46
3.2.4.	Nasyarî (Definite) .....	47
3.2.5.	Nenasyarî (Indefinite) .....	48
3.2.6.	Nenasyarî û zayend (Indefinite and gender) .....	49
3.2.7.	Vegerok (Referential) .....	50
3.2.8.	Cihnav (Pronoun) .....	50
3.2.9.	Lêker (Verb) .....	54
3.2.10.	Rengdêr (Adjective) .....	59
3.2.11.	Îzafe (the Îzafe construction) .....	61
3.3.	Hevoksazî (Syntax) .....	63
3.3.1.	Peyvrêzî (word order) .....	63
3.3.2.	Bingihanek (Relative clause) .....	64
3.3.3.	Forma tebatî (Passive) .....	65
<b>ENCAM .....</b>		<b>67</b>
<b>ÇAVKANÎ .....</b>		<b>70</b>
<b>PÊVEK .....</b>		<b>76</b>
<b>ÇÎROK .....</b>		<b>76</b>
<b>FERHENGOK .....</b>		<b>101</b>

## LÎSTEYA CEDWELAN

Cedwel	Rûpel
Cedwela 1: Cihnavên kesîn di kurmacî de .....	22
Cedwela 2: Îsoglosa zimanên Îranî.....	25
Cedwela 3: Dengdêrin kurdî û cihê bilêvkirina wan. ....	40
Cedwela 4: Cihnavên kesîn di kurmaciya Dergezê de .....	51
Cedwela 5: Diyarkerên nîşandêr di kurmaciya Dergezê de.....	51
Cedwela 6: Ferhengok .....	133

## LÎSTEYA WÊNEYAN

Wêne	Rûpel
Wêne 1: Nexşeya Îranê.....	8
Wêne 2: Sinorên teqribî yên dabeşkirina devokên kurdî .....	26
Wêne 3: Xorasan, sinorê Îran û Tirkmenistanê .....	32
Wêne 4: Rewşa Erdnîgariya bajarê Deregezê .....	33



## KURTEBÊJE

<i>A</i>	Kara (Biker) bo lêkerên têper
<i>BZ</i>	Berî Zayînê
<i>Bnr.</i>	Binêrin
<i>C</i>	Cild
<i>Hwd</i>	Her wekî din
<i>Hr</i>	Heman rûpel
<i>Hb</i>	Heman berhem
<i>KB</i>	Kurmanciya Bakurî
<i>KD</i>	Kurmanciya Deregezê
<i>No</i>	Number
<i>O</i>	Berkar bo lêkerên têper
<i>Ph</i>	Pirjimar
<i>PZ</i>	Piştî Zayînê
<i>r</i>	rûpel
<i>SVO</i>	Subject-Verb-Object
<i>SOV</i>	Subject-Object-Verb
<i>s</i>	Sede (sedsal)
<i>S</i>	Kara bo lêkerên têneper
<i>Yh</i>	Yekjimar
<i>Vol</i>	Volume

## DESTPÊK

Li bakur-rojhilata Îranê li ser sinorê Îran û Tirkmanistanê herêmek heye ku navê wê Xorasan e. Parek ji gelê kurd li wir dijîn ku diyalekta wan kurmanciya bakurî ye. Nifûsa kurdên Xorasanê ji milyonekê zêdetir e û ew li ser sinorê Îran û Turkmanistanê hatine bicihkirin. Ali Madih di lêkolîneke xwe de hejmara gundên kurdan li herêma Xorasanê weke 696 gundan destnîşan kirine.<sup>1</sup> Ku helbet hejmareke zêde ji kurdên wir li bajarên Meşhed, Qoçan, Çinaran, Farûc, Şîrwan, Bujnord, Esferayên, Deregez, Kelatê Nadir, Laîn, Mane-Similqan û Aşxanê dijîn.<sup>2</sup>

Di erdnîgariya Xorasanê de gelek komên etnîkî yên din jî weke belûç, lûr, tirkman, azerî, ereb, fars û tat dijîn.<sup>3</sup> Ji ber hebûna komên etnîkî yên cihêreng û firehngiya çandî li wê herêmê, zimanê kurdên wir jî hin guherîn têda çêbûne. Helbet ev firehzimanî û firehçandî zêdetir di nava bajarên wê herêmê de xwe nîşan dide. Gundên kurdan li herêma Xorasanê teqriben yekdest in yanî di piraniya gundên kurdan de tenê kurd dijîn. Li gor zanista zimannasiyê kontakta zimanî (language contact) dikare bibe sedema guherînên zimanî, ziman dikarin têkevin bin tesîra hevdu. Dikarin ji hev bêjeyan deyn bikin û heta di demeke dirêj de guherînên fonetîk jî di sirûştê zimanên di kontaktê de dikare bê dîtin.<sup>4</sup>

Meseleyeke din ku li ser zimanê herêma Xorasanê bandor daniye, nebûna sîstema perwerdehiyê û herwisa nebûna medyayên weke telvezyon û radyoyê ye. Li Îranê zimanê fermî û dewletî zimanê farsî ye, zimanên ji bilî farsî derfet û firseta

---

<sup>1</sup> Abbas Ali Madih, "The Kurds of Khorasan", **BIRLL**, Iran and the Caucasus, 2007, Vol. 11, No. 1. r.1.

<sup>2</sup> Afrasiab Shekofteh, **The Kurds in Khorasan, North-east of Iran**, 2008, r. 7. <http://www.penkurd.org/englizi/varia/The-Kurds-in-Khorasan.pdf> (tarîxa têketinê, 12.07.2017)

<sup>3</sup> Pierre Oberling, **Khorasani. Ethnic Groups**, Encyclopedia Iranica, 2008.

Herwisa ji bo agahiyên berfirehtir li çavkanîyên jêrê binêrin:

Bnr. Afrasiab Shekofteh, **The Kurds...** 2008; Garnik Asatrian, **Prolegomena to the Study of the Kurds**. Iran and the Caucasus, 2009, 13.; Henry Walter Bellew. **An Inquiry into the Ethnography of Afghanistan**. Oriental University Institute. London, 1891; Bnr. Henry Walter Bellew, **From the Indus to the Tigris, A Narrative of a Journey Through the Countries of Balochistan, Afghanistan, Khorassan and Iran**, London, Trübner Co. 1872.

<sup>4</sup> Muriel Norde, Bob de Jonge, **Language Contact: New perspectives**, Cornelius Hasselblatt, Amsterdam, 2010. r. 13.



perwerdehiyê nabînin; medyayên ji bilî zimanê farsî gelekî kêmhejmar û li hin deveran jî bi awayekî nefermî qedexa ne. Li gor vê yekê kurmanciya herêma Xorasanê jî li gor bajar û gundan ne yeksan e yanî bajar bi bajar û gund bi gund heta li gor eşîretan jî dikare bê guhertin û şêwezarên cihêreng bîn bihîstin. Ev guherîn jî bi şeklên curbicur dikare bê dîtin, li hin herêman, ew guherîn bi awayekê rêzimanî (bêjesazî û hevoksazî) pêk hatiye û li hin deveran ew guherîn zêdetir ji hêla leksokolojîyê ve tê dîtin. Li gor xebata meydanî li herêma Xorasanê mirov rastî awayên curbicur ji guherînan tê. Devokên curbicur ên ku li wir tên bihîstin, li gor mijara axaftinê û gundî yan bajarîbûna axêver tê guhertin. Bi giştî li herêma Xorasanê normeke yeksan ya zimanî ji bo hemû cihan nayê dîtin.

Ji ber berfirehbûna erdnîgariya herêma Xorasanê derfet û wext nebû ku mirov bikaribe hemû herêmên Xorasanê têxe nava vê lêkolînê, loma tenê herêmeke biçûk ji Xorasanê ku bajarê Deregezê ye, ji bo vê lêkolînê hatiye bijartin. Ev bajar li ser sinorê Turkmanistanê ye, Deregez 120 km dûrî Qoçanê û 40 km dûrî Askabadê ye. Ev pirs heye ka gelo li ser kurmanciya herêma Xorasanê lêkolînên zimanî hatine kirin yan na? ji ber vê yekê hewce ye mirov bala xwe bide ser çavkanî û lêkolînan. Di lêgerînên mijarên girêdayî bi vê lêkolînê de hin çavkanî hatine dîtin, ku di beşa (1.1.1.) de tên pêşkêşkirin, ji aliyekî din ve dibe ku hin çavkanî û lêkolîn li ser kurmanciya herêma Xorasanê, bi zimanên din jî hebin ku em hêvî dikin di xebatên zimanî yên paşerojê de bîn dîtin.

## BEŞA YEKEM

### MIJAR, ARMANC Û RÊBAZ

Di beşa yekem de mijar, armanc, rêbaz û pirsê vê lêkolînê tên zelalkirin; herwisa pêwîstî bo lêkolînê bi vî rengî tên ravekirin. Mijara lêkolînê ji hêla çarçove û xebatê ve tê şirovkirin. Di vê beşê de hewl hatiye dayîn ku ji bo xwîner îmajek ji herêma Xorasanê û kurmanciya Deregezê bê çêkirin.

Piştî zelalkirina mijar û pirsên sereke di vê lêkolînê de binbeşeke din ku gelekî pêwîst e bê zelalkirin, armanc û girîngiya vê lêkolînê ye, dibe ku kesek bi xwe re bibêje ka gelo armanca vê xebatê çî ye yan girîngiya xebatên bi vî rengî çî ye, di vê beşê de ew pirs hatiye bersivdan.

Herwisa pêwîst e sinorên lêkolînê hem ji hêla mijarê ve û hem jî ji hêla erdnîgariyê ve bê diyarkirin, ji ber ku Xorasan herêmeke berfireh e, ne mimkîn bû ku mirov bikaribe xwe bigihîne hemû dever û gund û bajarên kurdan loma jî sinorê vê lêkolînê di vê beşê de tê taînkirin.

Di dawiya vê beşê de rêbaza vê lêkolînê tê zelalkirin, yanî tê diyarkirin ka ev xebat li ser çî bingeheke têorîk tê meşandin.

#### 1.1.Mijara lêkolînê

Mijara vê xebatê analîzkirina kurmanciya Deregeza Xorasanê li gorî hêmanên zimannasiyê ye. Pirsê serekî jî ew e ku bê destnîşankirin ka guherînên zimanî di kîjan beşa zimanî de zêdetir pêk hatiye. Deregez beşek ji herêma Xorasanê ye û lêkolînên zimannasiyê yê kamil û temam li ser herêma Xorasanê herwisa devera Deregezê nehatine kirin. Wek ku li tarîxê heye, axêverên herêma Xorasanê bi piranî di serdema Şah-Abasê Sefewî de ji deverên kurdnişîn (Kurdistanê) ber bi Xorasanê ve hatine

koçberkirin.<sup>5</sup> Ji aliyekî din ve dema mirov bala xwe dide ser qisekirina kurdên Xorasanê bandora zimanên din yên wê herêmê, weke farsî, tirkî, tirkmenî û hin zimanên weke tirkiya cuqetayî (Çağatay Türkçesi) jî divê nehê jibîrkirin.<sup>6</sup> Herwisa bê dîtin ku derbasbûna demê û cudabûna û dûrketina kurdên Xorasanê ji kurdên Kurdistanê, bandoreke çawan li ser zimanê herêma Xorasanê daniye û guherînen fonolojîk û morfolojîk dê diyar bibin. Ji ser navên eşîrên Xorasanê û devokên kurmançî li wir, tê xuyakirin ku kurdên wir ji herêmên curbicur ji Kurdistana Bakur hatine koçberkirin.<sup>7</sup>

Di vê lêkolînê de analîzeke wesfî ji kurmançiya herêma Deregeza Xorasanê, li gor hêmanên zimannasiyê tê nîşandan û gramera kurmançiya herêma Deregezê tê ravekirin. Herwisa gelek caran ji bo zelalbûna mijar û mînakên di vê lêkolînê de pêwîst hatiye dîtin ji kurmançiya bakurî bê istifadekirin. Mebest ji kurdiya bakur, heman kurmançiya bakur e ku niha li Tirkiyê tê axiftin û herwisa di kovara *Hawarê* de jî ev şêwezar hatiye bikaranîn û nivîsîn.<sup>8</sup> Ji aliyekî din ve pêwîst e xebatên zimannasiyê yên ku li ser kurmançiya Xorasanê jî bîn destnîşankirin.

### 1.1.1. Xebatên zimanî li ser herêma Xorasanê

Berî ku mirov bixwaze dest bi lêkolînê bike hewce ye çavkanî û lêkolînên berê bi hûrgilî bîn raçavkirin loma jî di lêgerînan de hin çavkanî hatin dîtin ku li ser herêma Xorasanê û kurmançiya wir hatine pêşkêşkirin.

Li gor çavkaniyên ku jib o vê tîzê hatine dîtin, yekemîn pirtûka ku li ser zimanê kurdên Xorasanê hatiye nivîsîn, sala 1853 ji aliyê Ilya Nikolaevič Berésine (1818-1896) ve bûye. Nivîskarî di xebata xwe de cih daye zimanên din yên îranî jî û

---

<sup>5</sup> Mebest herêmên kurdnişîn yên ku niha di navbera 4 welatên Îran, Tirkiye, Iraq û Sûriyeyê de ye. Li gor lêkolînên vekoler, cihê teqez, bajar yan herêma ku kurdên Xorasanê berî koça xwe ji Kurdistanê lê dijyan, nehatiye diyarkirin.

Bnr. محمد حسین پایلی یزدی، کوچ نشینی در شمال خراسان، ترجمه اصغر کریمی، آستان قدس، مشهد، 1371، ص78

<sup>6</sup> Behruz Shujai, *The Kurdish of Gilan*, (Teza Çapnebûyî), Uppsala University, 2000, r.5.

<sup>7</sup> Abbas Ali Madih, "The kurds of Khorasan" ... r.17.

<sup>8</sup> Kovara *Hawarê* ji aliyê Celadet Alî Bedirxan ve di sala 1932ê li Sûriyê dihat çapkirin.

Bnr. Victoria Fromkin, Robert Rodman, Nina Hyams, *an Introduction to Language*, Ninth Edition, Wadsworth, Cengage Learning, 2011. r. 479.

tenê 61 hevok ji kurmanciya Xorasanê qeyd kirine. Ev lêkolîn ji sê cildan pêk tê. Nivîskarî di cilda sêyem de ferhengê amade kiriye ku kurmanciya Xorasanê weke kurdiya rojhilat û kurdiya Kurdistana (sorani) Îranê weke kurdiya rojava bi nav kiriye.<sup>9</sup>

Albert Houtum-Schindler sala 1881ê tê Mehabadê û piştî demekê diçe Xorasanê li Nêşabûrê eşîreta Emarlû<sup>10</sup> dibîne û li wê derê ferhengê jî devoka kurmanciya Amariyan (Emarlû) amade dike. Di pirtûka wî ku di sala 1884an tê çapkirin de jî bilf kurmancî, Goranî, Kelhurî, û hin zimanên din jî cih digirin.

Lêkolîneke din ku li ser zimanê herêma Xorasanê û Turkmenistanê hatiye kirin, ji aliyê Çerkezê Xuduyê Bakaiv ve bûye. Ev lêkolîn sala 1962ê li devera Turkmenistanê hatiye encamdan. Ev pirtûk bi navê *Tekstên Kurdên Tirkmêniya* li Moskovayê hatiye çapkirin û bi zimanê rûsî ye. Ev lêkolîn li ser bêjesazî û hevoksaziyê sekiniye û bi awayekî berfireh zimanê wê herêmê analîz kiriye.

Yekî din ku li ser kurdên Xorasan xebat kiriye Isaac Tsukerman (ЦУКЕРМАН) e. Tsukerman têza xwe ya doktorayê, sala 1986ê li ser herêma Xorasan û Turkmenistanê bi dawî aniye û lêkolîneke berfireh li ser zimanê herêma navborî kiriye. Di dawiya pirtûkê de çîrokên gelêrî yên wê herêmê hatine tomar kirin û bi awayekê wesfî analîza kurmanciya herêma Xorasanê û Turkmenistanê hatiye kiriye. Navê wê lêkolînê *kurmanciya Xorasanê* ye û sala 1986ê li Moskovayê hatiye çapkirin.

Ev xebatên ku li jorê amaje pê hatin kirin di lêgerînên ji bo amadekirina vê

---

<sup>9</sup> Bnr. Berésine Ílya Nikolaevič. **Recherches Sur Les Dialectes Persans. Volume 1**, Casan, Université de Casan. 1853, r. 25-31.

Berésine Ílya Nikolaevič, **Recherches Sur Les Dialectes Persans. Volume 3**. Casan: Université de Casan, 1853.

Albert Houtum-Schindler, **Beiträge Zum Kurdischen Wortschatze. Zeitschrift Der Deutschen Morgenländischen Gesellschaft**, 1884p. 43-116.

И. И. ЦУКЕРМАН, **Chorasanskij Kurmandji**: Issledonaviei Teksty ХОРАСАНСКИЙ КУРМАНДЖИ: ИССЛЕДОВАНИЕ И. 1986.

Цукман, И.И **Хорасанский Куранджи**, Москва, Академия НАУК СССР, 1986.

<sup>10</sup> Eşîreteke kurd e ku li Xorasanê dijîn, herwisa parek jî vê eşîretê li herêma Gilana Îranê jî dijîn.

tezê de hatine dîtin. Wek ku tê xuyakirin di vê mijarê de xebat kêma in, bi kêmasî di kurmancî de, ku ev yek jî girîngiya vê tezê careke din derdixê meydanê.

## 1.2. Armanca û girîngî

Armanca vê xebatê qeydkirina gramera kurmanciya bajarê Deregezê li Xorasanê ye. Ji ber ku ziman yek ji çavkaniyên girîng ji bo civaknasî û etnografîyê tê hesibandin;<sup>11</sup> Di civakên du zimanî yan çend zimanî weke devera Xorasanê de, ev lêkolîn dikare bibe çavkaniyek ji bo berçavgirtina rastiya civakî. Herwisa eger berpîrsên pergala perwerdehiyê bixwazin li gor ziman û qabiliyetên herêma Xorasanê sîstema perwerdehiyê ava bikin, lêkolînên bi vî rengî dikarin rê nîşanî wan bidin; ji aliyê din jî bo amadekariya kitêb û dersên dibistanên herêma Xorasanê, xebatên zanistî yên zimanî dikarin bibin çavkaniyên pêbawer. Ji aliyê din ve, ev vekolîn û vekolînên bi vî rengî dikarin deriyekî nû bo zimannasiyê û zimannasan vekin, da ku nezelaliyên zimannasiyê hindiktir bikin. Îro jî ber hin sedemên civakî-siyasî û nebûna statûya zimanî ji bo zimanê kêma li Îranê, xelkê herêma Xorasanê jî berê xwe didin zimanê serdest û hêdî hêdî zimanê wan ber bi jibîrbûnê ve diçe. Helbet teknolojiyê û sîstemên pêwendiyê yên nû jî ev proseya jibîrkirina çand û zimanî, lezgîntir kiriye. Loma jî girîng e herçiqas zûtir ziman û devokên cihêreng bên tomakirin û parastin. Li ser vê bingeha fikrî vekolînên li ser zimanî bi awayekê zanistî pêwîst in. Di maweya çend salan de mirov dikare bibîne ku nifş bi nifş û sal bi sal hejmara axêverên kurd bi zimanê kurdiya kurmancî li Xorasanê kêmtir dibe. Vekolînên zanistî dikarin van sedemên dîrketina xelkê ji zimanê xwe yê dayîkî destnîşan bikin û herwisa dikarin ji bo avakirina standard yan normeke zimanî bibin çavkanî.

Di vê xebatê de armancake din jî ku pêwîst e li ser bê sekinîn ev e ku li gor dîtinên nivîskarê vê xebatê û hevpeyvînan bi axêverên herêma Xorasanê re, gelek kurdên wê herêmê ji hebûna kurmancîaxêvên deverên din yên dinyayê nehaydar in.

---

<sup>11</sup>Ronald Wardhaugh and Janet M. Fuller, **An Introduction to Sociolinguistics**, Wiley Blackwell, West Sussex, 2015, r.277.

Eger lêkolînên bi vî rengî li ber destê kurdên Xorasanê hebin, ku yek ji armancên vê xebatê jî ew e, bi taybetî jî haya nifşên nû dê ji ziman û çanda wan çêbibe. Ji aliyê din ve ev xebat dê têkiliyekê di navbera kurmancîaxêvên herêmên cuda de çêbibe.

### **1.3.Sinorên lêkolînê ji hêla erdnigarî û mijarê ve**


Devera ku ev xebat li ser hatiye kirin, Deregeza Xorasanê ye. Deregez bajarek e li ser Xorasana Rezevî ku li bakur-rojhilatê Îranê ye. Celîlê Celîl di pirtûka xwe ya *Sêxiştiyên kurmancî, Xorasanê* de wisa dibêje: “...*Xorasan diaspora kurda ya here mezin û here kevn e...*”.<sup>12</sup> Lê wisa ku di beşa dîroka hebûna kurdan li Xorasanê (2.3) de tê şirovekirin, ji ber hebûna herdemî ya kurdan li Xorasanê ku li gor çavkaniyan vedigere derdora hezar salan berî niha, êdî wateya dîasporayê belkî ji bo herêma Xorasanê re ne guncaw be. Kurdên Xorasanê niha li du parêzgehên Xorasana Rezevî û Xorasana Şumalî niştecih in.<sup>13</sup>

Wek ku di nexşeyê de jî (Wêne 1) xuya dike Xorasan ji aliyê bakur, bi Turkmanistanê re û ji aliyê rojhilat, bi Turkmanistan û Efxanistanê re hevsinor e.

---

<sup>12</sup> Celîl Celîl & Gulê Şadkam, *Sêxiştiyên Kurmancî Xorasan*, Enstîtûya kurdzaniyê, Wien 2012. r. 5.

<sup>13</sup> Abbas Ali Madih, “The kurds of Khorasan” ... 2007, r. 11.



Wêne 1: Nexşeya Îranê.<sup>14</sup>

Li gor amarên nefermî nifûsa kurdên Xorasanê derdora milyonek kes e.<sup>15</sup> Demîrhan û Hajiyan di xebateke xwe de hejmara kurdên Xorasanê teqrîben du milyon kes destnîşan kirine.<sup>16</sup> Piraniya kurdên Xorasanê niştecihên gundan in lê herwisa hejmarek ji kurdên wir hîn koçer in; Bi giştî hejmara kurdên Xorasanê yê ku li gundan dimînin zêdetir ji kurdên li bajaran in.<sup>17</sup>

Wisa ku di sernava vê vekolînê de jî heye, ev lêkolîn hewl dide kurmanciya herêma Deregezê li gor hêmanên zimannasiyê analîz bike û bi giştî divê bê gotin ku hewla vê analîzê, derxistina gramera kurmanciya herêma navborî ye û wesfandina zimanê rojane ya herêma Deregezê ye.

<sup>14</sup> <https://www.mapsofworld.com/iran/iran-political-map.html> Dîroka têtetînê: 20.7.2017)

<sup>15</sup> Hb. r.11.

<sup>16</sup> Abdollah Hajiyan, û Umîd Demîrhan. “Gulbijêrek ji Çand û Wêjeya Kurdên Xorasanê”, *Fritillaria Kurdica*, 2017. 16, r. 68-160.

<sup>17</sup> Afrasiab Shekofteh, *the Kurds in Khorasan...*, r. 8.

## 1.4. Rêbaza lêkolînê

Bingeha vê xebatê, lêkolîneke meydanî li herêma Deregezê ye ku sala 2014ê weke deng, çîrok û hevpeyvîn hatine qeydkirin. Çîrokbêj û axêver ji wê herêmê ne û xwecihên gundên derdora Deregezê ne; me ji bo xebata meydanî û hevpeyvînan serdana gundên *Çinar, Quroçan, Momewan, Rehmenqulî, Geyîgan, Maliyan* û *Sayînan* kir. Ji 5 çîrokbêjan ku sê jin û du jî mêr bûn, me çîrok berhev kirin. Hemû çîrokbêj ji pêncî salî mezintir bûn. Piraniya wan nexwenda bûn. Mezintirîn axêvera ku pê re hevpeyvîn hatiye çêkirin 110 salî bû. Gelekan ji wan ji bilî kurdiya kurmancî zimanekî din nizanîbûn û zimanê pêwendiya wan bi cîhanê re kurdiya kurmancî bû.

Ji bilî dengên qeydkirî û hevpeyvînan, hin çavkaniyên din jî di vê lêkolînê de bi kar hatine weke çavkaniyên tarîxî yên ku qala kurdan û koça wan ber bi Xorasanê ve kirine, ji layekî din ve çavkaniyên erdnigariyê ku herêma Xorasanê rave kirine jî bûne jêder. Herwisa sefername yên berî koça mezin a kurdan ber bi Xorasanê ve di vê lêkolînê de weke çavkanî gelek sûdmend bûne. Ji ber ku li gor agahiyên van pirtûkan mirov dikare hebûna kurdan li Xorasanê berî serdema dewleta Sefewiyî jê derxe. Herwisa lêkolînên li ser zimanê kurdî bûne çavkanî. Çavkaniyeke din ku gelek sûd jê hatiye wergirtin, teza masterê ya Behruz Shujai ye.<sup>18</sup> Teza Shujai li ser kurdên Gîlanê hatiye nivîsîn.<sup>19</sup> Ji ber ku kurdên Emarlû ku niha li Gîlanê dijîn ji Xorasanê ber bi Gîlanê ve hatine koçberkirin, tevî hin ferq û guherînên ku bi demê re ketiye nava devoka Xorasan û Gîlanê lê eger mirov bala xwe bide ser vê xebatê û xebata ku Shujai pêk aniye û mînakên herdu deveran berawird bike, şibihîn û yeksaniya wan du devokan dê bibîne.<sup>20</sup>

Ji ber ku herêma Xorasanê berfireh e û derfeta xebata meydanî di hemû bajarên wê herêmê de nemimkin bû, ji ber vê hindê ev xebat tenê bajarê Deregezê weke cihê lêkolînê hatiye bijartin. Helbet angaştê wê xebatê jî ew nîne ku hemû

<sup>18</sup>Behruz Shujai, *The Kurdish of Gilan*, (teza çapnebûyî), Uppsala University 2000.

<sup>19</sup> Gîlan navê parêzgeheka Îranê ku li hêla bakurê Îranê ye. Hejmarek ji kurdên Xorasanê li wir dijîn.

کلیم الله توحیدی (کانیمال)، حرکت تاریخی کُرد به خراسان، کوشش، مشهد 1364، جلد اول ص. 81-92. 20



deverên bajarê Deregezê girtibe nava lêkolîna xebata meydanî. Li bajarê Deregezê jî kurdên koçer hene ku hemû demsalên salê li wir nayên dîtin û ji bo ku mirov bikaribe xwe bigihîne hemû gund û deverên bajêr, derfet û wexteke zêdetir pêwîst e. Di xebata meydanî li bajarê Deregezê de, dihat dîtin ku axêverên wir li gor bajarî yan gundîbûn û xwende yan nexwendebûna wan, kurmanciya wan jî diguherî, bi taybet dema axaftina kesên ku zêdetir li bajaran mijûlî karên fermî û idarî ne, têkelbûna farsî û kurmancî di devoka wan de zêde xuya dikir. Rêjeya bandorgirtina ji zimanê farsî li gor gundî yan bajarî, xwende yan nexwendebûnê dihat guhertin.

Rêbaza vê lêkolînê wesfî (descriptive) ye û di vê rêbazê de hewl tê dayîn kurmanciya herêma Deregezê wek ku niha heye bê tesbîtkirin û gramera kurmanciya wir bê qeydkirin. Ev lêkolîn dixwaze kurdiya wê herêmê weke ku niha heye li gor hêmanên zanista zimannasiyê şirove û analîz bike. Di dawiya vê xebatê de çîrokek ji xebatên meydanî weke pêvek hatiye pêşkêşkirin, gelek mînakên bikarhatî di vê lêkolînê de ji vê çîrokê hatine girtin lê ji ber zêdebûna hejmara çîrokan me nekarî cih bidin hemûyan û tenê ev çîrok weke bijarte hatiye pêşkêşkirin.

Di pirtûkên ku heta niha li ser rêzimana kurmancî de hatine nivîsîn ji bo termên rêzimanê û zimannasiyê lihevkirinek nîne, pirtûka Celadet Bedirxan a li ser gramera kurmancî, weke bingehê ji bo piraniya xebatên piştî wî re hatiye bikaranîn. Herwisa di vê lêkolînê de dema behsa kurmanciya bakurî tê kirin, ji ber ku hin caran pêwîst e kurmanciya Deregezê bi referansekê re bê berawirdkirin, ew referans di vê xebatê de gramera Mîr Celadet Ali Bedirxan e. Di nava xebatê de mînakên ku ji devera Deregezê tînin pêşkêşkirin dê bi şiklê *îtalîk* bînin destnîşankirin û herwisa mînakên ji kurdiya bakurî jî li bin wan dê werin nivîsîn. Herwisa li ber mînakên zimanî yên herêma Deregezê ku bi forma *îtalîk* in (KD) tê nivîsîn yanî bi vê wateyê ye ku ev mînak ji kurmanciya Deregezê hatiye dayîn. Bi heman rengî ji bo mînakên kurmanciya bakurî jî forma (KB) li hemberî mînakan tê nivîsîn.

Ji aliyekî din ve bo termînolojiya zimannasiyê Weqfa Mezopotamiyayê xebatek li ser termên rêzimanî pêk aniye û ferhengokek biçûk ji termên zimannasiyê

amade kiriye, ji bo vê tezê me ferhengoka termên rêzimanî ya weqfa Mezopotamiyayê weke bingeh ji bo termên zimannasiyê tercîh kiriye, helbet xebatên din yên li ser rêzimana kurmancî jî dê bên berçavgirtin.<sup>21</sup>

Herwisa di dawiya vê lêkolînê de ferhenkokek hatiye amadekirin ku lîstek ji bêjeyên kurmanciya Deregezê hatiye amadekirin, ev bêje di kurmanciya rojane de li herêma Deregezê tên bihîstin. Gelek ji wan bêjeyan di devoka kurmancî ya Deregezê de bi wateyêke din tên bikaranîn, yanî wateya wan bêjeyan di kurmanciya Bakurî û kurmanciya Deregezê de ne yeksan e. Loma ev ferhengok dê derfeta berawirdkirê jî bide kesên ku dixwazin ser vê mijarê lêkolînan bikin.

### 1.5. Kêşeyên lêkolînê

Ji ber nebûna lêkolînên bingehîn ên zimanî li ser kurmanciya herêma Xorasanê û bi taybetî jî devera Deregezê, ev xebat hewldanek e bo derxistina gramera zimanê herêma Deregezê û analîza wê ya li gor hêmanên zimannasiyê. Tevî hebûna hin zehmetî û astengiyên li ber vê lêkolînê dîsa jî em di wê bawerê de ne ku em gihîştine armancên xwe.

Di vê xebatê de astengiya herî mezin qanûna dewleta Îranê bû, ji ber ku xebatên zimanî û çandî divê bi destûra dewletê bên kirin, me nedikarî bi awayekî eşkere xwe bigihînin hemû kesî. Helbet me ji bo xebata xwe ji ti derê destûr nestandibû ji ber vê hindê me bi awayekî veşartî xebata xwe ya meydanî encam da. Dive bê gotin dema qeydkirina çîrok an hevpeyvînan, gelek kes ditirsiyan ku pişt re bo wan kêşe bên çêkirin.

---

<sup>21</sup> Koma kurmancî, **Termên zimannasiyê**, Weqfa Mezopotamiyayê, (berhema çapnekirî) herwisa bnr. xebatên ku li ser gramer kurmancî hatine kirin:

Çetin Taş, **Waneyên Rêziman û Rastnivîsa Kurmancî**, Weşanxaneya Dîwan, Stenbol, 2013.

Sami Tan, **Rêzimana Kurmancî**, çapa duyem, Enstîtûya Kurdî ya Stenbolê, Istanbul 2011. Mistefa Aydogan, **Rêbera Rastnivîsinê**, Istanbul, Rûpel, 2012.

Kadri Yıldırım, **Kürtçe Dilbilgisi** Mardin Artuklu Üniversitesi Türkiye’de Yaşayan Diller Enstitüsü Yayınları, 2012.

Mikail Bülbül, & Bahoz Baran, **Rêzimana Kurmancî** Weşanên Enstîtuya Kurdî ya Amedê, 2008.

Qenatê Kurdo, **Rêzimana Kurdî (Kurmancî û Soranî)**, çapa yekem, Weşanxaneya Nûbihar, Stenbol, 2013.

Bahoz Baran, **Rêzimana kurmancî**, Belkî, Istanbul, 2012.

Li rexê din ev xebata meydanî sala 2014ê hatiye encamdan, pêwîst bû dîsa careke din em xwe bigihînin herêma Xorasanê lê ji ber nebûna derfetan û herwisa rewşa siyasî ya Îranê ev yek ne mimkin bû.

Herwisa girêdayî vê mijarê, meseleyeke din ku lêkolînên zêdetir jê re pêwîst in dîroka kurdên herêma Xorasanê ye; pêwîst bû bo vê meseleyê em xwe bigihînin arşîvên dewletî lê ji ber nebûna derfetê, me tenê xwe sparte çavkaniyên tarîxê û serfernameyan.

- Tenê çend gervanên biyanî di pirtûkên xwe de hebûna kurdan li Xorasanê berî serdema sefewiyan qeyd kirine ku di beşa (2.3.1) de bê dîtin.
- Meseleya duyem sedema sereke ji bo koçkirina kurdan ber bi Xorasanê ye ku weke pirsgirêk dikare were nîşankirin.
- Meseleya sêyem nifûsa kurdan li herêma Xorasanê ye ku ti caran bi awayekê fermî ji aliyê ti saziyan ve nehatiye pêşkêşkirin. Mirov nizane gelo hejmara wan ya rastîn çiqas e?
- Di dawiya vê lêkolînê de ferhengokek hatiye pêşkêşkirin, li gor lêgerînên di nava ferhengên curbicur de bêjeyên di ferhengoka dawiya lêkolînê de nehatin dîtin. Di vê beşê de hewcetî bi ferhengeke kamil ya kurdî-kurdî hebû ku eger ferhengeke kamil bi dest biketa lêgerîn ji bo van bêjeyên destnîşankirî jî hêsantir dibû.

Beşa yekem, beşa danasîna vê xebatê bû û zemîneya xebatên li ser kurmanciya herêma Xorasanê hate diyarkirin. Herwisa mijar û armanca xebatê jî hatin ravekirin, li aliyekî din sinorên lêkolînê ji hêla erdnîgariyê ve hate destnîşankirin. Pêwîst e çarçoveya teorî û herwisa termên ku di vê xebatê de hewcetî pê hene, bîn ravekirin.

## BEŞA DUYEM

### ÇARÇOVEYA TEORİK Û TÊGEHÎ

Zimannasî û termên zimannasiyê çarçoveya teorîk û têgehî ya vê xebatê pêk tînin. Di vê beşê de termên zimannasiyê tên zelalkirin ku di beşa analîzakirina kurdiya herêma Deregeza Xorasanê de dê bînan bikaranîn. Çar beşên sereke di zimannasiya giştî de, dengnasî (phonology), bêjesazî (morphology), hevoksazî (syntax) û watenasî (semantic) ne ku ji bilî watenasiyê sê beşên din bi kurtî tînin ravekirin ku ji bo wesfîkirina gramera kurmancî ya herêma Deregeza Xorasanê dê bibin bingeh.

#### 2.1. Zimannasî (Linguistics)

Zimannasî zanistek e ku li ser zimanan dîskurî û dixebite. Bi şeweyeke zanistî vekolînê di siruştaya zimanê de dike ji bo geşkirina teoriya giştî ya kemilîn û werera zimanê mirov û şewaza xebitîna zimanan.<sup>22</sup> Zimannasî, herwiha, rola ziman di civakê de û binyada hundirî û pêkhatên wî, taybetmendî û qanûnên wî, karîgerî, pêşketina dîrokî û dabeşkirina malbatî ya zimanê jî vedikole û wesf dike. Di rastiyê de zimannasî hewl dide pirsên li jêrê bibersivîne:

- Ziman çî ye?
- Ziman çawan dixebite û ji kîjan hêmanan pêk tê?
- Mirov çawan bi hev re pêwendiyê çêdikin?
- Ferqa pergala zimanê mirov û zimanê canewerên din çî ye?<sup>23</sup>

Dîroka zimannasiya modern bi lêkolînên zimannasê fransî, Ferdinand de Saussure ve (1857 - 1913) hatiye girêdan. Pirtûka wî ya bi navê “dersên zimannasiya giştî” sala 1916ê ji hêla du şagirdên wî bi navên Charles Bally û Albert Sechehaye ve

---

<sup>22</sup> Bruce P. Hayes, **Introductory Linguistics, Department of Linguistics**, University of Californiad, Los Angeles, 2010. r. 3.

<sup>23</sup> Suzette Haden Elgin, **What Is Linguistics?**, Prentice-Hall, New Jersey, 1973.

hat belavkirin.<sup>24</sup> Piştî lêkolînên Saussure hêdî hêdî zanista zimannasiyê pêş ket û di sedeya 20em de geş bû û niha gelek şaxên zimannasî çêbûne û ew weke zanistekte navbeşî bi beşên din ên zanistên weke civaknasî û antropolojî û kompûterê ve jî hatiye girêdan. Zimannasî bi xwe li ser çend beşên biçûktir tê dabeşkirin. Li gor Hayes zimannasiya giştî ji çend beşan pêk tê. Dengnasî (phonology), bêjesazî (morphology), hevoksazî (syntax), watenasî (semantics) çar beşên eslî di zimannasiya giştî de ne.<sup>25</sup>

Ji ber ku armanca vê xebatê derxistina gramera kurmanciya herêma Deregezê ye, pêwîst e binbeşên girîng yê zimannasiyê bîn şirovekirin û termên bingehîn û sereke di van binbeşan de bîn diyarkirin. Danasîna van binbeşên navborî li jêrê hatiye pêşkêşkirin û dê heta dawiya vê beşê bi mînakên û daneyên zimanê kurdî mijarên pêwîst di vê xebatê de ji hêla teorîk ve bîn teyînkirin.

### 2.1.1. Dengnasî (Phonology)

Dengnasî (phonology) ku ji du peyvan, fonem (unîta dengî) û logy (zanist), pêk tê, rêzimana dengên pêk tîne.<sup>26</sup> Fonem hêmanek girîng di kîte û bêjeyê de ye, herwisa fonem wateya bêjeyan ji hev cuda dike, li gor cihgirtin di nava bêjeyê de ew jî diguhere û ji dengên berî xwe û piştî xwe bandorê werdigire.

**Fonem (Phoneme)** yekîneya binyadî ya dengî di dengnasiyê de ye. Ku her fonemek temsîliyeta dengê dike.<sup>27</sup> Hejmara foneman di zimanê kurdî de zêde ne lê

<sup>24</sup> Mark Aronoff and Janie Rees-Miller, **The Handbook of Linguistics**, Blackwell Publishers Oxford, 2003. r. 95. Herwiha ji bo agahiyên derbarê jiyana û xebatên Ferdinand de Saussure de bnr. [http://www.newworldencyclopedia.org/entry/Ferdinand\\_de\\_Saussure](http://www.newworldencyclopedia.org/entry/Ferdinand_de_Saussure) Dîroka Têketinê: 29.7.2017; Herwisa Bnr. **Brief survey of the history of linguistics. Saussure's Third Course of Lectures on General Linguistics** (1910-1911) publ. Pergamon Press, 1993. (ev notên li vir ne yê Saussure bi xwe nivîsandine, ji aliyê xwendekarên wî ve piştî mirina wî hatine berhevkirin û çapkirin). Bnr. <https://www.marxists.org/reference/subject/philosophy/works/fr/saussure.htm> Dîroka Têketinê: 29.7.2017.)

<sup>25</sup> Bruce P. Hayes, **Introductory Linguistics**, Department of Linguistics, University of California, Los Angeles 2010, r. 11. Herwiha di derbarê dîroka zimannasiyê de ji vê pirtûkê jî dikare sêdê berwergirtin: R. H. Robins, **a Short History of Linguistics**, Longman, London, 1967.

<sup>26</sup> Hb. r. 319.

Herwisa Bnr. Bruce P. Hayes, **Introductory phonology**, Blackwell, West Sussex, 2009.

<sup>27</sup> Suzette Haden-Elgin, **What Is Linguistics?** Prentice-Hall, New Jersey 1973. r.12.

di alfabêya kurmancî ya Bedirxanî de tenê 31 tîp hatine bicihkirin, ji bo hin dengên bibêhn û bêbêhn tenê tîpek hatiye bikaranîn, tevî ku ev du dengên ji hev cuda ne yan ew du fonem in û dikarin wateya bêjeyê biguherînin. Li mînakên jêrê tê dîtin:

**K**ar (xebat)

**K**ar (bizinê biçûk)

Di mînakên jorê de dengê *k* weke fonem tê dîtin û tevî ku nivîsîna du bêjeyan yek e lê tê dîtin ku wateya bêjeyan bi guherîna foneman hatiye guhertin.

**Alofon (Allophone)** weke varyanta fonemê tê naskirin. Weke mînak dengê *a* di bêjeyê *baran* de li gor devokên herêmî dikare bi awayên curbicur bê bihîstin, forma wê ya binyadî heman *a* ye lê ev guherteyên curbicur ku girêdayî devokan in weke alofonên naskirin.<sup>28</sup>

Weke mînak dengê *û* di nava devokên kurmancî de bi çend awayan tê bihîstin yanî çend alofonên dengê *û* hene:

- a. [û] wekî dûr [dûr] di piraniya devokên kurmancî de
- b. [y] wekî /ü/ ya tirkî, di devoka culemêrgî de, wekî dûr [dyr/dür]
- c. [uî/wî] di hinek devokên behdînî de, wekî dûr [dwîr]
- d. [î] di devoka duhokî de wekî dûr [dîr]

Termên li jorê, di beşa dengnasyê de zêde tîpên bikaranîn û ji bo têgihîştina hemû cureyên dengên û guherteyên wan pêwîst in. Dema mirov bala xwe bide ser dengnasyê û armanca dengnasyê, kêmasiyên alfabeyê zelaltir tîpên ber çavan. Mînak li vir alfabêya kurdî ya Bedirxanî hemû dengên kurdiya kurmancî di nava xwe de nahewîne. Bedirxanî hin fonemên nêzî hev weke tîpekê dîtine û tenê tîpeke alfabeyê bo wan terxan kiriye. Helbet ji bo mijarên zimannasyê û nivîsîna bi awayekî

---

<sup>28</sup> Victoria Fromkin, Robert Rodman, Nina Hyams, **An Introduction to Language, Ninth Edition**, Wadsworth, Cengage Learning, 2011, r. 232.

navnetewî alfabêyeke standard bi navê IPA<sup>29</sup> li dinyayê heye. Lê ji ber ku ev xebat bi zimanê kurdî ye û alfabêya Bedirxanî teqrîben di nava kurmancan de tê naskirin loma li vir ji bo transkrîpsyona dengên û mînakên ev alfabe hatiye bikaranîn.

Hemû dengên zimanî dikevin nava du kategoriyan: dengdêr (vowel) û nedengdêr (consonants).<sup>30</sup>

**Nedengdêr (Consonant)** ev deng in ku ji bo bilêvkirina û derbirîna wan asteng hene. Yanî bi hêsanî nahên bilêvkin. Ji bo bilêvkirina wan dengên pêwîstî bi dengdêran heye.

Weke mînak dengê *b* bi xwe nedengdêr e eger mirov bixwaze wê dengê bilêvbike jê ra dengdêrek lazim e, yanî divê dengdêrek li ber wê dengê bê danîn ku mirov bikaribe wê dengê bilêv bike.

**Dengdêr (Vowel)** ev deng in ku ji bo bilêvkirina wan ti asteng nînin. Dengdêr bi xwe li ser du grûban tên dabeşkirin: dengdêrên kurt, dengdêrên dirêj.

Mînak dengê *I* bêyî ku dengê alîkar jê re hewce bê bi hêsanî tê bilêvkin.

Ji ber guherînên fonetîk di zimanan de devok û formên ciyawaz yê zimanî çêdibin. Di beşa mînakên zimanê herêma Deregezê de mînakên zêdetir ji dengên guherîna dengên bê pêşkêşkirin.

### 2.1.2. Bêjesazî (Morphology)

Bêjesazî beşek ji zimannasiya giştî ye ku dêsmana (structure) bêjeyan û herwisa rêbazên rêzimanî yê teşegirtina bêjeyan analîz dike. Bêjesazî yanî vekolîna bêje û peyvan.<sup>31</sup>

Ji bo zelalbûna mijara bêjesaziyê hin term divê bê ravekin. Wisa ku

<sup>29</sup> International Phonetic Alphabet (IPA)

<sup>30</sup> Hb. r.195.

<sup>31</sup> Bruce P. Hayes, **Introductory Linguistics, Department of Linguistics**, University of California, Los Angeles 2010. r. 13.

Fromkin dibêje; stem (reh) navoka watedar ya bêjeyê ye. Hin tiştên ku li rehê tên zêdekirin û wateya wê diguherînin yan modîfiye dikin weke *affix* (gire) tên binavkirin. Affix dikarin li pêşiya bêjeyê bîn zêdekirin ku bi wan re dibêjin prefix (pêşgir); Affix dikarin li dawiya bêjeyê jî bîn zêdekirin ku bi wan re jî dibêjin suffix (paşgir); Herwisa affix dikarin li pêşî û dawiya bêjeyê bîn zêdekirin ku bi wan re dibêjin circumfix (baznegir).<sup>32</sup>

(1) **Gire (Affix):** Li vir tenê çend mînak ji bo zelalkirina mijarê tên nivîsîn.

- |                         |                 |
|-------------------------|-----------------|
| a. Pêşgir (prefix)      | <b>direve</b>   |
| b. Paşgir (suffix)      | <b>hatin</b>    |
| c. Baznegir (circumfix) | <b>bihatima</b> |

**Morfem (Morpheme):** Biçûktirîn yekîneya (unit) watedar di zimannasiyê de ye.<sup>33</sup>

Weke mînak di bêjeya *Nexweşiyê* de *ne-* morfem e; *xweşî* morpheme nîne ji ber ku em dikarin wê bêjeyê li ser du parçeyên biçûktir dabeş bikin. Herwisa di bêjeya *nexweşiyê* de *î* morpheme e, ji ber ku *î* dikare li *xweş* (rengdêr) bê zêdekirin û *xweşî* (navdêr) çêbike û hem jî li gor pênaseya morfemê ji hêla rêzimanî ve watedar e.

Hin taybetmendiyên bêjesaziya kurdî hene ku gelek bêje li gor rewşê û cihgirtina di nava hevokê de teşe digirin. Yanî haleta bêjeyan di ferhengê de normal e lê dema ku di hevokê de cih digirin hin gireyên nû li bêjeyan tên zêdekirin.

(2) Mînak:

- a. Hevalê min avjeniyê dike.

Di (2a)ê de em dibînin ku li gor hevokê û dema lêkerê û hin taybetmendiyên din, hin gire li *heval* û *avjenî* hatin zêdekirin.

<sup>32</sup> Victoria Fromkin, Robert Rodman, Nina Hyams, **An Introduction to Language, Ninth Edition**, Wadsworth, Cengage Learning, 2011, r. 43-50.

<sup>33</sup> Hb.hr.



Bêjesazî dikeve bin tesîra gelek tiştan, yekjimar yan pirjimarî, nasyar û nenasyarî, nîşankirina rewşê (tewang), nêr û mêtî û hwd, di teşegirtina bêjeyan de gelek girîng in. Helbet di beşa sêyem de (analîza zimanê kurmançiya Deregezê) gelek mînak û şiroveyên wan hene ku dikare bê dîtin. Bi giştî bêjezasî û syntax/hevoksazî bi hev re rêzimanê pêk tînin. Ji ber vê yekê ev du mijar gelekî girêdayî hevdu ne.

Nîşankirina rewşê/tewang yek ji wan mijarên girîng di bêjesaziya kurdiya kurmançî de ye ku li jêrê şirove û tesîra wê li ser mijara bêjesaziyê dikare bê dîtin.

**Nîşankirina rewşê (Case marking)**, bi gotineke din yanî çemandin an nîşankirina navdêran e; dema navdêr tên çemandin li gorî hin taybetiyên weke zayend, îzafe, nasyarî û nenasyarî û hwd. Hin gire li navdêran zêde dibin an jî eger cihnav ku bi eslê xwe navdêr bin jî bi awayekî tên çemandin. Di kurdiya kurmançî de jî ev taybetî heye û nîşankirina rewşê tê dîtin. Wisa ku Bedirxan dibêje; Nîşankirina rewşê (tewangbarî), yek ji taybetiyên kurmançî ye, di zimanê kurdiya kurmançî de hinek beşên hevokê li gorî erka xwe diguherin û hinek qertafan digirin; ji vê yekê re nîşankirina rewşê tê gotin.<sup>34</sup>

Wisa ku Teqevî dibêje; Dêsmancên nîşankirina rewşa navdêran di kurmançî de du beş in:<sup>35</sup>

**1. Nomînatîv-Akuzatîv (Nominative – Accusative):** Di vê haletê de ku hevok di dema niha de ne, lêker li gorî karayê ava dibin û wisa ku di mînakên di jêrê de tê dîtin, di vê haletê de berkar (direct object) tê çemandin:

**S:** Karaya lêkera têneper

**O:** Berkara / patienta lêkera têper.

**A:** Karaya lêkera têper

<sup>34</sup> Celadet Alî Bedirxan, **Elfabêya kurdî & Bingeha Gramera Kurmançî**, Nefel, Stockholm 2002. r. 57.

Herwisa Bnr. Barry J. Blake, **Case, Second edition**, Cambridge, United Kingdom, 2004. r.1.

<sup>35</sup> محمد تقوی، مقایسه نظام های حالت دهی گویش کرمانجی با فارسی معاصر، دانشگاه بیرجند، (پایاننامه چاپ نشده) 2012، ص. 44.

**Ez** tēm.

**S**

Ew **min** dibîne.

**O**

**Ez** wî dibînim.

**A**

**2. Absolutîf-Ergatîv (Absolute-Ergative):** Di vê haletê de hevok di dema borî de ne, lêkerên têper li gorî berkarê ava dibin û kara tê çemandin.

**Ergatîv (Ergative)** herwisa weke ergatîv-absolutîf<sup>36</sup>(nîv-ergatîv) jî tê binavkirin; bêjeya ergatîv ji bo diyardeyêke rêzimanî tê bikaranîn ku di wê nimûneyê (pattern) de kara ya lêkerên teneper û berkara (object/patient) lêkerên têper bi awayekî kod dibin û herwisa bi karaya lêkerên têper re jî ferq dikin.<sup>37</sup> Ev nimûne weke tamamker ji bo zimanên akûzatîv re ye. Elemanên weke kara û berkarê li ser çemandina lêkeran bandorê çêdikin. Di zimanekî weke ingilîzî de, lêker tenê li gorî karayê tê çemandin ku bi wan zimanan ra dibêjin akuzatîv.<sup>38</sup> Zimanekî weke kurdiya kurmancî, lêkerên têper di dema borî de li gorî berkarê tene çemandin.

Kurdiya kurmancî zimanekî ergatîv-absolutîv (nîv-ergatîv) di nîşankirina rewşê de ye û girêdayî têper yan teneperbûna lêkerê û dema lêkerê ye. Bi giştî di zimanên ergatîv de kara ya lêkerên teneper û berkara (object/patient) lêkerên têper bi awayekî kod dibin; vê yekê em dikarin di mînakê jêr de bibînin:

(3)

- a. **Ez** hatim. (Karaya lêkerekê teneper)
- b. Te **ez** dîtîm. (Berkara / patient) lêkerekê têper.
- c. **Min** ew dît. (Karaya lêkera têper)

<sup>36</sup> Geoffery Heig, **Alignment in Kurdish: A Diachronic Perspective**, Zu Kiel University 2004. r.25.

<sup>37</sup> Robert Dixon, **Ergativity**, Cambridge University Press, Cambridge 1994. r. 1.

<sup>38</sup> Roşan Lezgîn, **Ji bo Kurmancan bi Awayê Muqayeseyî Gramera Kirdikî (Zazakî)**, Roşna, Stenbol 2013. r. 124.

Li (3 a, b, c) ez û *min* diyar in; wisa ku di tarîfa ergatîvîtiyê de heye.

Di van mînanan de heta radeyekê bandora ergatîvîtiyê li ser nîşankirina rewşê û bêjesaziya kurmancî hate dîtin. Taybetiyeke din ku di kurmancî de heye û bêjesaziya kurmancî bandorê jê werdigire, zayenda navdêran e.

**Nîşankirina rewşê û zayendê (Case marking and gender):** Zayend yek ji mijarên girîng di zimmannasiyê de ye. Wisa ku Hayes dibêje; Di zimanekî weke almanî de navdêr dikarin nêr, mê yan notr (bêzayend) bin ku zayend dikare li ser bêjesaziya bandorê dayîne.<sup>39</sup> Ji alîyêkî din ve di kurmancî de zayend xwe di navdêran de nîşan dide; navdêr dikarin li gor zayenda xwe bî kategorîkirin; hin navdêr *mê* hin navdêr *nêr* in. Dema ku bêjeyek di nava farazekê navdêrî (noun phrase) yan hevokê de cih digire rewşa wê jî tê nîşankirin; bi gotineke din qertafên zayendê jî li gorî nêr û mêtiya navdêran lê tê zêdekirin ku ew jî dikeve bin mijara bêjesaziya.

Bêjesaziya kurmancî herwisa girêdayî nasyar û nenasyariya navdêran e jî, ji bo vê yekê û dîtina bandora nasyar û nenasyariyê ev mijar jî divê were vekolandin.

**Nasyar (Definite):** Navdêrên ku ji bo bihîzer û mixateb naskirî bin, nasyar in. Bêjer navê ku dixwaze di hevokê de bi kar bihîne kod (Nîşandar) dike û wisa tesewir dike ku ev nav ji bo bihîzer naskirî ye.<sup>40</sup>

Weke mînak di hevoka “*Azad hat*” de bihîzer yan xwînerê kurmancîzan, dizane *Azad* kî ye û wî nas dike.

Li rexê din di zimanê kurdiya kurmancî de rewşa sifrê (zero case), -(haleta ku tiştêk li navdêran nehatiye zêdekirin, yanî navdêr nehatine çemandin û mirov dikare

---

<sup>39</sup> Bruce P. Hayes, **Introductory Linguistics, Department of Linguistics**, University of California, Los Angeles 2010. r. 28.

<sup>40</sup> Givon T., **Syntax: a functional typological introduction Vol 1**, Philadelphia, Joun Benjamin Publishing company, Amsterdam 1984-1990. r.

bibêje haleta bêjeyan ya di ferhengê de)- bi xwe nasyar e.<sup>41</sup>

Mînak:

(4)

*Azad hat.*

Dema bihîzerekî/ê kurmancîaxêv mînaka (4)ê bibihîze, ji bo wî nasyariya *Azad* tişteki teqez e. Di (4)ê de tê dîtin ku navdêr yanî *Azad* nehatiye çemandin, rewşa wê navdêrê diyar nebûye û tişteki lê nehatiye zêdekirin û di rewşa sifrê de ye. Wisa ku Bûlbûl destnîşan kiriye, di kurmancî de heta ku navdêr veqetandekên nenasariyê nestînin, dê ew nasyar bimînin.<sup>42</sup>

**Nenasar (indefinite):** Navdêrên ku ji bo bihîzer û mixateb nenaskirî bin di zimannasiyê de weke nenasar tînen pênasekirin. Yanî dema axêver hevokeke weke “*hevalek hat*” bibêje bihîzer ji vê hevokê tînegihêje ku ew *heval* kî ye û kîjan e, yanî bi gotîneke din ev ji bo bihîzer nenasar e.

Di kurmancî de partîkelên (veqetandek) nenasariyê bi vî rengî ne: Di navdêrên yekjimar de li gorî zayendê partîkela *-ek* di dawîya navdêran de tînen û wan nenasar dikin û ji bo nenasarkirina navdêrên pirjimar û her du zayendan jî *in* tê bikaranîn.<sup>43</sup>

(5)

- a. Hespek hat. (-ek partîkela yekjimar û nenasariyê ya zayenda nêr)
- b. Mehînek hat. (-ek partîkela yekjimar û nenasariyê ya zayenda mê)
- c. Qelemî hene. (-in partîkela pirjimar û nenasariyê ya herdu zayendan)

---

<sup>41</sup> Mikail Bûlbûl, **Peyvrêzî di Frazên Navdêrî de (Devoka Mêrdînê)**, The Journal of Mesopotamian Studies, C:2/1, Zivistan 2017. r. 95.

<sup>42</sup> Hb.95.

<sup>43</sup> Celadet Alî Bedirxan, **Elfabêya kurdî & Bingeha Gramera Kurmancî**, Nefel, Stockholm 2002. r. 64. Herwisa Bnr. Baran Rizgar, **Learn Kurdish. A multi-level course in Kurmanji**, Lithosphere, London 1996. r. 7.

Herwisa mijareke din ku li gorî nîşankirina rewşa navdêran û herwisa zayenda xwe dikare li ser bêjesaziyê bibandor be, cihnav in. Gelek cureyên cihnavan hene; weke cihnavên pirsyarî, nîşandêr, kesane, nenasyar;<sup>44</sup> lê ji ber ku cihnavên kesîn dikevin bin tesîra nîşankirina rewşê û li gor dema lêkeran û têper yan teneperbûna lêkerê tîn guhertin, pêwîst hatiye dîtîn ku cihnavên kesîn bîn zelalkirin û bandora wan li ser bêjesaziyê bê dîtîn.

**Cihnavên kesîn (Pronoun):** Bêjeyên ku dikarin cihê navdêran bigirin yan li cihê nadêran rûnin. Di zimanê kurdiya kurmancî de du cure cihnavên kesane hene, cihnavên dîrekt (direct case pronoun) û cihnavên çemandî (oblique case pronoun).<sup>45</sup>

Cihnavên dîrekt (direct)	Cihnavên çemandî (Oblique)
Ez	Min
Tu	Te
Ew	Wî/Wê
Em	Me
Hûn	We
Ew/Ewna	Wan

*Cedwela 1: Cihnavên kesîn di kurmancî de*

Di zimanê kurdiya kurmancî de weke zimanê inglîzîyê, cihnavên kesîn teqez divê bîn bikaranîn; wisa ku Trakson jî destnîşan kiriye, hebûna cihnavên kesîn di hevokê de teqez pêwîst e.<sup>46</sup> Bi gotineke din kurdiya kurmancî weke zimanekî cihnavavêj (pro-drop) nine û hebûna cihnavan di hevokê de pêwîst e.

(6) Cihnavên kesîn di inglîzî û kurdî de

- a. They went

<sup>44</sup>Celadet Alî Bedirxan, *Elfabêya kurdî ...*r.72.

<sup>45</sup> Hb. r.72./herwisa Bnr. Baran Rizgar, **Learn Kurdish. A multi-level course in Kurmanji**, Lithosphere, London 1996. r. 14.

<sup>46</sup> Thackston, W. M., **Kurmanji Kurdish: A reference grammar with selected readings**, Unpublished, Harvard University Press, Massachusetts 2006. r. 18.

b. Ew çûn.

Eger di mînaka (6a) de *they* tunebe, ev hevok kamil û tamam nabe. Loma jî hebûna cihnavê pêwîst e. Bi heman awayê di kurdî de jî eger em hevoka (6b) bêyî cihnavê binivîsin; Nediyar e ka “kî çûn”, “ew çûn”, “em çûn” yan “hûn çûn”. Loma jî hebûna cihnavê lazim e.

Li vir tenê termên sereke tên şîrvokirin lê di beşa sêyem de ku li ser kurmanciya Deregezê bi hûrgilî radiweste, gelek bi berfirehî mînak tên dîtin û cureyên cihnavan weke cihnavên serbixwe (independent pronoun), diyarkera nîşandêr (demonstratives), cihnavên vegerok (reflexive pronoun), cihnavên pirsyariyê, cihnavên likandî tên ravekirin.

Di vir de hêmanên sereke yên ku li ser bêjesaziya kurmancî bibandor in hatine şirovekirin, û cureyên wan bi mînakên berfirehtir di beşa sêyem de tên dîtin. Heta niha bêjesazî heta radeyekê hate diyarkirin, niha li pêşiya me hevoksazî û awayê rêzkirina bêjeyan tê şirovekirin.

### 2.1.3. Hevoksazî (Syntax)

Hevoksazî beşek ji zimannasiyê ye ku li ser dêsman û struktura hevokê dixebite.<sup>47</sup> Rola hevoksaziyê lêkdana bêjeyan yan frazan û avakirina hevokan e.<sup>48</sup> Helbet rêza cihgirtina bêjeyan di nava hevokê de şert e yanî peyvîrêzî (word order) divê li gor dêsmana wî zimanî bê dariştin. Mînak di zimanê ingilîzî de peyvîrêzî bi vî rengî ye; Subject (kara) – Verb (lêker) – Object (berkar) (SVO) ye.<sup>49</sup> Yanî eger peyvîrêzî bi awayekî gramatîkî neyê dariştin, hevok bê wate dibe, yanî bi gotineke din ji forma wî zimanî derdikeve.

<sup>47</sup> Bruce P. Hayes, **Introductory Linguistics, Department of Linguistics**, University of California, Los Angeles 2010. r. 53.

<sup>48</sup> Suzette Haden Elgin, **What Is Linguistics?** PRENTICE-HALL, New Jersey 1973. r.12.

<sup>49</sup> Victoria Fromkin, Robert Rodman, Nina Hyams, **an Introduction to Language, Ninth Edition**, Wadsworth, Cengage Learning, 2011, r. 78.

(7)

- a. I go home.
- b. I home go.

Di (7a) de hevok li gor rêzimana ingilîzî ye û em dikarin (SVO) bibînin. Yanî ji bo kesên ku ingilîzî dizanin ev hevok watedar e. Lê em li (7b) binêrin, bêje heman bêje ne tenê rêza dariştina wan hatiye guhertin yan peyvrêziya wan li gor zimanê ingilîzî nîne. Ji ber vê yekê jî peyvrêzî yek ji mijarên girîng di zimanan de ye ku bihîzer yan xwîner bi dîtin an bihîstina bêjeyan li pey hev û tertîba wan wateya hevokê têdigihêje.

Di zimanê kudiya kurmancî de peyvrêzî bi giştî Subject (kara) – Object (berkar) – Verb (lêker), (SOV) ye.<sup>50</sup> Yanî SOV (Subject, Object, Verb)

- c. Ez pirtûkê didim wî.

Eger di (7c) de peyvrêziya hevokê bi awayekî din hatiba dariştin, êdî ev hevok ji çarçoveya hevoksazî û peyvrêziya kurmancî derdiket û teqrîben hevok bêwate dibû.

Li rexê din cihê kurdmancî di nava diyalektên kurdî de û herwisa cihê zimanê kurdî di nava zimanên îranî de pêwîst e bê diyarkirin.

## 2.2.Zimanê kurdî

Kurd li welatên Iran, Sûriye, Tirkîye, Iraq, Azerbaycan, Kazaxistan, Tirkmenistan, Ermenistan, Gurcistan, (Xorasan û Gîlan) û gelek ji welatên ewropayî

---

<sup>50</sup> Margareet Dorleijn, **The Decay of Ergativity in Kurmanji**, Tilburg University Press 1996. Herwisa Bnr. Geoffrey, Haig, **On the Interaction of Morphological and Syntactic Ergativity Lessons from Kurdish**, Research Centre for - Linguistic Typology, Australian National University, Australia, 1998.

dijîn lê piraniya kurdan li çar welatên Îran, Tirkîye, Iraq û Sûriyê dijîn.<sup>51</sup> Ji ber vê yekê jî zimanê kurdî li gelek ciha tê axaftin.

Kurdî zimanekî îranî ye ku di dabeşkirina zimanî de weke zimanekî bakur-rojavayî yê îranî tê hesibandin; Haig îsoglosa zimanên îranî weke cedwela 1ê jêrê şirove dike.<sup>52</sup>

Zimanên îranî di qonaxên dîrokî de	Zimanên tesbîtkirî	
<b>Îraniya Kevn</b>	Farsiya Kevn (6-4s.BZ)	Avestaya Kevn, Avestaya Nû (12s.-6s.BZ, ev dîrok zêde zelal nîne)
	<b>Îraniya Rojavayî</b>	<b>Îraniya Rojhilatî</b>
<b>Îraniya serdema navîn</b> (4/3s. BZ/9 s. PZ)	Farsiya miyane, Partî	Sogdi, Khotani
<b>Îraniya Modern</b>	Farsî Kurdî Belûçî hwd.	Peşto Pamir Osetî hwd.

Cedwela 2: Îsoglosa zimanên Îranî

Bandora hêmanên weke erdnîgarî, siyasî, civakî û çandî li ser zimanê kurdî li welatên ku kurd têda dijîn çêbûye, ji ber vê yekê kurdî bi awayên cihêreng li gelek cihan tê bihîstin. Lêkolînerên ku li ser zimanê kurdî dixebitin gelek kategorî ji bo diyalektên kurdî destnîşan dikin, weke mînak; Dorleijn zimanê kurdî li ser pênc diyalektan dabeş dike;

- Diyalekta bakurî (kurmançî)
- Diyalekta navendî (soranî)

<sup>51</sup> Geoffrey Haig, Ergin Öpengin, **Kurmanji Kurdish in Turkey: structure, varieties, & status**, Bulut, Christiane (ed.) Linguistic Minorities in Turkey and Turkic speaking minorities of the peripheries. Wiesbaden: Harrassowitz, Pre-publication draft, November 2015, r.1. ژوئیس بلو، دستور زبان. 13، 14 ص. 1393. قم علوی، عمو علوی، ترجمه علی پاکسرشت، **کردی کرمانجی**; Mohemed Emîn Zekî Beg, **Kurtîyek ji Mêjûwa Kurd û Kurdistan Ji Destpêkirina Mêjûwê Tanî vê Rojê**, Wergêr; Dr. M. S. Cuma, Berlin, 1994.


<sup>52</sup> Geoffery Heig, **Alignment in Kurdish: A Diachronic Perspective**, Zu Kiel Unisversity (2004), r. 8.



- Diyalekta başûrî
- Diyalekta goranî
- Diyalekta zazakî yan dimly

Herwisa dibêje ku; tevî hebûna gelek hevbeşiyên di nava diyalektên zimanê kurdî de, ev diyalekt ji hev ciyawaz in û gelek caran lêkolîner nizanin bi çi awayî navê “zimanê kurdî” li van hemû diyalektan bikin.<sup>53</sup>

Li aliyê din Muhammad herwisa di xebateke xwe de ku li ser zimanê kurdî û diyalekta kurmancî pêk aniye, zimanê kurdî li ser pênc diyalektên kurmancî, soranî, kurdiya başûrî, zazakî û goranî dabeş kiriye û herwisa diyalekta kurmancî jî li ser sê devokan kategorî kiriye; kurmanciya rojavayî, kurmanciya navendî, kurmanciya rojhilatî.<sup>54</sup> (Bnr. Wêne 3ê) Li rexê din Muhammad di nexşeyê de cihê diyalekta zazakî û goranî diyar nekiriye.



Wêne 2: Sinorên teqribî yên dabeşkirina devokên kurdî<sup>55</sup>

<sup>53</sup> Margareet Dorleijn, **The Decay of Ergativity ...**

<sup>54</sup> Husein Muhammad, **Parvekirina Devokên Kurmancî**, <https://zimannas.wordpress.com> 2015. <https://zimannas.wordpress.com/2015/07/06/parvekirina-devoken-kurmanci/> Dîroka têketinê: 10.7.2017.

<sup>55</sup> Sinorên teqribî yên komdevokên kurmancî: rojavayî (kesk). Amadekar Husein Muhammad; <https://zimannas.wordpress.com> 2015. Dîroka têketinê: 10.7.2017.

Wisa ku di nexşeya 3ê de tê dîtin “deverên kesk” bi devoka kurmanciya rojavayî diaxivin, “devera zer” bi devoka kurmanciya navendî û “devera sor” bi devoka kurmanciya rojhilatî diaxifin, “devera şîn” bi diyalekta soranî diaxifin û diyalekta axêverên “devera binefş” jî kurdiya başûrî ye ku li herêma Kirmanşan, Xaneqîn û Îlam û herwisa beşek ji parêzgeha Loristanê dijîn; kurdiya başûrî gelek caran weke lekî yan feylî jî tê binavkirin.<sup>56</sup>

Piraniya kurdên dinyayê bi kurdiya kurmancî diaxivin.<sup>57</sup> Kurdên Xorasanê jî kurmancîaxêv in û wisa ku Husên Mihemed dibêje; kurdiya Xorasanê û kurdiya kurmancî ya rojavayî<sup>58</sup> (berfiratî), bajarên weke Riha/Urfa, Meletî, Semsûr û Efrînê gelekî dişibin hev û gelek taybetiyên zimanî di wan herêmên navborî de wek hev in.

Li gor xebata Muhammad ku li jorê hate behskirin, kurmanciya Xorasanê jî dikeve nava devera binefş û dikeve nava devoka kurmanciya rojavayî; ji ber vê yekê ev pirs balê dikişîne ka gelo kurd li Xorasanê çi dikin û bi çi awayî û kînga derbasî Xorasanê bûne?

### 2.3. Dîrok û paşxaneya demografîk ya kurdên Xorasanê

Dema behsa kurdên Xorasanê tê kirin dibe ku ev pirs bê pirsîn ka gelo kurd li Xorasanê çi dikin an hebûna kurdan li Xorasanê vedigere kîjan serdemê? Ji ber ku piraniya kurdan li deverên kurdnişîn di navbera çar welatên Îran, Tîrkiye, Iraq, Sûriyê û Qefqaziyayê<sup>59</sup> de dijîn; loma dema behsa kurdan li derveyî van sinoran tê kirin, divê mirov bala xwe bide ser tarîxê û herwisa mirov divê bala xwe bide ser sefernameyan. Di vê beşa li ber me de hewl hatiye dayîn ku şopa kurdan li Xorasanê

<sup>56</sup> Husein Muhammad, Rengdêr di zimanê kurdî de, **Kanîzar, kovara zimanê kurdî**, hejmar 12, 2017. r. 13.

<sup>57</sup> Geoffrey Haig, Ergin Öpengin, **Kurmanji Kurdish in Turkey: structure, varieties, and status**, Bulut, Christiane (ed.) Linguistic Minorities in Turkey and Turkic speaking minorities of the peripheries. Wiesbaden: Harrassowitz, Pre-publication draft, November 2015. r.1.

Wolfgang, Taucher, Mathias Vogl, Peter Webinger, **the Kurds, History - Religion - Language – Politics**, Austria, Austrian Federal Ministry of the Interior, 2015. r. 31.

<sup>58</sup> Husein Muhammad, **Parvekirina devokên kurmancî**, <https://zimannas.wordpress.com> 2015. Dîroka têketinê: 10.7.2017.

<sup>59</sup> Ji bo agahiyên berfirehtir derbarê kurdên Qefqaziyayê de Bnr. Nofal Shirinov, **Folklorê Kurdên Azerbaycanê**, (Têza Lîsansa Bilind a çapnebûyî), Mêrdîn, 2017.

û hebûna wan di du serdeman de li wir bê tesbîtkirin. Di lêkolînên dîrokî yên li ser kurdên Xorasanê de tê dîtin ku kurd bi çî awayî derbasî Xorasanê bûne. Li gorî lêkolînên ji bo vê xebatê hebûna kurdan li Xorasanê di serdema sefewiyan û berî sefewiyan de hatiye tesbîtkirin; li jêrê ev du serdem tên dîtin.

### 2.3.1. Hebûna kurdan li Xorasanê berî serdema Sefewiyan

Li vir nivîsarên dîrokî û erdnîgarî û sefername hatine vekolîn û li gor agahiyên nivîskî di hin çavkaniyên tarîxî û sefernameyan de hebûna kurdan li Xorasanê yekem car ji aliyê Ibn-i Hewqel di pirtûka *Sûretulerz* de hatiye destnîşan kirin. Ibn-i Hewqel dibêje ku;

“...bajarên din yên Qehistanê, ku me bi nav kirin sar in û hemû bajar û gundên vê eyaletê ji hev dûr û mesafeya navbera wan çol e... di çola navbera bajaran de kurd û xwedîmal (xwediyê deve û pez) rûdinin...”<sup>60</sup>

Ibn-i Hewqel herwisa destnîşan dike ku ji bajarê Nêyşabûrê heta serhedê Xorasanê heft dihistanên<sup>61</sup> kurdan hene:

“ji Nêyşabûrê ta dawîya serheda Xorasanê heft menzil gundên kurdan û li nêzîkî Esedabadê heft menzil û li Damxanê pênc menzil û ji Nêyşabûr heta Serexsê jî şeş menzil hene ku kurd li wir dijîn...”<sup>62</sup>

Kolaykho nivîskar û gervanê Spanî ku bi destûra Henryê Sêyem Padişehê Spanî diçe cem Teymûrê Gûrkanî di sefernameya xwe ya bi nave *Sefernameya Kolaykho* de qala rêwîtiya xwe ya ji Spaniya heta Semerqendê<sup>63</sup> dike, herwisa qala kurdên herêma Xorasanê jî dike û wan weke eşîreta Elwarî bi nav dike û dibêje ku;

“...teqrîben fersengek mabû Nêyşabûrê, deverê hebû ku gelek çem lê hebûn û daristan bû li wir ordûyeke mezin ku teqrîben 400 kon bûn, ev kon ji çadirên reş hatibûn çêkirin, di van konan de eşîrek bi navê “Elwarî” ku kurd bûn dijiyan û gund û cihê wan tune bû, ji bilî van konan li ti cihî ji xwe ra mal û meskenan çênakin, zivistan û havînan li derve dijîn û karê wan jî malxwedîkirin û şivantî ye. Keriyên wan birîtî ne ji beran, mîh û gayan. 20 hezar deveyên vê eşîrê hene, ev di dirêjahî û pahnahiya vê

<sup>60</sup> ابن حوقل، صورة الارض، ترجمة جعفر شعار، بنیاد فرهنگ ایران، تهران (1345)، ص. 180.

<sup>61</sup> Her dihistanek ji çendîn gundên nêzî hev pêk tê.

<sup>62</sup> hb. r. 186

<sup>63</sup> Navê bajarekê ye li welatê Uzbekistanê.

herê mê de koç dikin ew salane 3 hezar deve û 15 hezar pez weke bac didine Têmûr. Vê bacê ji dêlva çêrandina keriyên xwe bi rezamendiya xwe didin...”<sup>64</sup>

Çavkaniyeke din ku di vê warê de hin agahiyan dide me pirtûka *Mesalik û Memalik* ya Ebulishaq Ibrahîmê Istexrî ye ku sedeya 5/6 hicrî (sed. 11/12 Mîladî) hatiye nivîsîn. Ew dibêje ku;

“...çiya û Tebesêyn ku me qala wan kir hemû zozan in û helbet di nava wan bajarên de çol jî zêde hene, kurd û xelec li wir dijîn...”<sup>65</sup>

Wî herwisa qala hebûna kurdan li nêzikê bajarê Nêyşabûrê jî kiriye û wisa diyar e ku jêdera wî pirtûka *Sûretulerz* ya Ibni-Hewqel e.

Li gor van çavkaniyan xuya ye ku hebûna kurdan li Xorasanê vedigere serdemeke dûrtir. Her çiqasî di serdema sefewiyan de jî kurd ji Kurdistanê ber bi Xorasanê ve hatibin koçberkirin jî, diyar e ku hebûna kurdan li serhedê Xorasanê digihijê serdemên kevintir.

### 2.3.2. Kurdên Xorasanê; serdema Sefewiyan û pişt re

Tevî hebûna çavkaniyên li jor dîsa jî em agahiyên deqîq derbareyê hebûna kurdan li Xorasanê berî Sefewiyan nikarin bi hûrgilî bi dest bixin hema hin çavkaniyên girîng bala xwe didine koçkirina kurdan di serdema Sefewiyan ji deverên kurdnişîn yê rojavayê Îranê ber bi Xorasanê ve.

Emîr Şerefxanê Bedlîsî di *şerefnameya* xwe de dibêje ku;

“...eşîreke din ji kurdan li Xorasanê heye ku weke Kîl tîn nasîn û di serdema Şah Tehmasb de cihê wan weke Şemsedîn Beg ku navê şexsekê bû, dihate nasîn.”<sup>66</sup>

Û di cihêkî din de dibêje ku;

“...di tarîxa sene sitîn û tismae [sed.12 mîladî] de Şah Tehmasb, Xelîl Beg ku

64. Klawixoy Ruy Gnzalaz *Sefername Klawixoy*, *terjeme Masoud Rjbnia*, Bngah *terjeme* û *nshr* *knab*, *tehran* 1344, v.188.

65. *abwshq* *abrahim* *avshxy*, *msalk* *o* *mmalk* (*terjeme* *farw* *msalk* *o* *mmalk* *az* *qrn* 6/5 *hgy*), *be* *kwsh* *abrg* *afshar*, *o* *bngh* *terjeme* *o* *nshr* *knab*, *tehran* 1347, v.216.

*Syd* *aly* *myrnia*, *abha* *o* *payfa* *hay* *ashayry* *hrasan*, *nsl* *dansh*, *tehran*, 1369. *Herwisa* *Bnr*.

66. *amrshrf* *han* *bdlysy*, *shrfname*, *hawshy* *mmhd* *aly* *ony*, *frgh* *allh* *zky* *krdy*, *msr*, v.425.

mîrzadeyek bû, perwerde kir û navê Xelîl Xan lê kir û ew kir serokê kurdên Iranê û 24 eşîrên kurdan ji bilî eşîra Reş Mensûr û kurdên ku di nava wan de bûn, kirin bin desthilata wî û ew ber bi Zencan û Ebher û Zerînkemerê va hatin ku di navbera Azerbaycan û Eraqê de cih girtin û ew hatin bi alîkariya sê hezar siwarên kurd li Tebrîz û Qezwînê mijûlî parastina xelkê xwe bûn, piştî du-sê salan gelek kurd li derdora wan berhev bûn û Xelîlخان nekarî wan kontrol bike... loma Şah Tehmasb hin ji wan eşîran bi serokatiya Xelîlخان, şandine serhedên Xorasanê; eşîrên din yên kurd jî ji hev pijiqandin...”.<sup>67</sup>

Dr. Papolî Yezdî jî di pirtûka xwe ya bi navê *Kûçnişînî der Şumalê Xorasan* de derbareyê koçkirina kurdan ber bi Xorasanê ve wisa dibêje:

“...serdema Şah Abas çendîn hezar malbatên kurd ber bi Xorasanê va hatin koçandin. Ev mijar ewqas girîng bû ku gelek kes tesewir dikin berî wê kurd li Xorasanê tune bûne...”.<sup>68</sup>

Iskender Begê Tirkeman di pirtûka *Alem Arayê Abasî* de ku serdema Şah Abas hatiye nivîsîn, ti îşaret bi koça kurdan ber bi Xorasanê ve nekiriye lê gava ku bûyerên sala sî û sisêyan (1618 mîladî) ji hukûmeta Şah Abas qeyd kirine, hebûna êla Çemişgezek li Xorasanê destnîşan kiriye;

“...Yûsif Sultan mîrê êla Çemişgezek yê Kurd, hakimê Xebûşana [Qoçan] Xorasanê ye...”.<sup>69</sup>

Martin Van Bruinessen di pirtûka xwe ya bi navê *Agha, Shaikh and State The Social and Political Structures of Kurdistan*, de behsa kurdên Xorasanê dike û dibêje; kurdên Xorasanê bi eslê xwe ji deverên curbicur ên Kurdistanê ne. Sedeya 16 (sala 1600ê) li herêma Xorasanê bi rêya Şah Abasê Sefewî konfederalîzma Çemişgezekê hate damezirandin.<sup>70</sup> Di heman çavkaniyê de Bruinessen dibêje sedema bicihkirina kurdan li herêma Xorasanê, parastina sinorê Îranê li hemberî hêrişên Uzbekan bûye. Wisa ku Bruinessen behs kiriye, ev konfederalîzm piştî demekê dibe du îlxaniyên ji hev cuda û sîstema îlxanîyê jî heta sedeya 20em dewam dike.

Gervanekî ingilîz bi navê James Frazer jî di sefernameya xwe de qala kurdên

<sup>67</sup> hb. r. 425-426

<sup>68</sup> محمدحسین پاپلی یزدی، کوچ‌نشینی در شمال خراسان، ترجمه اصغر کریمی، آستان قدس رضوی، مشهد 1371. ص 78.

<sup>69</sup> اسکندربیک منشی، تاریخ عالم آرای عباسی، دو مجلد، گلچین، تهران 1350. ص 1088.

<sup>70</sup> Martin Van Bruinessen, *Agha, Shaikh and State the Social and Political Structures of Kurdistan*, Zed Books Ltd, London and New Jersey, 1992. r.134.

Xorasanê dike, ew sala 1820ê diçe wê derê û di pirtûka xwe ya bi navê *Journey into Khorasan* de deverên kurdnişîn ku li bakûrê Xorasanê ne weke “Kurdistan” bi nav dike.<sup>71</sup> Hanri Rene Dalmani, ku serdema Qacaran hatiye Îranê û sefernameya xwe *Ez Xorasan ta Bextiyarî* nivîsiye, hebûna kurdan li Xorasanê tiştêkî nû dibîne û dibêje dawiya sedeya şanzdehan, Şah Abas 40 hezar malbatên kurd ji sinorên rojavayê Iranê ber bi Xorasanê ve koçandine.<sup>72</sup>

Jeneral Prcy Sayks di xebata xwe ya bi navê *Sefernameya Jeneral Prcy Sayks ya 10 hezar Mayl Der Iran*, sedema koçandina kurdan ber bi Xorasanê wisa dihesibîne:

“...Şah Abasê Sefewî di serdema xwe da, gelek kurd li bajarê Bijford, Qoçan û Deregezê bi cih kirin û wisa ziyar û zerereke mezin gihande tirkmanên mirovdiz...”<sup>73</sup>

Lêkolînavanekî din ku behsa kurdên Xorasanê dike Kelfûmulahê Tevehudî ye. Tevehudî 7 cild pirtûk bi navê *Hereketa dîrokî ya Kurd ber bi Xorasanê* nivîsîne û dibêje ku;

“...Kurdên Zeferanlû<sup>74</sup> alîkariya Şah Ismaîl dikirin û koça icbarî ya eşîrên din ên kurd ber bi Xorasanê di serdema Şah Abas de jî dewam dike...”<sup>75</sup>

Li gor çavkaniyên heyî ku huzûr û hebûna kurdan li Xorasanê destnîşan kirine, encameke wisa derdikeve pêş ku berî koça kurdan di serdema Sefewiyan de jî kurd li Xorasanê hebûne û piştî ku Sefewiyan desthilata Îranê girte destê xwe ji bo parastina sinorê Xorasanê li hemberî hêrişa tirkman û uzbekan û herwisa parçekirina hêza kurdan li aliyê, gelek ji eşîrên kurdan koçberî vê deverê kirine ku bi derbasbûna salan re li wir cihê xwe girtine û jiyana xwe berdewam kirine.

Çavkaniyên ku hebûna kurdan li Xorasanê qeyd kirine, bi zelalî qala sedemên

<sup>71</sup> James B. Fraser, *Journey into Khorassan*, London 1821, r. 548.

<sup>72</sup> هانری رنه دالمانی، سفرنامه از خراسان تا بختیاری، ترجمه علی محمد فره‌وشی، مؤسسه مطبوعاتی امیرکبیر، تهران 1335. ص 585-586.


<sup>73</sup> سرپرسی سایکس، سفرنامه ژنرال سرپرسی سایکس یا ده هزار میل در ایران، ترجمه حسین سعادت نوری، کتابخانه ابن سینا، تهران 1336. ص 18.

<sup>74</sup> Eşîreka mezin ji kurdên Xorasanê

<sup>75</sup> کلیم الله (کانیمال) توحیدی، حرکت تاریخی کُرد به خراسان، هفت جلد، کوشش، مشهد 1364. ج 5. ص 25-30.

serekî û niyeta koçandina kurdan ber bi Xorasanê, destnîşan nekirine. Ev mesele bi xwe dikare bibe mijara lêkolînekê. Çawan dibe ku ewqas mirov bi carê re cih û warê xwe bi cih bihêlin û her tiştê xwe biterkînin; çend hezar kîlometreyan ji welatê xwe dûr bikevin û bibin niştecihê sinorên Xorasanê?

Li rexê din di dîrokê de tê dîtin ku kurdan bi çî awayî sinorê Îranê parastine û dîwarekî mirovî li hemberî hêrişên tirkman û uzbekan ava kirine. Wisa ku di wêneya 4ê de xuya dibe herêma Xorasanê weke derwazeyekê ji bo derbasbûna hêzên biyanî bi ser Îranê ve bûye loma jî şahên sefawî pêwîst dibînin dîwarekê li hemberê wan xeteran ava bikin. Kurdên Xorasanê li bajar û gundên wê herêmê li cihên curbicur hatine bicihkirin ku Deregez yek ji wan bajaran e.



Wêne 3: Xorasan, sinorê Îran û Tirkmenistanê<sup>76</sup>

### 2.3.3. Herêma Deregezê û kurdên Deregezê

Deregez bajarek e li bakurê Xorasanê Razavi, ji aliyê bakur ve bi Turkmanistanê, ji aliyê başûr ve bi bajarê Çinaran, ji aliyê rojava ve bi Quçanê û ji aliyê rojhilat ve bi bajarê Meşhed û Kelatê re cîran e. Sinorê hevpar di navbera Deregez û Turkmanistanê de 155.25 km ye; (Bnr. Wêneya 2ê) Nifûsa bajarê

<sup>76</sup> Celîl Celîl & Gulê, Şadkam, *Sêxiştiyên Kurmancî Xorasan*, Enstîtûya kurdzaniyê, Wien 2012. r. 8.

Deregezê 80311 kes e ku jê 43745 kes li bajêr û 36566 kes jî li gundan niştecih in.<sup>77</sup> Di bajarê Deregezê de kurd, tirk, tirkman û fars bi hev re dijîn. Piraniya xelkê herêma Deregezê bi karê cotkarî û xwedîkirina pez û dewaran jiyara xwe dikin.

Kurdên herêma Deregezê jî weke piraniya xelkê wê herêmê bi karê cotkarî û pezdariyê re mijûl in. Li gor xebata meydanî li wir, piraniya gundên ser sinorê Îran û tirkmanistanê cih û warê kurdan in û devoka kurmançî ya wê herêmê jî kurmançiya rojavayî ye.



Wêne 4: Rewşa Erdnîgariya bajarê Deregezê<sup>78</sup>

Di vê beşê de hêmanên girîng yên zimannasiya giştî hatine ravekirin. Dengnasî, bêjesazî û herwisa hevoksazî hatin şirovekirin û termên girîng di her beşekê de li gor pêwîstiyên di vê xebatê de hatine zelalkirin, termên weke ergatîv û akuzatîv di beşa bêjesaziyê de hatin pêşkêşkirin. Zimanê kurdî û herwisa cihê kurmançiya Xorasanê di nava diyalektên kurdî de hate destnîşankirin, di dawiyê de jî hebûna kurdan li Xorasanê û dîroka wan di nava çavkaniyên tarîxî û sefernameyan de

<sup>77</sup> [http://daregaz.khorasan.ir/modules/Show\\_Content.aspx?PrintId=1&ContentId=6003](http://daregaz.khorasan.ir/modules/Show_Content.aspx?PrintId=1&ContentId=6003) , Dîroka têtetinê: 27.7.2017.

<sup>78</sup> Ev xerîte ji malpera fermî ya Ostandariya Xorasanê hatiye wergirtin. Dîroka têtetinê: 26.6.2017. <http://ostandari.khorasan.ir/modules/ShowFrameWork.aspx?PrintId=1&RelFacilityId=156&ContentId=143778&STemplateId=1340>



hate dîtin.

Di beşa dawiya vê xebatê de ku armanca sereke ya vê vekolînê ye analîza kurmanciya beşeke biçûk ji Xorasanê bi navê Deregezê, tê pêşkêşkirin û herwisa hewl tê dayîn ku gramera herêma Deregezê bê derxistin. Ji ber ku angaştê vê vekolînê ye ku guherînên zimanî di kurmanciya herêma navborî de bê destnîşankirin.



## BEŞA SÊYEM

### ANALÎZA KURMANCIYA DEREGEZA XORASANÊ LI GORÎ HÊMANÊN ZIMANNASIYÊ

Zimanê kurdî, wek ku cihên kurd lê dijîn, berfireh e. Ev berfirehbûn ji aliyekî ve dibe sedema diyalekt û devokên cuda jî. Soranî, kurmancî, zazakî û goranî, lekî, feylî ev diyalektên ku li herêmên cuda tên bihîstin. Xorasan, wek cihekî ku kurd lê dijîn, xwedî devokekê ye ku hêjayî xebatên xweser e. Wek Husein Muhammad dibêje devoka kurdên Xorasanê, kurmanciya rojavayî ye.<sup>79</sup> Lê, wek ku di beşên berê de jî hat destnîşankirin, Xorasan herêmeke berfireh e û ji ber ku di bin bandora farsî de maye, li gelek navçe û bajarên wê devokên ji hev cuda tên bihîstin. Ji ber ku imkan tunebû ku ev lêkolîn xwe bigihîne hemû deverên Xorasanê loma jî beşeke biçûk ji Xorasanê hatiye bijartin ku ev der jî bajarê Deregezê ye.

Li vir analiz û wesfkirina daneyên berhevkirî ji kurmanciya bajarê Deregeza Xorasanê li gorî hêmanên zimannasiyê ku di beşa duyem de hatine pênasekirin, tê pêşkêşkirin û gramera zimanê axêverên devera navborî tê kişfikirin, herwisa guherînen gramêrî jî tên destnîşankirin. Di serî de mijarê ku dikeve pêşiya me, dengnasiya herêmê ye.

#### 3.1. Dengnasiya kurmanciya Deregezê (Phonology)

Alfabêya kurmancî ya latînî ji 31 tîpan pêk hatiye ku 8 ji wan tîpan dengdêr (vowel) û 23 jî nedengdêr (consonants) in.<sup>80</sup> Ev alfabê bi rêya *Hawarê*<sup>81</sup> hatiye berbelavkirin. Tevî ku hemû dengên kurdiya kurmancî jî nahewîne lê dîsa jî bi piranî li ser wê lihevkirinek çêbûye.<sup>82</sup> Li devera Xorasanê jî ligel ku alfabêya fermî ya Îranê

<sup>79</sup> Husein Muhammad, *Parvekirina devokên kurmancî...*

<sup>80</sup> Celadet Alî Bedirxan, *Elfabêya kurdî & Bingeha Gramera Kurmancî*, Nefel, Stockholm 2002. r. 11.

<sup>81</sup> Kovara hawarê sala 1932ê heta sala 1957ê hatiye weşandin.

<sup>82</sup> Behruz Shujai, *The Kurdish of Gilan*, (teza çapnebûyî), Uppsala University 2000. r.12.

farsiya bi tîpên erebî ye, bi awayekê nefermî alfabêya latînî ya kurmançî jî tê bikaranîn. Li herêma Xorasanê heta niha ji bo nivîsîna kurmançî, sê cure alfabê hatine bikaranîn; alfabêya farsî, alfabêya kurdiya soranî, alfabêya kurdiya latînî ya Celadet Bedirxan. Hin pirtûk jî bi herdu alfabêyan (erebî- soranî û latînî-kurmançî) jî hatine çapkirin.<sup>83</sup>

Di vê beşê de guherînên dergan li devera Deregezê dê bên destnîşankirin û bi awayekî giştî ev guherîn bi mînakên dê bê zelalkirin. Wekî li jorê jî amaje pê hate kirin alfabêya latînî ya bikarhatî di *Hawarê* de bi vî rengî ye;

Aa Bb Cc Dd Ee Êê Ff Gg Hh Ii Îî Jj Kk Ll Mm Nn Oo Pp Qq Rr Ss Şş Tt Uu  
Ûû Vv Ww Xx Yy Zz

Lê li vir mijarek derdikeve meydanê ku ev jî pevguherîna nedengdêran e.

### 3.1.1. Pevguherîna nedengdêran

Li gor alfabêya ku Mîr Celadet Bedirxan di kovara *Hawarê* de ji bo kurdî bi kar anîye, hin deng hene ku di alfabêyê de cih negirtine. Rêjeya bikaranîna wan dergan kêma e lê dîsa jî di nav axavtinê de tên bihîstin. Ev deng di zimannasiyê de weke dengên nebibêhn (unaspirated) tên pênasekirin.<sup>84</sup> Çar dengên **K, T, P, Ç** di alfabêya Bedirxanî de ji bo dengên nebibêhn û bibêhn (aspirated<sup>85</sup>) bi awayekê wekhev hatine bikaranîn tevî ku ev deng fonem in û dikarin wateya bêjeyan biguherînin.<sup>86</sup> Ev çar dengên ku li jorê hatin diyarkirin di kurmançiya Deregezê de jî

<sup>83</sup> Bnr. Selim Temo, **Gurbette Bin Yıl: Horasan Kurtleri**, (pirtûka çapnebûyî). Wek mînak çend nimûne ji van pirtûkan ev in: Hesên Roşan, **Çîksay**, Meşhed, Neşr-i Şamlû, 2011; Yehya Elewîferd, **Şelpe û Sêv**, Qum: Emû Elewî, 2012; Feramerz Rostemî, **Yêksed Sêxiştî-i Kurmançî**, Suxenguster, Meşhed, 1384; Umîd Demirhanî, **Taybetiyên kurmançiya Xorasanê** kovara *Zend* h. 20, 2013, r. 68-74.

<sup>84</sup> Bruce Hayes, **Introductory phonology**, Blackwell, West Sussex, 2009.r.125.

<sup>85</sup> Doç. Dr. Rafîk Sulaiman ku yek ji endamên jûriya vê xebatê bû, ji bo bêjeyên *aspirated* û *unaspirated* du termên kurdî weke *babir* û *bapek* pêşniyar dike.

<sup>86</sup> Geoffery Heig, **Alignment in Kurdish: A Diachronic Perspective**, Zu Kiel University 2004. r.12. Herwiha, Ergin Opengin jî di meqaleyeka xwe de behsa van dergan dike û dibêje ku, ji ber kêmbûna barê zimanî (functional code) yê hin foneman, gelekî asayî ye ku ew fonem di alfabêyê de nehên nîşandan. Bnr. Ergin Opengin, **Pirsên Rênivîsa Kurmançî: pêdaçûnek rexneyî li ser rêbera rastnivîsînê ya Mistefa Aydoğan**, Derwaze, Vol 1. Stenbol, 2017. r.187.

hene û li gor guherîna wan foneman (bibêhn û bêbêhn) wateya bêjeyan jî diguhere.

(8)

- a. *kar*: îş, *kar*: karik, bizinê biçûk
- b. *ta*: nexweşî, *ta*: bendik
- c. *par*: beş, *par*: sala borî
- d. *çeng*: bask, *çeng*: pence

Di alfabêye navnetewî ya fonetîk (IPA) de ku di zimannasiyê de tê bikaranîn ji bo dengên bibêhn (aspirated) [ʰ] dengê *h* ya biçûk li ser tîpa bibêhn datînin. Bi vî rengî yanî ji bo *kar* dibêjin: [kʰar], ji bo *par* dibêjin: [pʰar], ji bo *çeng* dibêjin: [çʰeng], ji bo *talan* dibêjin: [tʰalan]. Thackston ji bo diyarkirina dengên bibêhn û bêbêhn alfabêya IPA bi vî rengî bi kar aniyê.<sup>87</sup>

Ji bo dengên bibêhn [ʰ] li ser tîpan zêde kiriye

Ji bo dengên bêbêhn [ˈ] li ser tîpan zêde kiriye.

Di mînakên (8 a,b,c,d) de tê dîtin ku *dengên bibêhn û bêbêhn* ya bibêhn du fonemên ji hev cuda ne yanî wateguhêr in û bi guherîna wan, wateya bêjeyan jî hatiye guhertin. Ev yek di devoka Deregezê de wiha tê dîtin.

Guherîna dangan bi xwe beşek ji zimannasiya dîrokî (historical linguistics) ye. Dema mirov bixwaze behsa guherînên dangan bike pêwîst e bi awayekî diyakronîk

---

<sup>87</sup> Thackston, W. M., **Kurmanji Kurdish: A reference grammar with selected readings**, Unpublished, Harvard University Press, Massachusetts 2006. r.4.

Ji aliyê din ve Malmîsanij jî, di pirtûka xwe ya bi navê *Kürtçede ses değışimi* de behsa guherîna dangan di diyalektên kurdî de dike û herwisa guherînên di nava diyalektekê de û guherteyên wan jî destnîşan dike. Di rûpela 30 ya heman pirtûkê de çend nimûne ji guherîna dengên *d* û *bd* navbera kurmançî û zazakî de dike. Di rûpela 52ê ya heman berhemê de guherîneka din di navbera kurmançî û zazakî de destnîşan dike ku li wir dengê *v* û *b* pev guherîne.

Kurmançî: **Derî**. Zazakî: **Ber**.

Kurmançî: **Bêje**. Zazakî: **Vaje**.

Nîha mirov bala xwe bide ser guherînên dangan, ka çawan di navbera *d* û *v* de guherîn pêk hatiye. Tiştêk bi vî rengê dikare bê texmînkirin ku dengê *d* pêşiyê bûye *b* wek ku di (10a) de jî tê dîtin û di qonaxeka din de weke (10b) dengê *b* veguheziye ser *v*.

**Der**→**ber**→**ver**, (**derketin**→**verketin**)

Bnr. M. Malmîsanij, *Kürtçede Ses Değışimi*, Vate, Stenbol 2013. r. 30.

(diachronik) û berawirdî li guherîna dengan binêre.<sup>88</sup> Ji ber vê yekê daneyên zêdetir pêwîst in û nivîsên ji serdemên cihêreng. Helbet li vir hewl hatiye dayîn ku vekolîna zimanê herêma Deregezê bi awayekî wesfî bê pêşkêşkirin.

(9) Guherîna dengê **v** û **d** jî weke li hin bêjeyan heye.

a. *Lawî paşê verdekevi ser qesrê xwe.* (KD)

Lawê padişêh **d**erdikeve ser qesrê xwe. (KB)

(10) Di kurmanciya Deregezê de gelek caran **b** bi **w/y** re tê guhertin.

a. *Fikrek we/ye halê me bikin.* (KD)

Fikrekê **bi** halê me bikin. (KB)

b. *Ye xewn dewîni ku ta heft salan paşati le henî...* (KD)

c. *Hinek we/ye xwe dexwinî.* (KD)

Em hinekê **bi** xwe dixwin. (KB)

(11) Dengê **h** di destpêka hin bêjeyan de heye.

a. *Henîşk* (KD) → Enîşk (KB)

b. *Henî* (KD) → Enî (KB)

c. *Hanîn* (KD) → Anîn (KB)

d. *Havîtin* (KD) → Avêtin (KB)

e. *Herd* (KD) → Erd (KB)

(12) Guherîna dengê **d** ku hin caran dibe **t**

a. *Tînim* → **dî**nim

b. *Tavêjim* → **d**iavêjim

c. *Têm* → **d**ihêm

(13) Guherîna **b** bi **w** di devoka kurmanciya bakurî de jî wek li Malatiya,

Semsûr, Mereşê heye. Di kurmanciya Deregezê de jî bi vî awayî ye.<sup>89</sup>

a. Ji karê xwe kêfxweş **bû**. (KB)

b. Le karê xe kêfxaş **wû**. (Meletiya)

c. *Je karê xwe xoşhal wû.* (KD)

(14) Hebûna dengê **kî** di navbera *x* û *q* de ku di hin bêjeyan de xuya dike ku

<sup>88</sup> Bruce Hayes, *Introductory phonology*, Blackwell, West Sussex, 2009. r.223.

<sup>89</sup> Behruz Shujai, *The Kurdish of Gilan*, (teza çapnebûyî), Uppsala University 2000. r.14.

ev deng zêdetir nêzî dengê *x* ye.

a. *Aşiqî/ê keçikê wûye.* (KD)

(15) Guherîna dengê **b** bi **v**.

a. *Ez dibêjim.* (KB)

b. *Ez devêjim.* (KD)

(16) Guherîna dengê **w** û **v**.

a. *Pezê me wenda bûye.* (KB)

b. *Pezê me venda bûye.* (KD)

(17) Guherîna dengê **d** û **y**. Gelek caran dengê **d** ya ku di lêkeran de dema niha çêdike bi **y** re tê guhertin.

a. *Yekevi* → **dikeve**

b. *Yewîni* → **dibîne**

Parçeyekî van mînanan her wisa mirov dikare di çîrokekê ji herêmê de bi vî rengî bibîne.

/... yekevi (**dikeve**) yewîni (**dibîne**) baxek e baxek e ye bin zemînê wa ku hûşê yêkê tere ku tikevî vî baxa, va tere le penêk xwe veyşêri (vedişêre) yewîni (**dibîne**) ku keçikek kitawek le wer e yexwîni (**dixwîne**) ye vî, yêk je der de kete orta vî baxa ningî xwe yekullê...<sup>90</sup>

Ev nimûne hertim durist nîne, gelek caran jî tîpa **d** weke xwe dimîne û ti guhertin têda çênabe.

Mînak: *Ez kar **dekim.*** (KD)

Li vê mînakê ji ber ku tîpa dawî ya bêjeya /kar/, /r/ nedengdêr e, piştî wê **d** di destpêka *dekim* de weke xwe maye. Lê guhertina **d** bi **y** gelek caran weke kelijînê pêk tê. Mînak eger tîpa dawî ya bêjeya berî bêjeyekê, dengdêr be, wê çaxê şansa kelijîna dengan heye û ihtimalen dengê **d** diguhere û dibe **y**.

(18)

a. *Yekevi yewîni.* (KD)

<sup>90</sup> Parçeyek ji çîroka Qere-Noker e, Metna wê ya kamil di dawiya vê lêkolînê de heye.

Dikeve dibîne. (KB)

b. *Kitawek le wer e yexwîni.* (KD)

Kitabek li ber e dixwîne. (KB)


c. *Radewi yekevi.* (KD)

Radibe dikeve. (KB)

Weke ku mînak û dane nîşan didin, guherînên nedengdêran heta radeyekê diyar bûn, li vir tenê armanc ew e ku guherîn werin qeydkirin û xuyakirin. Ev mînakên ku guherîn di wan de hatiye tesbîtkirin bi awayekê rêzikî (bi qaîde) nînin, yanî hertim di nava axaftinê de ev guherîn bi heman awayê çênabin.

### 3.1.2. Dengdêr û pevguherîna dengdêran

Tîpên dengdêr di kurdî de 8 in ku ji wan 3 dengdêr kurt û 5 dengdêr dirêj in.<sup>91</sup>



Cedwela 3: Dengdêrin kurdî û cihê bilêvkirina wan.<sup>92</sup>

Wekî ji tabloyê jî diyar dibe dengdêr di kurmancî de bi vî rengî ne;

**Dengdêr (Vowel)** a, e, ê, i, î, o, u, û

<sup>91</sup> Celadet Alî Bedirxan, *Elfabêya kurdî* & ... 2002. r. 11.

<sup>92</sup> Ev cedwel ji notên Behruz Shujai yê zanîngeha Artukluyê hatiye girtin. Ji bo parvekirina van notan ez careke din spasiya birêz Shujai dikim.

Dengdêrên kurt (short vowels) i e u

Dengdêrên dirêj (long vowels) a ê î o û

Di kurmanciya Deregezê de guherîna dengdêran jî heye, li gor kurmanciya bakur hin taybetmendiyên kurmanciya Deregezê hene ku dê li jêrê bèn ravekirin.

(19) Guherîna dengê **i û e** di pêşdaçekan de.

a. *Ez je êş tēm* (KD)

*Ez ji êş tēm.* (KB)

b. *Le mala me mîvan hene.* (KD)

*Li mala me mêvan hene.* (KB)

Di (19 a,b) de diyar dibe ku di kurmanciya Deregezê de li cihê **li û ji** ya pêşdaçekên kurmanciya bakurî de, **le û je** tê bikaranîn.

(20) Guherîna dengê **a û e** di paşdaçekan de.

a. *Va jî tê ye qêzê ra yeyê.* (KD)

*Ev jî tê bi qêzê re dibêje.* (KB)

b. *Xani ye ser te wa bikevi.* (KD)

*Xanî bi ser te de bikeve.* (KB)

(21) Guherîna dengê dawiya lêker yan navdêran; **i û î** tê guhertin.

a. *Hêstirê mi balgi şil kir.* (KD)

b. *Sa xwe ra xani çêkiriye.* (KD)

c. *Yekevi* → **dikeve**

d. *Yewîni* → **dibîne**

e. *Veyeşêri* → **vedişêre**

f. *Yexwîni* → **dixwîne**

(22) Guherîna dengê **e û i** di dawiya lêker yan navdêran de. Helbet dengê **e** di dawiya lêker yan navdêran de dikare weke dengê **i** yan **ê** bê bihîstin ku zêdetir nêzî dengê **i** ye.

a. *Verdekevi/ê yewîni/ê* → **derdikeve dibîne**



(23) Guherîna dengdêra **o** bi **wî** di hin bêjeyan de.

a. *Dwîtin* → dotin

b. *Kwîr* → kor

c. *Swîr* → sor

d. *Twîj* → toj

e. *Kwîn* → kon

(24) Guherîna dengê **o** û **î** di hin bêjeyan de.

a. *Rîvî* → rovî

b. *Firîtin* → firotin

c. *Mîrî* → morî

d. *Kîvî* → kovî

Li gor daneyên herêma Derergezê û bi berawirdkirina wan daneyan ligel kurmanciya bakurî re tê dîtîn ku guherîn di nava dengdêran de heye; li gor mînak du guherînên berbiçav tînin dîtîn;

1- Di kurmanciya bakurî de **di** tê pêşiya reha dema niha û lêkera dema niha pê tê dariştin, lê di kurmanciya Deregezê de ev pêşgir weke **de** xwe nîşan dide. Mînak:

**Dixwim** → *dexwim*

**Dikim** → *dekim/dekem*.

2- Guherîna pêşdaçekên **ji** û **li** ye ku di kurmanciya Deregezê de weke **le** û **je** tînin dîtîn. Weke mînak:

**Le vira** → **li** vir

**Je mal tîm** → **ji** male tîm

Wek ku ji mînakên jî xuya dibe ferq û guherînên binyadî di dengnasiya kurmancî ya Deregezê de bi vî rengî ne niha ev yek dikare bê pirsîn ka gelo bêjesaziya kurmancî ya devera Deregezê bi çî rengî ye? Gelo guherîn di bêjesaziya

devera navborî de jî çêbûye û eger erê, bi çi awayî ye?

### 3.2. Bêjesazî (Morphology)

Li gor çarçoveya teorîk ku di beşa duyem de heye, bêjesazî di kurmancî de mijareke berfire ye û gelek hêman dikarin li ser bêjesaziya kurmancî bandorê dayînin; nîşankirina rewşê (tewang), nasyarî û nenasyarî, zayend û hinek ji van hêmanan in. Niha mijarên teorîk yê nîşarepêkirî, li gor mînak û daneyên devera Deregezê dê were nîşandan ka gelo kurmanciya devera navborî bi çi rengî ye.

#### 3.2.1. Nîşankirina rewşê (Case marking)

Hêmanên weke kara û berkarê li ser çemandina lêkeran tesîrê çêdikin. Di zimanekî weke inglîzî de, lêker tenê li gor karayê tê çemandin ku bi vî zimanî re dibêjin akuzatîv. Zimanekî weke kurmancî jî heye ku lêkerên wî li gor têper û teneperbûnê û dema lêkerê tî çemandin. Kurmanciya bakurî weke zimanekî ergatîv-absolutîf (nîv-ergatîv) di nîşankirina rewşê de ye û girêdayî têper yan teneperbûna lêkerê û dema lêkerê ye. Bi giştî di zimanên ergatîv de kara ya lêkerên teneper û berkara (object/patient) lêkerên têper bi awayekî kod dibin. Ev rewşa di kurmanciya Deregezê de (ji bilî hin awarteyên ku dê li jêrê bîr ravekirin) nehatiye guhertin û weke kurmanciya bakurî xuya dike.<sup>93</sup>

(25)

- a. *Ez hatim.* (karaya lêkerekê teneper)
- b. *Te ez dîm.* (Berkara / patient) lêkerekê têper.

(26) Dema niha

- a. *Dilber nameyekê deşîni.* (KD)
- b. *Ferhad avê vedexwe.* (KD)

<sup>93</sup> محمد، تقوی، مقایسه نظام های حالت دهی گویش کرمانجی، ص. 44

<sup>93</sup> Geoffery Heig, **Alignment in Kurdish**, 2004.

<sup>93</sup> Robert Dixon, **Ergativity**, r. 1.

<sup>93</sup> Roşan Lezgîn, **Ji bo Kurmancan** r. 124.

- (27) Dema borî
- a. *Dilberê nameyek şand.* (KD)
  - b. *Berê av vexwar.* (KD)

Li gor tarîfa zimanên absolûtîf-ergatîv, di dema borî ya lêkerên têper de, lêker bi berkarê re li hev dike. Helbet ev rewş di kurmanciya Deregezê de di hevokên ku bi şexsa sêyem ya pirjimar de rastî tevliheviyeke rêzimanî bûye, helbet ev tevlihevî jî li gorî şexs û kesan tê guhertin, li gorî xebata meydana di saheyê de ev mînakên li jêrê hatin qeydkirin.

- (28)
- a. *Wan tu dîn.* (KD)
  - b. *Wan nan xwarin.* (KD)
  - c. *Wan maşîn xera kirin.* (KD)

Di (28 a, b, c) de tê dîtin ku lêkerê têper li gorî berkarê nehatiye avakirin, diyar e ku lêker ketiye bin bandora karayê û bi awayekî pirjimar hatiye dariştin. Di kurmanciya Deregezê de rewşa ergatîv, tenê di şexsê sêyem yê pirjimar de ku di mînaka (28ê) de hatiye, tevlihevî derdikeve pêşiya me, helbet ev awa jî ne yeksan û hertimî ye, li gorî xebata meydana axêveran wê herêmê hevokên (28 b,c) bi du awayên cihêreng jî saz dikirin, dihate dîtin ku lêkerê heman hevokan hem li gorî berkarê bê kişandin û hem jî li gorî karayê. Binêrin (29 a, b, c, d).

- (29)
- a. *Wan nan xwar.*
  - b. *Wan nan xwarin.*
  - c. *Wan maşîn xera kir.*
  - d. *Wan maşîn xera kirin.*

Herwisa hêmaneke din ku girêdayî mijara bêjesaziyê û dikare tesîrê li ser bêjesaziyê çêke, zayenda navdêran e.

### 3.2.2. Nîşankirina rewşê û zayendê (Case and Gender)

Di kurmanciya bakurî de nîşankirina rewşê herwisa bi zayendê re jî li hev dike. Kênzêde di hemû devokên kurmancî de zayend bi awayekî xwe nîşan dide, li hin deverên weke Xorasanê û Gilanê tevlihevî heye lê hin bi giştî ji nav neçûye;<sup>94</sup> Bi taybet jî di zayenda nêr de dema em dixwazin rewşê nîşan bikin ev yek xwe nîşan dide û di bêjeyên ku divê bîn çemandin de, dengê berî dengê dawiyê eger **a** be, diguhere û dibe **î/ê**. Di bêjeyên ku dengê berî dengê dawiya wan de dengdêra **a** tunebe di nîşankirina rewşa wan de ti guherîn pêk nayê yanî naçemin û rewşa wan nayê nîşankirin. Weke (31 c), navdêr nêr e û li gor zayendê divê rewşa wê jî bê nîşankirin, lê di navdêrên nêr de ev mijar tevlihev bûye.

Di kurmanciya Deregezê de jî zayend hertim sabit nîne û gelek caran zayenda mê di frazên navdêrî de jî weke yên nêr tîn kodkirin. Ev mijar dema sazkirina frazên navdêrî bi giştî xuya dibe. Li gor daneyan dibe ku hin kes bibêjin *qelega sor* û hin kes jî bibêjin *qelega sor*. Yanî ji bo zayendê gelek caran ti qaîde û usûl nayên riayetkirin. Di mînakên li jêrê de vê yekê mirov dikare bibîne.

- (30) Dema niha
  - a. *Sultan we wî ra dewê*. (KD)
  - b. *Sultan bi wî re dibêje*. (KB)
- (31) Dema borî
  - a. *Sultîn/ Sultên we wî ra go*. (KD)
  - b. *Sultên bi wî re got*. (KB)
  - c. *Meme go*. (KD)
  - d. *Mihemedî got*. (KB)
  - e. *Ebês we carê ra kire cirri*. (KD)  
Ebês bi carê re (ji nêşka ve) deng kir. (KB)

Taybetiyek di çemandina û nîşankirina rewşê de li Deregezê heye ku gelek

---

<sup>94</sup> Behruz Shujai, *The Kurdish of Gilan*, (teza çapnebûyî), Uppsala University 2000. r.17.

bêjeyên nêr dema tèn çemandin, hemû dengên **a** yên berî xwe jî diçemînin. Weke mînak;

(32)

- a. *Ez terime wêlêt* → ez terime welêt
- b. *Wêzîr go* → wezîrî got
- c. *Bêrêt* → berêt/beratî
- d. *Wêkîl* → wekîlî

Nîşankirina rewşa navdêrên nêr û mê bi rengê li jorê hate diyarkirin. Dane didin xuyakirin ku ji bo çemandin û nîşankirina navdêrên nêr ti qaide nîne û herwisa di kurmanciya devera Deregezê de tevliheviya zayendê jî çêbûye. Helbet zayend bi regekî din jî xwe nîşan dide ew jî forma bangnîşanê ye ku li jêrê bi mînakan tê şirovekirin.

### 3.2.3. Bangnîşan (Vocative);

Herwisa bangnîşan jî yek ji mijarên bibandor e li ser nîşankirina rewşê û bêjesaziyê. Di kurmanciya Deregezê de weke kurmanciya bakurî, di mijara bangnîşanê de nêr û mêtî jî tê diyar kirin. Di vê beşê de teqriben tevlihevî çênebûye û zayend bi rewşê ve li hev dikan.

(33)

- a. *Lo birev lê hat.* (KD)  
Lo birev lehî hat. (KB)
- b. *Xwengê, tu le vira çî deki!* (KD)  
Xwengê tu li vir çî dikî! (KB)

Di kurmanciya Deregezê de bangnîşan bi awayekî din jî çêdibe; Zayend di vê rewşê de bi giştî diyar dibe û li gor daneyan, di vê mijarê de tevlihevî çênebûye. Yanî zayend di vê formê de heye û tevlihev nebûye.

(34)

- a. *Elêlo lawik, ka bavê te?* (nêr) (KD)
- b. Lawiko, ka bavê te? (KB)
- c. *Elêlê keçik, ka bisekin.* (mê) (KD)
- d. Keçikê, ka bisekin! (KB)

Bangnîşan û nîşankirina rewşê ji bo navên nêr û mê cuda ye:

- a. Heseno! (Dema bangî Hesên dikin)/nêr
- b. Zeynewê! (Dema bangî Zeynewê dikin)/mê

Bangnîşan ji bo pirjimar û herdu zayendan di kurmanciya Deregezê de bi paşgira *ino* çêdibe:

- c. *Xwengino! Hûn ji ku tîn?* (KD)
- d. *Xwîşkino! Hûn ji ku derê tîn?* (KB)

Daneyên xebata meydanî yê herêma Deregezê di rewşa bangnîşanê de zayend hertim heye û tê dîtîn ku di mijara bangnîşanê de nêr û mêtî tevlihev nebûye. Weke kurmanciya bakurî, di kurmanciya Deregezê de jî *o* bo nêr û *ê* bo mê xuya dike.

Ji aliyekî din ve bêjesazî di kurdiya bakurî de dikeve bin tesîra nasyarî û nenasyarîya navdêran.

### 3.2.4. Nasyarî (Definite)

Mijara nasyarî û nenasyarîya bêjeyan jî dikeve bin beşa bêjesaziyê û ji ber ku nasyar yan nenasyarbûna bêjeyan bandorê li ser bêjesaziyê datîne loma hewce ye li vir bê ravekirin.

Navdêr di kurmanciya bakurî de bi giştî hem di forma nomînatîv hem jî oblîk

de nasyar in.<sup>95</sup> Kurdiya Deregezê jî wisa ye. Eger paşgira nenasyariyê li ser navdêran tunebe, nasyar e. weke mînak;

(35)

- a. *Em we hespê terinî çolê.* (KD)  
Em bi hespê diçin çolê. (KB)
- b. *Em nikayninî baxan av bidinî.* (KD)  
Em nikarin av bidin baxan. (KB)

Di (35 a, b) de du navdêrên *hesp* û *bax* nasyar in, yanî ji bo bihîzer aşina ne. Li vir tê dîtin heta ku navdêr paşgira nenasyariyê weke *ek* nestîne ew nasyar in û dema axêver behsa *hespê* yan *baxan* dike, ew wisa dizane ku bihîzer mebesta wî tê digihêje. Lê gel vê yekê nenasyarî jî heye.

### 3.2.5. Nenasyarî (Indefinite)

Dema ku paşgira nenasyariyê *-ek* yan *-ine* li dawiya navdêran nasyar zêde bibin li gorî pirjimar yan yekjimarbûna navdêran, navdêrên nenasyar çêdibin.

(36)

- a. *Eger mêrek je kelê here şêhr, ba bêji.* (KD)  
Eger mêrek ji gund biçê bajêr bila bibêje. (KB)

Ji bo navdêrên yekjimar, di (36 a) de dema li navdêra “*mêr*”, “*ek*” bê zêdekirin ev navdêr dibe nenasyar û nediyar e ew *mêr* kî ye yanî gotinên axêver bo bihîzer xuya nake ka mebest kîjan mêrê gund e.

Paşgira *-ine* jî ji bo navdêrên nenasyar û pirjimar tê bikaranîn. Di (36 c, d) de ev halet xuya dike û bihîzer ji axaftina axêver wisa tê digihêje ku hin hevalên wî hebûne lê tam nizane kîjan heval in yanî bihîzer wan hevalan nas nake.

---

<sup>95</sup> Mikail Bûlbûl, *Peyvrêzî di Frazên Navdêrî ...r. 95.* Herwiha bnr. Thackston, W. M., **Kurmanji Kurdish...** r.7.

- b. Hevaline mi hebûn. (KD)  
Hevaline min hebûn. (KB)
- c. Pezine xwe kirîn û pê guzerana xwe kirin. (KD)  
Pezine xwe kirîn û pê debara xwe kirin. (KB)

Tiştêkî din ku bi meseleya nasyar û nenasyariyê re têkildar e, zayend e, ku ev mijar jî divê bê berçavgirtin.

### 3.2.6. Nenasyarî û zayend (Indefinite and gender)

Bi giştî di kurmanciya Deregezê de ji bo zayenda navdêran tevlihevî çêbûye. Ihtimalen her nav dikare bi her awayî bê çemandin. Ji bo navdêrên nenasyar jî ev mesele derbasdar e.

Dema kesek bibêje: “hevalek min hebû.” Zayenda heval diyar nabe.

Yanî gelek caran ji bo navdêrên nenasyar -weke kurmanciya bakurî ku ji bo navdêrên nêr yên nenasyar /î/ û ji bo navdêrên nenasyar û mê /a/ yan /e/ tê dawiya navdêran,- ev yek di kurmanciya Deregezê de xuya nake.

(37)

- a. Lawikekê hejderha kuşt. (KD)
- b. Hevalek min hebû. (KD)
- c. Hevaleki min heye. (KD)
- d. Hevalekî min hebû. (KB)

Di kurmanciya Deregezê de partîkelên nenasyariyê dema ku îzafê jî pê re tê çêkirin bi vî rengî ne:

- *Eki*: bo herdu zayendan → *lawikeki kurmanc go*.
- *Ek*: bo herdu zayendan → *hevalek mi hat*.

Nenasyarî û zayenda navdêran dikare bandorê li ser bêjesaziyê dayîne ku di



daneyan de hat ravekirin û wisa ku di mijara zayendê de jî hate şirovekirin, bi giştî zayenda navdêran -ji bilî mijara zayend di bangnîşanê de- tevlihev e û zayenda navdêrên nenasyar jî bi vî rengî tevlihev bûye û nêr û mêtiya navdêran nayê diyarkirin. Helbet mijara zayendê di cihnavên vegerok de jî gelek caran tê diyarkirin û rewşa vegerokî jî dikare li ser bêjesaziyê bandor dayîne ku li jêr tê dîtin.

### 3.2.7. Vegerok (Referential)

Cihnavên nîşandêriyê dema tên pêşiya navdêrekê û îşaret bi wan navdêran dikin, ev navdêrên îşaretpêkirî jî partîkileke nû distînin ku gelek caran zayend xwe di wê partîkelê de jî nîşan dide. Vegerok li gor yekjimar û pirjimar û herwisa xwerû û oblîkbûnê hin partîkelan distîne. Mînak:

(38)	<b>Xwerû</b>	<b>Oblîk</b>
	a. <b>Yekjimar</b> <i>Va heval-a</i>	<i>Vî jînikê</i>
	b. <b>Pirjimar</b> <i>Van hevalana</i>	<i>Wan hevalan</i>

Di kurmanciya Deregezê de, di dawiya navdêrên xwerû û yekjimar de yên îşaretpêkirî, *a* tê zêdekirin û bo herdu zayendan jî bi şîkîkê ye û nayê guhertin. Herwisa bo navdêrên oblîk û yekjimar *ê* di dawiya navdêrên îşaretpêkirî de tê zêdekirin. Bnr. (38)ê. Di mijara *vegerokê* de jî wisa ku dane nîşan didin zayend tevlihev bûye û bo navdêrên nêr û mê ti ferq di bêjesaziya vegerokê de nîne.

### 3.2.8. Cihnav (Pronoun)

Bêjeyên ku cihê navdêran digirin cihnav in. Cihnav herwisa mêjer û carinan jî zayenda navdêran dide zanîn. Çend cure cihnav weke cihnavên kesîn, cihnavên pirsîyariyê û cihnavên nîşandanê hene.<sup>96</sup> Ji ber tesîra cihnavên li ser bêjesaziya kurmancî li vir hemû cureyên cihnavan tên ravekirin;

<sup>96</sup> Celadet Alî Bedirxan, *Elfabêya kurdî & Bingeha ...* 2002.r.71.

### 3.2.8.1. Cihnavên kesîn (Personal pronoun)

Cihnavên kesîn di kurmancî de du grûb in: Xwerû û Çemandî. Di kurmanciya Deregezê de jî bi vî rengî ne: Grûba ewil an xwerû di dema niha de û herwisa dema borî ya lêkerên têneper de rola kara (subject) li xwe digirin û grûba duyem yan çemandî di dema borî ya lêkerên têper de rola kara li xwe digirin.

Xwerû (direct)	Çemandî (oblique)
Ez	Mi/min
Tu	Te
Ew	wê/wî
Em	Me
Hûn	We
Ew/Ewna	Wan

*Cedwela 4: Cihnavên kesîn di kurmanciya Deregezê de*

### 3.2.8.2. Diyarkerê nîşandêr (Demonstratives)

Xwerû (Nominative)		Çemandî (Oblique)
Nêzîk		Nêzîk
Yekjimar	Va	vî/viya
Pirjimar	Vana/evna	Vana
Dûr		Dûr
Yekjimar	Ew	wî/wê
Pirjimar	Ewna	Wan

*Cedwela 5: Diyarkerên nîşandêr di kurmanciya Deregezê de*

Diyarkerên nîşandêr bi xwe du cure ne, 1. Nêzîk 2. Dûr, herwisa nîşandêr weke cihnavên kesîn bi du formên xwerû û çemandî jî hene.

(39)

- a. *Va kê ye.* (KD)  
Ev kê ye. (KB)
- b. *Vana harin.* (KD)

### 3.2.8.3. Cihnavaya vegerok (Reflexive pronoun)

Di kurmanciya bakurî de cihnavaya vegerok cihnavaya *xwe* ye. Ji ber ku kar li karayê vedigere jê re cihnavaya vegerok tê gotin. Cihnavaya “xwe” him ji aliyê zayend û him jî ji aliyê mêjerê ve notr e. Hem dikeve cihê navdêrên yekjimar û pirjimar, him jî dikeve cihê navdêrên mê û nêr.<sup>97</sup>

Di kurmanciya Deregezê de jî wek ku di mînakên de tê dîtin cihnavaya vegerok bi şiklê **xwe/xwa** tên derbirîn.

- (40) Cihnavên vegerokî
- a. *Sa lawî xwe yexwazi.* (KD)  
Ji bo kurê xwe dixwaze. (KB)
  - b. *Ez we xwa je eş têm.* (KD)  
Ez bi xwe ji eş têm. (KB)

Di (40 a, b) de tê dîtin ku du formên cihnavaya vegerok hatiye bikaranîn ku li gor daneyên herêmî herdu awa jî tên bihîstin.

### 3.2.8.4. Cihnavên pirsyariyê (Interrogative pronoun)

Bêjeyên ku bi rêya pirsê cihên navdêran hem jî cihê cihnavan digirin, cihnavên pirsyariyê ne. Cihnavên pirsyariyê di nava hevokê de dikarin di rewşa pirjimar, yekjimar, xwerû û tewandî de bin.<sup>98</sup> Cihnavên pirsyariyê yên di kurmanciya Deregezê li jêrê bi vî rengî ne:

- Çere
- Çima
- *Sa çi* → bo çi
- Çend
- *Çiqes* → çiqas

<sup>97</sup> Çetin Taş, **Waneyên Rêziman û Rastnivîsa Kurmancî**, Weşanxaneya Dîwan, Stenbol, 2013.r.121.

<sup>98</sup> Hb. r.126.

- *Kînga*
- *Kî*
- *Kê*
- *Çi*
- *Kîjan*
- *Çendan*

### 3.2.8.5. Cihnavên likandî (Enclitics pronoun)

Ev cihnav tê dawîya lêkerê û dawîya daçekê û şûna bêjeya piştî lêker yan daçekê digire. Cihnavên likandî du grûb in.<sup>99</sup>

(41)

Paşlêkerî:

- a. Min nan **da wî**: min dayê.

Paşdaçekî:

- b. Ez **je wî** qariyame: ez **jê** qariyame.
- c. Hey te **le wî** kir ha: hey te **lê** kir.
- d. Mi **je wî** pirsî: mi **jê** pirsî

Di mijara cihnavan de hewl hate dayîn ku hemû piraniya cihnavên berbelav yê aktîv di kurmanciya Deregezê de bîn ravekirin û bi mînak û daneyan ew hatin diyarkirin, li gor daneyan û mînakên ku bi kurmanciya bakurî ve hatin berawirdkirin, wisa xuya ye ku di mijara cihnavan de zêde guherîn pêk nehatine û teqrîben her du devok di vê mijarê de yeksan in.

Herwisa dema mirov behsa gramera zimanekî dike, lêker roleke girîng di zimanan de digirin û di demên cuda de forma dariştina wan jî tê guhertin.

<sup>99</sup> Deham Ebdulfetah, *Cînva di zimanê kurdî de (kurmanciya jorîn)*, Enstîtûya kurdî ya Amedê, Istanbul, 2006. r. 63.

### 3.2.9. Lêker (Verb)

Ew bêjeyên ku kar, bûyer, çalakî, qewimîn û pêkanînê diyar dikin lêker in. Kar û barê ku tê kirin li lêkerê tê barkirin.<sup>100</sup> Di kurmancî de ji ber ku lêker li gorî kes, dem, kara û berkarê tîr sazîkirin, bêjesaziya wan jî berfireh e.

Kurmancî weke zîmanekî nominative-accusative e (nîvergatîv);<sup>101</sup> lêkerên têper yêr dema niha û lêkerên tîneper di dema borî de wek hev tevdiqerîn. Li vir lêker û bêjesaziya lêkeran bi awayekî yeksan çêdibîn.

- a. *Em dexwinî.* (KD)  
Em dixwin. (KB)
- b. *Em deçûnî û dehatinî.* (KD)  
Em diçûn û dihatin. (KB)

Li rexê din mijarek heye ku girêdayî lêkerê ye û “hebûn” yan “rewşa karayê” nîşan dide ku weke *kopula* tîr pênasîkirin.

#### 3.2.9.1. Kopula (Copula)

Lêkerên alîkar yêr dema niha ku di ingilîzî de jî weke (am, is, are) tîr nasîkirin, li vir weke *kopula* hatine binavîkirin. Du cure kopula di kurmancî de hene ku li gor dengê dawîya bêjeyê –dengdêr yan nedengdêr- tê guhertin.<sup>102</sup>

1. Dema ku dengê dawîya bêjeyê nedengdêr be.

Yekjimar	Pirjimar
im	inî
î	in
e	in

<sup>100</sup> Hb. r.176.

<sup>101</sup> Geoffery Heig, **Alignment in Kurdish: A Diachronic Perspective**, Zu Kiel Unisversity 2004. r.25.

<sup>102</sup> Thackston, W. M., **Kurmanji Kurdish: A reference grammar with selected readings**, Unpublished, Harvard University Press, Massachusetts 2006. r.30.

(42)

- |                        |                             |
|------------------------|-----------------------------|
| a. <i>Ez xizan im.</i> | d. <i>Em xizan inî.</i>     |
| b. <i>Tu xizan î.</i>  | e. <i>Hûn xizan in.</i>     |
| c. <i>Ew xizan e.</i>  | f. <i>Ewna/ew xizan in.</i> |

2. Dema ku dengê dawîya bêjeyê dengdêr be.

Yekjimar	Pirjimar
----------	----------

me	nî
----	----

yî	ne
----	----

ye	ne
----	----

(43)

- |                              |                                   |
|------------------------------|-----------------------------------|
| a. <i>Ez ji Xorasanê me.</i> | d. <i>Em ji Xorasanê nî.</i>      |
| b. <i>Tu ji Xorasanê yî.</i> | e. <i>Hûn ji Xorasanê ne.</i>     |
| c. <i>Ew ji Xorasanê ye.</i> | f. <i>Ewna/ew ji Xorasanê ne.</i> |

Li gorî mînakên (42 d) û (43 d) di kopulayê de tê dîtîn ku di kesê yekem ya pirjimar de ferq di navbera kurmanciya Deregezê ê û kurmanciya bakurî de heye.

Li aliyê din têkildarî mijara lêkerê, nerênîkirina lêkeran jî heye ku li ser dariştina lêkerê di forma nerênî de tesîrê çêdike û herwisa bêjesazî jî ji vê yekê bandorê digire.

### 3.2.9.2. Nerênî (Negation)

Nerênîkirina lêkeran di kurmanciya Deregezê de bi *ne* yan *na* tê avakirin.

Erênî	Nerênî
-------	--------

Dexwazi	naxwazi
---------	---------

Bixwazi	nexwazi
---------	---------

Herwisa di KD de ji bo nerênîkirinê forma fermanî ya lêkeran, gelek caran pêşgira *me-* li cihê *ne-* tê bikaranîn.

- a. *Mere* (KD) → *nere* (KB)
- b. *Meke* (KD) → *neke* (KB)
- c. *Mexwe* (KD) → *nexwe* (KB)

Li kurmanciya Deregezê nerênîkirina hevokê bi du haletan çêdibe ku haleta duyem zêdetir li kar e.

- (44) Haleta yekem
  - a. *Em ne dew inî ku hûn me vexwin.* (KD)  
*Em ne dew in ku hûn me vexwin.* (KB)
- (45) Haleta duyem
  - a. *Em dew nininî ku hûn me vexwin.* (KD)  
*Em ne dew in ku hûn me vexwin.* (KB)
  - b. *Em le mal newûnî ku hûn hatiwûn.* (KD)  
*Em ne li malê bûn ku hûn hatibûn.* (KB)

Ligel vê yekê taybetiyek di kurmanciya Deregezê de heye, dema ku şexsê ewil ya pirjimar be; Gelek caran cihnavê kesîn ji bo hevokê nayê bikaranîn. Li mînakan binêrin:

- (46)
  - a. *Dexwinî.* (KD)  
*Em dixwin.* (KB)
  - b. *Terinî.* (KD)  
*Em terin/diçin.* (KB)
  - c. *Em xwarinê/î.* (KD)  
*Wan em xwarinê/em hatine xwarin.* (KB)

Di vê demê de hebûna cihnavê zêde girîng xuya nake. Dibe ku ji ber hebûna

“î” di “inî” de, ev diyarde bi vî rengî ava bûye. Lê li gor axaftina wê herêmê, bêyî cihnavê jî hevok wateya xwe digihîne bihêzer.

Li vir lêkera “dayînê” li gor deman tê kişandin:

a. Dema niha

<b>Yekjimar</b>	<b>Pirjimar</b>
-----------------	-----------------

Ez deyem.	Em deyinî.
-----------	------------

Tu deyî.	Hûn deyin.
----------	------------

Ew deye.	Ewna deyin.
----------	-------------

b. Dema niha ya şertî

<b>Yekjimar</b>	<b>Pirjimar</b>
-----------------	-----------------

Ez bidim.	Em bidinî.
-----------	------------

Tu bidî .	Hûn bidin.
-----------	------------

Ew bide.	Ewna bidin.
----------	-------------

c. Dema borî

<b>Yekjimar</b>	<b>Pirjimar</b>
-----------------	-----------------

Mi da	Me da.
-------	--------

Te da.	We da.
--------	--------

Wî/wê da.	Wan da.
-----------	---------



d. Dema boriya çîrokî

**Yekjimar**      **Pirjimar**

Mi daye.      Me daye.

Te daye.      We daye.

Wî/wê daye.      Wan daye.

e. Dema boriya domdar

**Yekjimar**      **Pirjimar**

Mi deda.      Me deda.

Te deda.      We deda.

Wî/wê deda.      Wan deda.

f. Dema Boriya tamam

**Yekjimar**      **Pirjimar**

Mi dabû.      Me dabû.

Te dabû.      We dabû.

Wî/wê dabû.      Wan dabû.

g. Dema boriya şertî

**Yekjimar**      **Pirjimar**

Min bidaya.      Me bidana.

Te bidaya.      We bidana.

Wî/wê bidaya. Wan bidana.

Herwisa demek di kurmanciya Deregezê de heye ku di kurmanciya bakurî de nayê dîtin. Ev dem jî dema niha ya berdest e.

h. Dema niha ya berdest

**Yekjimar      Pirjimar**

Ez ê deyim.      Em ê deyinî.

Tu ê deyî.      Hûn ê deyin.

Ew ê deye.      Ewna ê deyin.

Ligel vê yekê di kurmanciya Deregezê de dema bê (ayende/dahatû) xuya nake. Wisa diyar e ku ji bo çêkirina dema bê ji dema niha û hin bêjeyên alîkar sûdê werdigirin. Weke mînak;

(47)

a. *Ez sibe tîm.* (KD)

Ez dê sibe bîm. (KB)

Di mînaka (47 a) de bêjeya *sibe* bi awayekî semantîk dide xuyakirin ku ev bûyer dê di dema bê de çêbibe. Herwiha li gor daneyên herêmî di kurmanciya Deregezê de dema bê jî nehate dîtin.

Têkildarî bêjesaziyê di kurmancî de rengdêr jî herwisa li ser vê mijarê bibandor e ku pêwîst e bi baldarî li rengdêran were nêrîn.

### **3.2.10.      Rengdêr (Adjective)**

Rengdêr bi giştî ji bo ravekirina navdêran bi kar tên. Di kurmancî de rengdêr di bi du awayan tên bikaranîn.<sup>103</sup> Wek ku di mînakên jêrê de dê were nîşandan, du

<sup>103</sup> Celadet Alî Bedirxan, *Elfabêya kurdî & Bingeha ...* 2002. r. 89.

cureyên rengdêran hene ku dikarin navdêran rave bikin û bi vî rengî dikarin bêjeyan li gor zayenda wan bi şikleke nû darêjin. Yanî dema partîkeleke nû dikeve navbera rengdêrek û navdêrekê, îzafeyek jî lê zêde dibe û bêjesaziyeke nû pêk tê. Li gor daneyên kurmanciya Deregezê du formên bikaranîna rengdêran hene:

- a. Rengdêr bi navdêran re tên bikaranîn û wesfandinê dikin.

Mînak: Gula **sor**, **kîjan** heval, bêhna **xweş**, **şeş** qelem, **ti** kes,

- b. Weke pêveber tên bikaranîn.

Mînak: Hewa **xweş** e. Ew lawika **jîr** e.

Dema rengdêr bi navdêran re tên bikaranîn, carinan berî navdêran (pre-nominal) û carinan jî piştî navdêran (post-nominal) tên û wesfandinê dikin.<sup>104</sup>

Mînak: Qelesa sor, di vî frazê de *qelem* hatiye ravekirin. Yanî *sor* rengdêr e ku *qelem* rave kiriye.

### 3.2.10.1. Rengdêrên berawirdî (Comparative Adjectives)

Ji bo berawirdkirina du tiştan û sazkirina rengdêrên berawirdî di kurmanciya Deregezê de paşgira *-tir* li rengdêran tê zêdekirin û rengdêra berawirdî çêdibe.

- a. *Şehr je kelan girtir in.* (KD)

Bajar ji gundan mezintir in. (KB)

### 3.2.10.2. Rengdêrên bala (Superlative Adjectives)

Ji bo berawirdkirin û çêkirina rengdêra bala di kurmanciya Deregezê de ji bilî paşgira *-tirîn* bi awayekî din jî rengdêra bala çêdibe ku zêdetir ev halet tê bikaranîn ku ew jî bi rengî ye.

*Je gêştan ....tir / je kullan ....tir*

---

<sup>104</sup> Çetin Taş, *Waneyên Rêziman...*2013.r.102.

- a. Kelê me **je kulli** kelan mezintir e. (KD)  
Gundê me ji gist gundan mezintir e. (KB)  
Gundê herî mezin gundê me ye. (KB)
- b. Hevalê min î kurmanc **je gêşti** hevalê min rindtir e. (KD)  
Hevalê min ê kurmanc ji gişt hevalên min rindtir e. (KB)  
Baştirîn hevalê min kurmanc e. (KB)

Di dewama mijara berfireh a bêjesaziyê de herwisa rewşa rêzkirina du navdêr yan çend navdêran li pey hev û tesîra vê yekê li ser teşegirtina bêjeyan jî tê pêşiya mirov ku ev mijar weke *îzafeyê* tê pênaskirin.

### 3.2.11. Îzafe (the Îzafe construction)

Îzafe dengdêrek e yan gireyek e ku di navbera du navdêran de dibe lînk û wan herdu navdêran li hev girê dide.<sup>105</sup>

Mînak: Hevalê min

Li vê mînakê “heval” raveber (headnoun) e, “ê” îzafe yan lînk e, “min” raveker (modifier) e.

Îzafe di kurmanciya Deregezê de weke kurmanciya bakurî nîne û hertim li gel zayendê li hev nake. Gelek caran bêjeyên mê jî bi forma bêjeyên nêr çêdibin. Çend cureyên avakirina îzafeyê di kurmanciya Deregezê de hene ku li jêrê tînin:

**Ê:** ji bo bêjeyên nêr û mê

**Î:** ji bo bêjeyên nêr û mê.

**a:** ji bo bêjeyên mê.

**Êne:** ji bo pirjimariyê

<sup>105</sup> Geoffery Heig, **Alignment in Kurdish**...2004. r.77.

(48)

- a. *Dilî wî meşkên.* (KD)  
Dilê wî meşikên/neşikên. (KB)
- b. *Lawî paşê qêzê te hildegiri.* (KD)  
Lawê padişêh qêza te hildigire. (KB)
- c. *Nika navî wî haka verketiye.* (KD)  
Niha navê wî wiha derketiye. (KB)
- d. *Diyî te çi got?* (KD)  
Diya te çi got. (KB)
- e. *Diya te le mal e.* (KD)  
Diya te li male ye. (KB)
- f. *Hevalêne mi hatin ez birim.* (KD)  
Hevalên min hatin ez birim. (KB)

Di (48) de mînak û hevokên curbicur ji kurmanciya Deregezê tên dîtin, di mijara îzafeyê de jî tevliheviya zayendê heye û têkçûna zayendê tê dîtin, li jêrê îzafeya frazên navdêrî yên nenasyar jî tên şirovkirin.

Dema ku îzafeya navdêrên nenasyar çêdibe, di kurdiya Deregezê de dîsa guherînek heye ku li gor mînaka (49) tê zelalkirin. Helbet ev guherîn zayendê jî tevlihev dike. Di van nimûneyan de tevliheviya zayendê tê dîtin.

(49) **i:** ji bo navdêrên nêr û mê û nenasyar

- a. Hevaleki mi heye.
- b. Kurdeki Efqanistanê hatibû Îranê.

Daneyên dêsmana îzafeya nenasyar û zayend nîşan didin ku di vê mijarê de jî tevlihevî û têkçûna zayendê çêbûye.

Bêjesazî di kurmancî de gelek berfireh e û gelek hêman dikarin li ser bêjesaziya kurmancî bibandor bin. Mijarên sereke yên weke nîşankirina rewşê, ergatîvî, bangnîşan, cihnav, nasyarî û nenasyarî, lêker, rengdêr û herwisa îzafeya

kurmancî hatin ravekirin. Herwisa ferq û cudahiyên sereke di navbera kurmanciya Deregezê û kurmanciya bakurî de li gorî daneyan hate dîtin ku mijara zayendê bi formeke sabit û biqaîde nîne, yanî tevliheviyek di mijara zayendê de pêk hatiye. Di mijara li pêşê de behsa hevoksaziya kurmancî û herwisa peyvrêziya kurmacî tê pêşkêşkirin.

### 3.3.Hevoksazî (Syntax)

Hevoksazî rêbaza pevgirêdana morfeman ji bo sazkirina yekeye mezintir e.<sup>106</sup> Ev şaxeke girîng ji zanista zimannasiyê ye. Peyvrêziya hevoksaziyê li ser wate û mebesta hevokê gelekî tesîrê çêdike. Yanî bi çend peyvên taybet mirov dikare hejmarek hevok saz bike ku her yek ji wan wateyeke xwe ya serbixwe hebe.

#### 3.3.1. Peyvrêzî (word order)

Peyvrêzî di kurmanciya Deregezê de bi vî rengî xuya dike.

SOV: Subject+Object+Verb

Ev “rêz” herwiha di kurmanciya bakurî de jî tê dîtin. Yanî bi termên kurdî Kara+berkar+lêker → (KBL) ye.

Hevokên sade:

Lêkerên têneper di hemû deman de û lêkerên têper di dema niha û bê de ji hêla hejmarê va li gorî karayê ne. Ev kara çî cihnav be û çî jî navdêr be ferq nake. Lêker bi awayekî giştî piştî kara û berkarê di dawiya hevokê de tê:

a. *Ez wî dewînim.* (KD)

Ez wî dibînim. (KB)

b. *Azad we Berêt ra çû.* (KD)

Azad bi Berêt ra çû. (KB)

---

<sup>106</sup> Suzette-Elgin Haden, *What Is Linguistics...*, 1973. r. 21.

- c. *Xelk jê detirsiyan.* (KD)  
Xelk jê ditirsiyan. (KB)
- d. *Ez elan je mal têm.* (KD)  
Ez niha ji male têm. (KB)

Berkarên xwerû û yên nexwerû piştî lêkerê tîn. Weke mînak;

- a. *Zerger şûr deye hevalê xwe.* (KD)  
Zêrker şûr dide hevalê xwe. (KB)

### 3.3.2. Bingihanek (Relative clause)

Frazên bingihanekî bi awayekî giştî bi **ku/ki** çêdibin ku di kurmanciya bakurî de jî bi heman awayî tê dîtin.

- a. *Çar bost zemînê me hebûyana ku nika wezê me haka newû.* (KD)  
Çar bihost erdê me hebûna ku niha rewşa me wisa nebû. (KB)
- b. *Le mal rûnî ku tişteke nawînî.* (KD)  
Li male rûnî ku tişteke nabînî. (KB)
- c. *Ez hatim ku wê biwînim.* (KD)

Hin fraz, bêyî bingihanekan jî dikarin çêbibin. Weke mînak;

- a. *Lawikê le derê kelê, birayê min e.*<sup>107</sup> (KD)  
Lawikê li gund, birayê min e. (KB)

Hin caran bingihanek dikare piştî cihnavê were. Weke mînak;

- a. *Yê ku xwedê nas nakin xwîn kirine dilî me.* (KD)  
Ê ku xwedê nas nakin xwîn kirin dilê me. (KB)
- b. *Yê ku kuştin cînarê me wû.* (KD)

<sup>107</sup> Di nava kurdên herêma Xorasanê de bêjeya “kele” li cihê “gund” tê bikaranîn, wek ku ji mêmariya kelehan diyar dibe, hemû keleh bi dîwarên bilind dihatin dorpêçkirin û deriyek yan çend deriyên mezin jî lê datanîn ji bo hatûçûya rêwiyan. Li Xorasanê bi deriyê kelehê ra dibêjin “Derwaze”.

Ê ku hate kuştin cîranê me bû. (KB)

Dane nîşan didin ku hevokên ku bi bingihaneka *ku* tê çêkirin di kurmanciya bakurî û kurmanciya Deregezê de bi heman awayî ne. Lê li rexê din forma tebatî ya hevokê heye ku pêwîst e bê berçavgirtin.

### 3.3.3. Forma tebatî (Passive)

Dema forma têper (transitive) ya lêkeran tê bikaranîn, bûyerek tê derbirîn ku girêdayî du tiştan an du kesan e. Rêya herî hêsan ji bo bikaranîna van lêkeran forma lebatî (active) ye. Bûyer an tiştê bûyî û kirî ji aliyê kara ve pêk hatiye ku li ser berkarê bandor daniye;

Herwisa hevok bi awayekî tebatî (passive) jî tê sazkirin, cureyeke taybet ji lêkerê dikare bê bikaranîn ji bo çêkirina forma tebatî. Di vê formê de bala bihîzer û muxateb tenê diçe ser kar û emela bûyî, yanî karê bûyî girîngtir ji vê yekê ye ku bihîzer bixwaze zanibe ku ev kar ji aliyê kê ve hatiye kirin.<sup>108</sup>

Di kurmanciya bakurî de bi rêya lêkera *hatin* û herwisa raderê (infinitive) ev cure dêsman tê avakirin.<sup>109</sup>

Lebatî (Active): Ez xwarinê çêdikim.

Tebatî (passive): Xwarin tê çêkirin

Forma tebatî di kurdiya Deregezê de weke kurdiya bakurî bi lêkera alîkar ya *hatinê* tê sazkirin lê bi giştî meyla hevokan ber bi sadebûnê ve diçe yanî meyla hevokan zêdetir li ser forma lebatî ye. Di axaftina rojane de formên tebatî gelekî kêmtên dîtin.

Di kurmanciya Deregezê de dêsmana tebatî li gorî deman bi vî rengî ye.

<sup>108</sup> Hayes, Bruce, **Introductory Linguistics**, University of California, Los Angeles, 2010. r. 236.

<sup>109</sup> Dorleijn, Margaret, **The decay of Ergativity in Kurmanji**, Tilburg University Press 1996, r.42.



Dêsmana tebatî di dema niha de

- a. *Ez tême dînê.* (KD)  
Ez têm dîtin. (KB)

Dêsmana tebatî di dema borî de

- a. *Le van çolana xwînê me hatiye rijandinê.* (KD)  
Li van çolan xwîna me hatiye rijandin. (KB)

Dêsmana tebatî di dema bê de

- a. *Gerek em bêwin kuştinê ku hûn fam kin em jî henî.* (KD)  
Divê em bên kuştin ku hûn fam bikin em jî hene. (KB)

Wek ku di mînakan de tê dîtin, forma tebatî di kurmanciya Deregezê de weke kurmanciya bakurî tê sazkirin û herwisa mirov dikare yeksaniya her du devokan bibîne.

Ji agahiyên derbarê kurmanciya Deregezê de ku bi mînakên herêmî hate ravekirin, tê dîtin tevî dûrbûna herêma Xorasanê ji deverên din ên kurdnişîn zimanê wê herêmê nehatiye asimîlekirin û gelek taybetiyên devoka kurmancî ya herêma Deregezê û devoka kurmancî ya bakurî yeksan in. Li aliyê din ev lêkolîn heta radeyekê dikare ferq û cudahiyên esasî di navbera du devokan de jî derxê pêşiya me û hêviya me ev e ku ev xebat ji bo lêkolînên berawirdî di navbera devokên kurmancî yê cihêreng de bibe çavkanî.

## ENCAM

Di vê xebatê de li gor çavkanî, agahî û mînakên ku li jorê hatin dayîn em gihiştin hin encamên serekî;

Wisa hate dîtin ku kurd li welatên Tirkiyê, Îran, Iraq, Sûriye, Qefqaziya û gelek welatên ewropî û hin welatên Sowiyeta berê dijîn ku li gorî dabeşbûna wan li ser gelek welatan herwisa zêderengiyek di diyalektên zimanê kurdî de jî pêk hatiye. Zimanê kurdî ji pênc diyalektên serekî pêk tê ku weke kurmançî, soranî, zazakî, goranî û kurdiya başûrî tên binavkirin.

Li rexê din her yek ji van diyalektan jî li ser çendîn devokan tên dabeşkirin. Herwisa kurmançî ji hêla hejmara axêverên xwe ve yek ji diyalektên serekî ya zimanê kurdî ye ku bi xwe li ser sê devokên serekî hatiye dabeşkirin. Kurmanciya rojavayî, kurmanciya navendî û kurmanciya rojhilatî devokên eslî yên diyalekta kurmançî tên hesabandin. Devoka kurmançî ya Xorasanê jî weke devoka kurmanciya rojavayî hatiye pênasekirin.

Li gor çavkaniyên ber destan ku huzûr û hebûna kurdan li Xorasanê destnîşan kirine, encamek wisa derdikeve pêş ku berî koça kurdan di serdema Sefewiyan de jî kurd li Xorasanê hebûne û piştî ku Sefewiyan desthilata Îranê girtine destê xwe ji bo parastina sinorê Xorasanê li hemberî hêrişa tirkmanan û uzbekan gelek ji eşîrên kurdan koçberî vê deverê hatine kirin ku bi derbasbûna salan re li wir cihê xwe girtine û jiyana xwe berdewam kirine.

Çîroka dirêj ya koça axêverên vê devokê, gelek tesîr li ser zimanê wan daniye. Guherînên zimanî, ferhengî, term û herwisa fonolojîkal li ser diyalekta kurmançî ya Deregezê çêbûye. Derbasbûna demê û dûrbûna ji deverên din yên kurdnişîn, dikare bi her awayî tesîrê li ser zimanî dayîne xuya ye ku vê yekê bandor li ser kurmanciya Deregezê daniye. Di vê lêkolînê de li gor mînak û daneyan diyar dibe ku guherînên berçav û berceste bi vî rengî ne:

- a. Guherîna dengdêra “î” û “e” di daçekan de. Pêşdaçekên “ji” û “li” hertim weke *le* û *je* tên dîtin û bihîstin.
- b. Wisa ku di kurdiya bakurî ya Hawarê de heye, qertafa çêkirina dema niha ku lêker pê saz dibin “**di**” ye lê di kurdiya herêma Deregezê de ew qertaf “**de**” ye.
- c. Di kurmanciya Deregezê de guherînên herî zêde di beşa dengnasyê (phonology) de pêk hatine.
- d. Îzafeya pirjimar di kurmanciya Deregezê de ne wek kurmanciya bakurî ye û bi qertafeke cudatir saz dibe. Di kurmanciya bakurî de “**ên**” û di kurmanciya Deregezê de “**êne**” ye.
- e. Îzafeya yekjimar bi sê formên çêdibe, ku forma çêbûna îzafeyê bi dengê “î” li Deregezê berbelav e.
- f. Kopulaya (lêker) pirjimar şexsê yekem “**inî**” ye. Ku di vê haletê de gelek çar cihnav jî di hevokê de nayê bikaranîn. Yanî di vê rewşê de kurmanciya Deregezê cihnavavêj (pro-drop) e.
- g. Di kurmanciya wê herêmê de zayend tevlihev bûye û di gelek cihan de bi giştî zayenda bêjeyan nahê famkirin. Tenê di rewşa bangnîşanê de zayend li gorî nêr û mêtiyê tevlihev nebûye û hertim bi rêzik û qaide tê dîtin.
- h. Li gor daneyan û mînakên herêmî, di kurmanciya Deregezê de dema bê ya lêkeran nîne û ev form bi hin bêjeyên alîkar bi awayekî semantîk tê avakirin.

Li aliyê din ji bo deşifrekirina çîrokan û dengên qeydkirî, alfabêya Bedirxanî kamil nîne û ji bo veguhestina hemû dangan pêwîstî bi alfabeyekê heye ku hemû dengên zimanê kurdîya kurmançî di nava xwe de bihewîne.

Herwisa hebûna ferhengeke kamil a kurdî-kurdî pêwîst e, ji ber firehngbûna devok û dîyalektên kurdî, girîngiya hebûna ferhengeke kamil xwe zêdetir nîşan dide.

Tevî ku hin guherînên giştî jî li ser sentaksa kurmanciya Deregezê çêbûne jî

dema mirov hûr û kûr bala xwe dide ser zimanê wê herêmê guherînên fonetîk zêdetir tîn berçavan. Meseleyeke din jî ku di herêma Deregezê de heye, tesîra zimanê farsî ye ku ji ber bi rojnebûna zimanê kurdî li wê derê, bêjeyên fermî bi awayekê giştî tevî zimanê kurdî bûne. Gelek bêjeyên ji bo teknîkê û teknoloîjîyê rasterast ji zimanê farsî hatine nava kurmanciya Deregezê. Meseleya guherînên fonetîk dikare bibe mijara tezeke din ka gelo di maweya 5 sedeyan de ji dîroka koçkirina kurdan ber bi Xorasanê ve çima guherîn zêde di beşa dengnasiyê de pêk hatiye?

Weke encam dikare bê gotin kurmanciya Deregezê ku parçeyek ji kurmanciya Xorasanê ye, kurmanciya bakurî ye û tevî hin guherînên ku bi sedemên curbicur di zimanê wê herêmê de pêk hatine hîn dêsman û taybetiyên kurmanciya bakurî di zimanê wê herêmê de parastî mane.

## ÇAVKANÎ

Ali Madih, Abbas, **The kurds of Khorasan**, Iran and the Caucasus Vol. 11, No. 1. 2007.

Aydogan, Mistefa, **Rêbera Rastinvîsînê**, Istanbul, Rûpel, 2012.

Bedirxan, Celadet Alî, **Elfabêya kurdî & Bingeha Gramera Kurmancî**, Nefel, Stockholm 2002.

Aronoff, Mark and Rees-Miller, Janie, **the Handbook of Linguistics**, Blackwell Publishers Oxford, 2003.

Bûlbûl, Mikail & Baran, Bahoz, **Rêzimana Kurmancî**, Weşanên Enstîtuya Kurdî ya Amedê, Istanbul 2008.

Bellew, Henry Walter, **From the Indus to the Tigris, A Narrative of a Journey Through the Countries of Balochistan, Afghanistan, Khorassan and Iran**, London, Trübner Co. 1872.

\_\_\_\_\_ **an Inquiry into the Ethnography of Afghanistan**. Prepared and presented to the Ninth International, Congress of Orientalists, London, Oriental University Institute. 1891.

Blake, Barry J. **Case, Second edition**, Cambridge, United Kingdom, 2004.

Botî, Kamêran, **Ferhenga Kamêran Kurdî-Kurdî**, Spîrêz, Duhok, 2006.

Bûlbûl, Mikail, **Peyvrêzî di Frazên Navdêrî de (Devoka Mêrdînê)**, The Journal of Mesopotamian Studies, C: 2/1, Zivistan 2017.

Baran, Bahoz, **Rêzimana kurmancî**, Belkî, Istanbul, 2012.

B. Fraser, James, **Journey into Khorassan**, London, 1821.

Celîl, Celîl & Şadkam, Gulê, **Sêxiştiyên Kurmancî Xorasan**, Enstîtûya kurdzaniyê, Wien 2012.

Demîrhan, Umîd, **Ferhenga destî**, Sewad, Istanbul, 2007.

Demirhanî, Umîd, **Taybetiyên kurmanciya Xoresanê** kovara Zend h. 20, 2013.

Dixon, Robert, **Ergativity**, Cambridge University Press, Cambridge, 1994.

Dorleijn, Margareet, **The decay of Ergativity in Kurmanji**, Tilburg

University Press 1996.

D. Îzolî **ferheng Kurdî-Tirkî, Türkçe-Kürtçe**, Weşanên deng, Çapa 7, Stenbol, 2013.

Ebdulfetah, Deham, **Cîna di zimanê kurdî de (kurmanciya jorîn)**, Enstîtûya kurdî ya Amedê, Istanbul, 2006.

Elewîferd, Yehya, **Şelpe û Sêv**, Emû Elewî, Qum, 2012.

Emîn Zekî Beg, Mohemed, **Kurtiyek ji Mêjûwa Kurd û Kurdistan Ji Destpêkirina Mêjûwê Tanî vê Rojê**, Wergêr: Dr. M. S. Cuma, Berlin, 1994.

Farqînî, Zana, **Ferhenga Kurdî-Tirkî**, Enstîtûya Kurdî ya Stenbolê, Çapa 4, Stenbol, 2013.

Fromkin, Victoria, Rodman, Robert, Hyams, Nina, **an Introduction to Language, Ninth Edition**, Wadsworth, Cengage Learning, 2011.

Garnik, Asatrian, “Prolegomena to the Study of the Kurds”, **Iran and the Caucasus**, 2009, 13.

Givon, T., **Syntax: a Functional Typological Introduction Vol 1, 2**, Philadelphia, Joun Benjamin Publishing company, Amsterdam 1984-1990.

Haig, Geoffery, **Alignment in Kurdish: A Diachronic Perspective**, Zu Kiel Unisversity 2004.

Haig, Geoffery & Opengin, Engin, **Kurmanji Kurdish in Turkey**, Harrassowitz, Wiesbaden 2015.

Haig, Geoffrey, Öpengin, Ergin, **Kurmanji Kurdish in Turkey: structure, varieties, and status**, Bulut, Christiane (ed.) Linguistic Minorities in Turkey and Turkic speaking minorities of the peripheries. Wiesbaden: Harrassowitz, Pre-publication draft, November 2015.

Haig, Geoffrey, **on the Interaction of Morphological and Syntactic Ergativity Lessons from Kurdish**, Research Centre for- Linguistic Typology, Australian National University, Australia, 1998.

Hayes, Bruce, **Introductory phonology**, Blackwell, West Sussex, 2009.

Hayes, Bruce, **Introductory Linguistics**, University of California, Los Angeles, 2010.

Hajiyân, Abdollah û Demîrhan, Umîd, **Gulbijêrek ji çand û wêjeya**

**Kurdên Xorasanê.** *Fritillaria Kurdica*, 2017. 16.

Haden, Suzette-Elgin, **What Is Linguistics?** PRENTICE-HALL, New Jersey, 1973.

Kurdo, Qenatê, **Rêzimana Kurdî (Kurmancî û Soranî)**, çapa yekem, Weşanxaneyê Nûbihar,?, 2013.

L. Chyet, Michael, **Ferhenga Kurmancî-İngilîzî**, Yale University, New Haven and London, 2003.

Lezgîn, Roşan, **Ji bo Kurmancan bi Awayê Muqayeseyî Gramera Kirdikî (Zazakî)**, Roşna, Stenbol 2013.

MacKenzie, D. N., **Kurdish dialect studies, Vol. II**, Oxford University Press, London 1962.

Malmîsanij, M., **Kürtçede Ses değışimi**, Vate, Stenbol 2013.

Muhammad, Husein, **Parvekirina devokên kurmancî**, <https://zimannas.wordpress.com/2015/07/06/parvekirina-devoken-kurmanci/diroka> Dîroka Têketinê: 10.7.2017.

Muhammad, Husein, Rengdêr di zimanê kurdî de, **Kanîzar**, kovara zimanê kurdî, hejmar 12, 2017.

Marcus, Kracht, **Introduction to Linguistics**, Department of Linguistics UCLA, Los Angeles 2004.

Mukriyanî, Gîwî, **Ferhenga Kurdistan kurdî-kurdî**, Enstîtuya kurdî ya Amedê, Amed, 2004.

Norde, Muriel and de Jonge, Bob, **Language Contact: New perspectives**, Cornelius Hasselblatt, Amsterdam, 2010.

Opengin, Ergin, **Pirsên Rênivîsa Kurmancî: pêdaçûnek rexneyî li ser rêbera rastnivîsînê ya Mistefa Aydogan**, Derwaze, Vol 1. Stenbol, 2017.

Oberling, Pierre, **Khorasan i. Ethnic Groups**, Encyclopedia Iranica, 2008.

[Http://Www.Iranicaonline.Org/Articles/Khorasan-1-Ethnic-Groups](http://www.Iranicaonline.Org/Articles/Khorasan-1-Ethnic-Groups) Dîroka Têketinê:12.07.2017

P. Hayes, Bruce. **Introductory Linguistics**, Department of Linguistics, University of California, Los Angeles 2010.

Rostemî, Feramerz, **Yêksed Sêxiştî-i Kurmancî**, Suxenguster, Meşhed,

1384.

Robins, R. H., **a Short History of Linguistics**, Longman, London, 1967.

Rizgar, Baran, **Kurdish-English English-Kurdish dictionary**, Onen, London 1993.

Rizgar, Baran. **Learn Kurdish. A multi-level course in Kurmanji**, Lithosphere, London 1996.

Roşan, Hesên, **Çîksay**, Meşhed, Neşr-i Şamlû, 2011

Sadallah, Salah, **English-Kurdish Dictionary**, Avesta, Stenbol, 2000.

Shirinov, Nofal, **Folklor a Kurdên Azerbaycanê**, (Têza Lîsansa Bilind a çapnebûyî), Mêrdîn, 2017.

Shujai, Behruz, **The Kurdish of Gilan**, (teza çapnebûyî), Uppsala University 2000.

Shekofteh, Afrasiab. **The Kurds in Khorasan, North-east of Iran**

<http://www.pen-kurd.org/englizi/varia/The-Kurds-in-Khorasan.pdf> Dîroka Têketinê, 12.07.2017

**?? Saussure's Third Course of Lectures on General Linguistics (1910-1911) publ.** Pergamon Press, 1993. Reproduced here are the first few and last few pages of what are notes taken by a student of Saussure's lectures.

<https://www.marxists.org/reference/subject/philosophy/works/fr/saussure.htm> Dîroka Têketinê: 29.7.2017.

Tanrikulu, Mehmet, **Ferhenga Tirkî-Kurdî**, Podium, Stockholm, 2000.

Taucher, Wolfgang, Vogl, Mathias Webinger, Peter, **The Kurds, History - Religion - Language – Politics**, Austria, Austrian Federal Ministry of the Interior, 2015.

Taş, Çetin, **Waneyên Rêziman û Rastnivîsa Kurmancî** Weşanxaneya Dîwan, Stenbol, 2013.

Tan, Sami, **Rêzimana Kurmancî**, çapa duyem, Enstîtûya Kurdî ya Stenbolê, Istanbul 2011.

Thackston, W. M., **Kurmanji Kurdish: A reference grammar with selected readings**, Unpublished, Harvard University Press, Massachusetts 2006.



Temo, Selim, **Gurbette bin yil: Horasan Kurtleri**, (pirtûka çapnebûyî)

Van Bruinessen, Martin, **Agha, Shaikh and State the Social and Political Structures of Kurdistan**, Zed Books Ltd, London and New Jersey, 1992.

Wahby, Taufiq & Edmonds, C. J., **A kurdish-Englisih Dictionary**, London, Oxford University Press, 1996.

Yıldırım, Kadri, **Kürtçe Dilbilgisi** Mardin Artuklu Üniversitesi Türkiye'de Yaşayan Diller Enstitüsü Yayınları, 2012.

Цукеман, И.И **Хорасанский Куранджи**, Морква, Академия НАУК СССР, 1986.

### Çavkaniyên farsî:

اصطخری، ابواسحق ابراهیم، **مسالك و ممالك** (ترجمة فارسى المسالك و الممالك از قرن 6/5 هجرى)، به كوشش ايرج افشار، ، بنگاه ترجمه و نشر كتاب، تهران 1347.

ابن حوقل، **صورة الارض**، ترجمة جعفر شعار، ، بنياد فرهنگ ايران، تهران 1345.

بدليسى، اميرشرف خان، **شرفنامه**، حواشى محمدعلى عونى، مصر، فرج الله ذكى الكردى.???

ژويس بلو، **دستور زبان كردى كرمانجى**، ترجمه على پاكسرشت، عمو علوى، قم 1393.

پاپلى يزدى، محمدحسين، **كوچ نشيني در شمال خراسان**، ترجمه اصغر كريمى، ، آستان قدس رضوى، مشهد 1371.

تقوى، محمد، **مقايسه نظام هاى حالت دهى گویش کرمانجى با فارسى معاصر** دانشگاه بيرجند (پايان نامه چاپ نشده) 2012.

توحدى، كلیم الله (کانيمال)، **جعفرقلی زنگلی ملک الشعراى کرمانج**، واسع، مشهد 1381.

توحدى، كلیم الله (کانيمال)، **حرکت تاريخی کرد به خراسان**، ده جلد، كوشش، مشهد 1364.

دالمانى، هانرى رنه، **سفرنامه از خراسان تا بختيارى**، ترجمه على محمد فرهوشى، مؤسسه مطبوعاتى اميركبير، تهران 1335.

ساپكس، سرپرسى، **سفرنامه ژنرال سرپرسى ساپكس يا ده هزار ميل در ايران**، ترجمه حسين سعادت نورى، كتابخانه ابن سينا، تهران 1336.

عضدى، احمد، **فرهنگ و لغت نامه کرمانجى**، انتشارات احمد عضدى، بجنورد، 2003.

هه ژار، **هه نيانه بورينه فرهنگ كردى فارسى**، سروش، تهران، 2009.

كلويخو، روى گنزالز **سفرنامه كلويخو**، ترجمه مسعود رجبنيا، بنگاه ترجمه و نشر كتاب، تهران 1344.

مک‌گرگر، کلنل سی،ام ، شرح سفری به ایالت خراسان و شمال غربی افغانستان در 1875،  
ترجمة اسدالله توکلی طبسی، ، معاونت فرهنگی آستان قدس رضوی، مشهد 1368.

وطن دوست، سارا، پوشاک و زیورآلات عشایر کرمانج خراسان، عمو علوی، قم 2015.

منشی، اسکندربیک، تاریخ عالم آرای عباسی، دو مجلد، گلچین، تهران 1350.

میرنیا، سید علی، ایلها و طایفه های عشایری خراسان، نسل دانش، تهران، 1369.

### Malper:

<https://www.mapsofworld.com/iran/iran-political-map.html>, Dîroka têtetinê:  
27.7.2017

[http://daregaz.khorasan.ir/modules/Show\\_Content.aspx?PrintId=1&ContentId=6003](http://daregaz.khorasan.ir/modules/Show_Content.aspx?PrintId=1&ContentId=6003) , Dîroka têtetinê: 27.7.2017

[http://www.newworldencyclopedia.org/entry/Ferdinand\\_de\\_Saussure](http://www.newworldencyclopedia.org/entry/Ferdinand_de_Saussure) Dîroka  
têtetinê: 29.7.2017.

Dîroka têtetinê: 20.7.2017

<http://ostandari.khorasan.ir/modules/ShowFrameWork.aspx?PrintId=1&RelFacilityId=156&ContentId=143778&STemplateId=1340>, Dîroka têtetinê: 27.7.2017

<https://www.mapsofworld.com/iran/iran-political-map.html> dîroka têtetinê:  
28.7.2017

## PÊVEK

Çîrok û ferhengok weke nimûne ji xebata meydanî ya herêma Deregezê hatine pêşkêşkirin, ev çîrok weke nimûneyekê ji folklorê herêma Deregezê ne û dikare bo kesên ku li ser folklorê dixebitin jî bibe mijarekê.

## ÇÎROK

Qerenoker<sup>110</sup>

Yêk hewû yêk tinewû, bê xêyre xweyê kes tinewû

Paşêkê<sup>111</sup> lawek xwe hewûye, lawek xwe hewûye hînga va qêzê wêzîr sa<sup>112</sup> lawî xwe yexwazi, tîne yeke dawet û viya vertêxini<sup>113</sup>, vîna we hev ra zindegî<sup>114</sup> yekin, rûyêk je rûyan va lawî paşê verdekevi ser qesrê<sup>115</sup> xwe, yewîni ku zerger le paş qesrê vîna daketine, zerger daketine, va le nav vî koçê zergeran<sup>116</sup> yefkiri, yewîni keçikek le nav vîna ye va aşiqi vî keçika yewi.

Aşiqi vî keçika yewi, va tê dayekevi je ser qêsir dayekevi je zimîn lal dewi je qulaxan<sup>117</sup> jî kerr, va xwe le nexweşiyê têxini, yeyê:

“zanim beyî mi viya sa mi naxwazi jî ez qe xwe lal kim feqe.”

Hînga va çend rozêkê we vî tora rayekevi, vîna bane doxtiran dekin, bane melan dekin tînine ser viya. Rûyêkê pîrikek tê yeyê:

“Va lawî we tikê<sup>118</sup> aşiq e, va karê doxtir moxtiran jî nini, gerê hûn ewê viya,

---

<sup>110</sup> Çîroka Qerenoker bi dengê Tavûsa Rehmanî (70 salî), gundê Rehmanqulî, bajarê Deregezê.

<sup>111</sup> Padişah

<sup>112</sup> Sewa/bo

<sup>113</sup> Derxistin/ yanê bûk ji mala bavê derxistin û birin mala zavê.

<sup>114</sup> jîyan

<sup>115</sup> Koşk/sera

<sup>116</sup> zêrker

<sup>117</sup> guh

<sup>118</sup> Wisa xuya ye ku

derdê viya dewa kin”,

Hînga yeyên:

- tu yeşe yekî<sup>119</sup> here jê verxin mîne aşiqi qêzê kê wûye em zaniwinî.

[Wê çaxê jî wê zemanê meselen dirav ku tinewûye keseki yexwestiye ku xidmetek sa kesekê bike, pîrikê gotiye ku beraweri mi qunde<sup>120</sup> bikşînin biyin (bidin) ez herim viya ew kim, zimanî viya biyeme vekirini.]

Vina yeyên:

Tila<sup>121</sup> yeyênî te, “tu vêca yeyê qunde”.

Vina tînin beraweri pîrikê qunde yeyênê û jeyê je vî qunda kulliyêk xwe çê yeke û le ser zenda xwe yeşiyîni û teşiya xwe hiltîni tere le cem lîwik rûyeni:

Lawo ca, belê te le mi kevi, qêzê her kes bixwazî sa te yexwazin lê tu jini te heye,

Va gep deke ye viya ra, je ser dilê viya vertêxini, va yeyê:

Lê ez zanim beyî mi wê sa mi naxwazi jî qe va ye ku je vî ewa vernekevim, je vî xaniya vernekevim û surrê xwe jî aşkar nekim,

Hînga yeyê: -“Ka bêj ka kî ye?”

Yeyê: - “koçek<sup>122</sup> zergeran le paş qesrî me daketiye, le nav wê keçikeki zêrger hewûye ez aşiqi wê wûme. Ez, ya gerê wî sa mi bixwazin ya jî ez gerê bimirim.

Hînga evelê paşa razî nawi, yeyê:

---

<sup>119</sup> Tu dikarî/ tu dişê

<sup>120</sup> pembû

<sup>121</sup> zêrr

<sup>122</sup> grûpek

-hêç yewi tişteker werê ku ez herim qêzê zêrger sa lawî xwe bixwazim? Dîsa jî pê ra yekine dawî, yeyên:

-tu yî û lawek te ye tenê. Dilî wî meşkên here jê ra bixwaz.

Siweynda<sup>123</sup> wezîr û wekîl huldestin<sup>124</sup> tene<sup>125</sup> mala zêrger, terin rûyenin le ba zêrger, zerger huldesti tere a le henda hana ewa xwe, desgêh<sup>126</sup> xwe datîni hengilûskê<sup>127</sup> xwe çê yeke, esbawê<sup>128</sup> xwe çê yeke, va essi<sup>129</sup> nê cem vîna, nê cem vîna hînga vîna huldestin terin yeyên paşa yeyên:

- eslen zerger nate cem me ku tewîl negirtinî<sup>130</sup> essi nate dora me.

Hînga va pîrika dîsa ye vîna ra yeyê:

-lê hûn ku wêzîr, tu yeşînî, ew le ku tê le ba wêzîr rûyeni, gerê tu herî kasiwekê<sup>131</sup> bişînî cem wî, meselen yêki mîna Îde Qeşmarê ya Fêzê<sup>132</sup> yêki werê bişînî ku here ye wî ra hemkelam biwi.

Mege ew tê le ba wêzîr û wêkîl rûyeni.

Hînga terin yêki mîna Fêzê tînin, yeyê:

-were here xwastigariyê<sup>133</sup> qêzê zêrger sa lawî mi ra.

Va tere rûyeni û je vir de û je wê ya gep dekin û çayêkê ye hev ra veyexwin û

---

<sup>123</sup> Sibeha din

<sup>124</sup> radîbin

<sup>125</sup> terin

<sup>126</sup> Mekîneya xwe

<sup>127</sup> gustîlk

<sup>128</sup> amûr

<sup>129</sup> Eslen/qet

<sup>130</sup> Bala xwe neda ser me

<sup>131</sup> Kesê ku li bazarê kar dike

<sup>132</sup> Navên du hesinkarên gundê me ne.

<sup>133</sup> xwazgînî

jeyê demê<sup>134</sup> yekşîni sa viya, va hengilûskê xwe çê yeke, yeyê:

-lê bexşe te wegeri<sup>135</sup>, qêzê, lawî paşê qêzê te hildegiri sa çi tu nayê, sa çi tu essi natî cem xwastigarê qêzê xwe?

Bê yeyê:

-kînga yêki mîna te hat ku min neyayê? Lê ew wezîr hatiwû ez le ku, herim le ba wêzîr rûnim? Ez ye wî ra hemkelam nawim.

Ê hînga va cewaba xwe hildegiri û jeyê verdekevi tere xoşal<sup>136</sup> dewi ye paşê ra yeyê:

-Mi cewab hilgirtiye, nika her kar dekin bikin.

Terin vî keçîka hiltînin, tînin û yewin exed<sup>137</sup> dekin û jeyê yeke dawet sa viya, çend şevârûyan yeke dawet, viya vertêxini tîni, lawik jî xoşal, sa xwe du jine xwe hene le ser mala xwe û zindegiya xwe xoşal in we hev ra.

Şevêkê paşa rayekevi, ye xewn dewîni ku ta heft salan paşati le henî<sup>138</sup> viya tune. Ê va huldesti jinê rayeke yeyê:

-Huli<sup>139</sup> jinik mi xewnek haka diye, ta heft salan paşati le henî mi tine. Huli qe we yawaşi<sup>140</sup> verkevinê je şêhr henî.<sup>141</sup>

Henî welat melatekê le wê heft salan yesekininê ta heft sal red dewin dîsa tînê ser paşatiya xwe.

Jinik yegirî yeyê:

---

<sup>134</sup> Dem: amûrek e ji bo bawêşinkirina agirî bi kar dihê, ji bo gurrkirina agirî.

<sup>135</sup> Best ji te vegere!; nifirek e.

<sup>136</sup> kêfxweş

<sup>137</sup> mehrkirin

<sup>138</sup> enî

<sup>139</sup> Hulist/ rabe/şiyar be

<sup>140</sup> hêdîka

<sup>141</sup> Em herin

- em verkevinî henê, em inî û lawek e viya jî we xwe ra newinî?

Yeyê:

-Karek werê, nême ye te ra, nakim karek werê.

Vana terin lîw<sup>142</sup> jî hiltînin lîw tînin we lîw ra yeyêjin ku:

-Were we me ra henî.

Lawik yeyê:

-Na, ez karek werê nakim, ez gerê jinê xwe jî hilînim. Ez gerê jinê xwe jî ye xwe ra hilînim.

Hînga va jinê xwe jî hiltîni vana tînin, terine yekevîne xezanê çar pênc xurcînan<sup>143</sup> tiji tela yekin tiji esbaw<sup>144</sup> yekin, her yêki hespekê û her çî yeşe yeke, je paşatî xwe û je wesayîlî<sup>145</sup> xwe hiltînin ku ta heft salan vana tişt kesrî<sup>146</sup> sa vîna newî ka meselen vana le wê zecir<sup>147</sup> bikîşînin, le welateki.

Vana terin vî rûya tayne<sup>148</sup> êvari, ye şev verdekevin terin, îşev terin rûya yin jî tayne êvari terin yegêne<sup>149</sup> êlangekê<sup>150</sup>, yegêne êlangekê, yewînin ku le vî êlanga le tabloyêkê nivîsîne ku “le vî êlanga diz hene, je xwe seresa<sup>151</sup> newî diz tîn qaret<sup>152</sup> dekin, kulli tiştî yêkê yewin”. Paşa yesekini kişîk<sup>153</sup> yeye.

Yeyê:

---

<sup>142</sup> law

<sup>143</sup> torbe

<sup>144</sup> malzeme

<sup>145</sup> kelûpel

<sup>146</sup> kêmasî

<sup>147</sup> zehmetî

<sup>148</sup> heta

<sup>149</sup> digihêjin

<sup>150</sup> Mêrgekê

<sup>151</sup> Li xwe miqate nebî

<sup>152</sup> talan

<sup>153</sup> Nobetê digire

-Hûn rakevin ez yese kinim kişik yeyim diz nêwin esbawê me newin.

Vina rayekevin hînga ew yewi, tê nîzikê siwê va jinê paşê yeyê:

-Lê huli tu ku mirî, tu nika were satê serî xwe dayîn, ez kişik yeyêm, tu rakev ez je şûnî te va yese kinim.

Va berefa<sup>154</sup> jî yese kini va yeyê:

-Paşa dîn wûye, diz le ku ne, raneketiye îşev mîşev pa sekiniye<sup>155</sup>.

Paşa ku rayekivi va jî je dû ya yegiri serî xwe datîni diz jî qe le vî deh deyqey ku viya serî xwe daniye diz jî tèn herçi yê vina heye rêş dekin<sup>156</sup> hiltînin terin, esbê vina yewin, diravî vina yewin, qizilî<sup>157</sup> vina yewin, kulli tiştê yewin qe vina yemên<sup>158</sup> û vina.

Vina wextekê siwe rwîn<sup>159</sup> deye paşa we xwe yehesê yeyê:

-Jinik te ku bêrdem dagirt<sup>160</sup> sa mi, lê te ku xani yêxistiye<sup>161</sup>.

Jinik yeyê:

- Ye xev ra çûm newû de je gîra mi verket<sup>162</sup>.

Vina yeyê:

- Me le wê ku lawik neterkand, nika huli lîwik jî biterkîninî henî. Ew cewan in her cûr hewi sa xwe karek pêyda yekin henî em we xwe.

---

<sup>154</sup> Nifirek e. berefbûyî yanê mirî. Va berefa yanê ev bêxêret.

<sup>155</sup> Şiyar sekiniye

<sup>156</sup> Berhev dikan

<sup>157</sup> zêr

<sup>158</sup> dimînin

<sup>159</sup> ronî

<sup>160</sup> parastin

<sup>161</sup> Te ku mala me xerab kiriye.

<sup>162</sup> Ji destê min derket



Dîsa du sê qeyeman<sup>163</sup> terin jinik yegîrî yeyê:

-Nika em inî û lawek e wî jî biterkînî le vira, pe lawî xwe hilîninî ba jinê wî bisekinin.

Vina destê xwe yeyine ser feka<sup>164</sup> lîwik je arê<sup>165</sup> her du jinan yekişînin lawî xwe.

Yeyê:

-gep meke, dizan wesayêlê me biriye, verkevinî henî.

Vina lawî xwe hiltînin û terin şehrek le vî nîzika hewûye tene vî şehra lê tiştî xwe tinin. Mêrik karê yeke paşa tere quranek xwe hildegiri tere derê xaniyan quranê yexwîni sa mirdê<sup>166</sup> xelkê lawik jî yewin le kelepzeyêkê<sup>167</sup> datînin, jinik jî teştek xwe hiltîni tere derî xaniyê xelkê kohnê<sup>168</sup> xelkê yeşo.

[Vina le vira biterkîn, je jinê vina ya xewer bêye]

Va jinana jî huldestin yewînin ku royê daye ser, ne paşa heye ne mêrê vina heye ne xwesiye kes tine. Çer kinî çer nekinî, vina ye hev ra meşweret meslehet dekin çer kinî? Qêzê wêzîr yeyê:

-tu zerger î, tu dinyadîde<sup>169</sup> yî, tu her kari bikî ez we dû te têm. Fikrek tu bikşîn.

Yeyê:

-were mala qazî şêhr pirs kinî, henî şehrek tiki<sup>170</sup> bêli yewi le vira, henî vî

---

<sup>163</sup> gav

<sup>164</sup> dev

<sup>165</sup> navber

<sup>166</sup> mirî

<sup>167</sup> Dûkanê ku kelepçeyab dipêjin

<sup>168</sup> cilûberg

<sup>169</sup> Bi tecrube

<sup>170</sup> Wisa xuya dike

şehra mala qazî<sup>171</sup> pirs kinî, henî mala qazî, qazî xantema<sup>172</sup> ne. Bêyênî ku me ye mêrî xwe va kiriye dawî herinî telaqê xwe hilgirinî, ew du sê rozêkê lengerê<sup>173</sup> me dayegiri ta wê çaxê fikrek xwe yekşîninî.

Ê vîna huldestin terin mala qazî pirs dekin terin, tene mala qazî yeyên:

-me we mêrî xwe va kiriye dawî, hatinî yexwazinî telaqê xwe hilgirinî.

Qazî jî xantema yewî, heyqet jî yeyê:

-vîna dudiyê we refş<sup>174</sup> in sa xwe dayegirim herduyan jî.

Du sê rozêkê lengerê vîna dayegiri le vîna izet<sup>175</sup> deke jeyê hînga rûyêkê vana yeyê:

-lê em ta çî wextî le vîra bisekininî, fikirekî xwe bikişîninî.

Ye ustikura qêzê wêzîr da ellayêk<sup>176</sup> hewûye tela wûye, viya vertêxinin yeyê: were ye qazî ra bêjinî ku:

-me pişîman kiriye tenî mala xwe.

Vana yeyêjin, yeyê:

-me pişîman kiriye em yexwazinî henî mala xwe. Vîna huldestin verdekevîne bazarê terin vî qizilî viya, pirika<sup>177</sup> yefiroşin, destek kohneyî mêran, şûrekê, kumekê hildegirin jeyê verdekevin tene derî şêhr le wê qêzê zêrger ye qêzê wêzîr yeyê:

-tu kohnê mêran le xwe ke.

---

<sup>171</sup> dadwer

<sup>172</sup> temakar

<sup>173</sup> Me xwedî bike

<sup>174</sup> xweşik

<sup>175</sup> hurmet

<sup>176</sup> Xiftî/gerdenî

<sup>177</sup> Tiştên gelekî biçûk û sivik weke kayê.

Qêzê wêzîr yeyê:

-na ez karek werê nika bikim. Tu geriyayî tu zanî, tu warid<sup>178</sup> î tu kohnê mêran le xwe ke, ez yewime jina te.

Ê va kohnên mêran le xwe yeke û jeyê jî verdekevin şûr jî yeke wer xwe tèn mala paşê pirs dekin, tene mala paşê, tene mala paşê yeyê:

-em jini mêrek inî hatinî vî şehri te karekê we me nîşan bêye em sergerm<sup>179</sup> biwinî le vira penahendê<sup>180</sup> te winî. Le vira kar kinî. Zeni merdek<sup>181</sup> inî. Xaniyeki we viya nîşan deye yeyê:

-jinê xwe biwe a le henda hana tike hewliya<sup>182</sup> hana ye xwe jî were nav nokerê<sup>183</sup> mi kar ke, Kar ke, hînga va tê le nav nokerê viya kar deke. Navî viya datînin “Qerenoker”

[Qerenoker, ka mîne reş wûye wê çaxê çi cûrî wûye ku Qerenoker bane viya yekin.

Dengê bavê min: (dereçêkê yeyênî)

Diya min:

-lê her çi hewûye ku nav werê datînin. Qerenoker banî yekin]

Hînga va le nav vina kar deke û êvari jî tê mal hesawê xwe<sup>184</sup> cem jinê xwe le vira vina yesekinin yeyên ka xweyê we me ra çi gotiye.

Rûyêki diz tèn le vî şehra diz verdekevin derî dûkanê xelkê ve yekin esbawî

---

<sup>178</sup> pispor

<sup>179</sup> Em xwe mijûl bikin

<sup>180</sup> penaber

<sup>181</sup> Jin û mêrek

<sup>182</sup> hewşe

<sup>183</sup> karker

<sup>184</sup> qaşo

xelkê yewin, esbawî xelkê yewin, tèn dûkandarana, cemaet tê yerijine derbarê<sup>185</sup> şah yeyê:

-xanî te bikevi dizan em heledad<sup>186</sup> kirinî, tèn her çî me heye rêş dekin hiltînin dewin, em gerê çî fikrê le halî me bêwi kişandini.

Vina va bane va nokerê xwe yeke yeyê:

-werin herin le bazarê bisekin lê va dizana fikirek lê bikşînin, tay çî wextê xelk bêwi biriji vira û pestayî<sup>187</sup> nale bikşîni herine reda va dizana.

Vina terin. Êvari ew yeyê, va nokerana ew yeyê:

-bira Qerenoker here, Qerenoker bixwirê<sup>188</sup> te ye bira Qerenoker here.

Va yeyê:

-bira Qerenoker here. Ew yî yên deyê bira Qerenoker here.

Kulli ji ustiyê xwe yekin, Qerenokerê feqêr yeşînin. Qerenokerê tere le bazarê yesekini ye penayî<sup>189</sup> siyekê wa yesekini yewîni diz hatin ketine dûkanekê, va je parra<sup>190</sup> ku ye şûr lêtêxini qe vî diza ye ortê ra yeke du şeqan<sup>191</sup>, yeke du şeqan, hînga siwe ku rwîn deye va yegiri her der

[Derwaze evelê hewûne, le şehran le kelan derwaze hewûne le derî şehra lêtêxistine]

her aliyêki dêrwêze va şeqêki je yê vî diza têya yeke yeyê: ba sa henek din we pend wi kes nêwi diziyê neke. Êvari le vî şehra le meselen etrafê vî şehra ew hewûne evelê perî hewûne, periyêk tê je vî, le ser vî laşa rûyeni ku je viya goşt je vî diza

---

<sup>185</sup> Qesr/sera

<sup>186</sup> talan

<sup>187</sup> Her/hertim

<sup>188</sup> Ezîz/xizm

<sup>189</sup> Li paş

<sup>190</sup> Ji pişt da

<sup>191</sup> Du nîv

bixwe, wextê ku huldesti here, seftok<sup>192</sup> je viya verdekevi, xizanê du sali ye hêlanekê wa dilqelaşti yewi. Jeynan yerijine derê xaniyê şah yeyên:

-xanê te ar biwi, keşka dizan em je viya bedtir bikiranê, yeyê nika va diza le vira nizanê çî tê le ser vî laşa rûyeni le axirê ku huldesti seftok jê verdekevi xizanê me kulli teva wûye. Xizanê du sali dil qelaşti yewi yemiri. Dîsa bane nokeran deke, ew yeyê:

-bira Qerenoker here,

ew yeyê:

-bira Qerenoker here.

Dîsa Qerenoker yeşînin. Qerenokerê bedbext tere yesekini yewîni ku ye nîzikê siwê ra tişteq hat le ser vî laşa rûnişt, le hulistiyana ku yexwazi hulisti xicawek<sup>193</sup> je viya verket va ye şûr lêtêxini je viya tişteq yekevi jeyê va huldesti tere asmîn tere.

Tere wexta tere va we nikilê şûr hiltîni yewîni ku şîlwarek<sup>194</sup> e je vî periya wa ketiye, vî şîlwara hiltîni tîni mal cem jinê xwe jeyê<sup>195</sup> jî tê deyxêkê yesekini û yegirîn we ser hev da yeyê:

-va çî bedbexti wû sa me çê wû

Jeyê hêç de va yesekini je viya wa ti xewer nawi, ti xewer nawi, rûyêki mudetek je vî ara tere rûyêki jinê paşê ye paşê ra yeyê ku:

-îrû yexwazim heme mala Qerenoker, ew nokerek te ye, nika navê wî haka verketiye yexwazim herim, heme<sup>196</sup> mala Qerenoker jinê wî biwînim.

Va yeyê:

---

<sup>192</sup> Deng/sewt

<sup>193</sup> deng

<sup>194</sup> Etek/ qomaş

<sup>195</sup> piştire

<sup>196</sup> herim

-neku haka verkevî herî, yeyê here berxekê bişîne mala Qerenoker ba şerjê ke jeyê birinc bişîn rûn bişîn kulli wesayîlan bişîn le wê ba sa te nîn çê kin, hînga verkev here we tenê mere. Bê hemaçîz mere.

Va oza mozani yeşîni jeyê jî serê pîşîni<sup>197</sup> va verdekevi tere va keçika jî qêza wêzîr e zani ku nîn mîn çerê çê ke, va nan manî xwe çê yeke û jeyê tê destpiyê xwe yeşo, vî şîlwara jî le xwe yeke yeyê:

-jinê paşê tê vira, vî şîlwara jî le xwe yeke yeyê ba neyê tişti vîna tine

[şîlwara je periyê keti, viya jî le xwe yeke].

Va tê derî hewliyê ve yeke vî şîlwara ku le jinê Qerenoker yewîni je derê hewliyê veyegeri, veyegeri va tere cem paşê yeyê:

-texti bextê te çepe yekim<sup>198</sup> ku jinê Qerenoker şîlwarek lê ye ku ayem aşiqê yewi ku lê bifkiri ta bigê ku le xwe ke yeyê, yê mi yê werê tine, ya şîlawê jinê Qerenoker, ya serî Qerenoker ya jî ku telaqê xwe je te hildegirim, yeyê gerê sa mi yêki werê hilgirî.

Va banê yeke yeyê:

-Qerenoker, yeyê je vî parçey ku te sa jinê xwe kiri şîlwar je wê tine ku sa jinê mi jî şîlwarekê bînî, viya nika le jinê te diye, lec kiriye<sup>199</sup>, yeyê “gerê yêki werê sa mi jî hilgirî.”

Va tere her çî le dûkanan degeri herçî tere orta şêhr virda wêya yegeri, le kû ye lê mege le vira ye ku hewi. Va tê ye jinê xwe va hawêkê<sup>200</sup> we ser hevda yegirîn, yeyê, jinik yeyê:

-were viya hilîn biwe pêyê.

---

<sup>197</sup> nîvro

<sup>198</sup> Xerab dikim

<sup>199</sup> Rik kiriye

<sup>200</sup> demekê

Yeyê:

-bimirim karek werê yekim, haka nokerana we mi ya ketine yeyên “Qerenoker bixwirê te ye, Qerenoker bira here sa her karê,

vêca bêjin Qerenoker şîlwara jinê xwe hanî da paşê, ez le qêretê xwe tînim karek werê bikim?

Ez eslen karek werê nakim, va yeyê çel ro muhlet<sup>201</sup> jê hildegirim, tu je xwe seresa<sup>202</sup> wi ez herim şehîr we şehîr bigerim gaşe<sup>203</sup> je vî parça henekê peyda kim bînim ege na lê serî mi yebiri“

Va tere çel ro muhlet je paşê hildegiri jeyê verdekevi tere şehîr we şehîr bigeri ku gaşe je vî parça heneki peyda ke.

Va tere meselen je vira tere yegê<sup>204</sup> derek mîna Qoçanê, Meşeyê<sup>205</sup> tere êvar wûye tere yegê vî şehîra tere malê pîrikekê pirs ew yeke yeyê:

-pîrê, îşev şûnê yeyê mi, bêwim le malê te penalemîş<sup>206</sup> wim ta siweynda huldestim terim? [va her ku ya jî tere yegeri peyda nake pêrçe]

Hînga va yeyê:

-ê lawo ca were, yeyê, giraniyê te ye zemînê ruxzê<sup>207</sup> te jî we xweyê, were, ez herçi bixwim tu jî le cem mi bixwe.

Va le vira îşev rayekevi le siwê je, êvari yanî, yeyê:

-pîrê av heye qulmek av we mi yî, ez vexwim?

---

<sup>201</sup> Wext/izn

<sup>202</sup> miqate

<sup>203</sup> belkî

<sup>204</sup> digêje

<sup>205</sup> Navên du bajarên Xorasanê ne

<sup>206</sup> penaber

<sup>207</sup> rizq

Pîrik tere, av tinewûye, ye camê wa mîz deke tîne yeye viya yeyê vexwe.  
Yeyê vexwe hînga va yeyê:

-pîrê sa çi va avê we şor e?

Yeyê: lawo ca, çi rûyê xwe reş kim, yeyê, av tine, yeyê le vira hejderhêk<sup>208</sup>  
heye, tê xwe daye pêşî avê me, yeyê heftê carê je pêşî avê tere,

ew jî we çi cûrê tere, hespekê devêkê, cwîtek gan, nizam çi, çi vana yewin,  
keçikekê jî yewin dewriyêk<sup>209</sup> birinc jî yeyine mistê yene ser espê hiltînin dewin.

Va hejderha tay tê vina kullan dexwe je pêşî avê xwe yeye yan<sup>210</sup>, yê ye fera,  
yê ye destipê<sup>211</sup> ku avê xwe hiltînin tay heftey yên avi xwe hene, yê mîna min î bê  
destipê û bê fera jî ku av nahesilîni<sup>212</sup>, av tinewû mi mîz kiriye haniye daye te lawo  
ca, çi rûyê xwe reş kim.

Va yeyê:

-kînganê wext e ku hejderha xwe je pêşî avê ye yan de?

Yeyê:

-qe siweynda ye. Siweynda ye, siweynda jî keçikê vî şehra kulli teva wûne,  
nowa qêzê paşê ye, qêzê paşê gerê biwin ku xwe je pêşî avê ye yan de xelk avê xwe  
hilîne.

Va yeyê:

-le siwê pe kêmekê zû mi rake ez jî hulistim herim ka biwînim ku ka ew kî ye,  
çi hejderha ye.

---

<sup>208</sup> Ejdermar/ marên mezin

<sup>209</sup> Tebsî

<sup>210</sup> Xwe dide aliyekê

<sup>211</sup> Yên jîr

<sup>212</sup> Têrê nake



Va le siwê viya rayeke û jeyê va huldesti va lawika

[va keçika, lê keçik e ye qolê me nika]

tere yewîni ku ê ba keçikek û dewriyêk birinc dane mistê û jeyê le ser hespekê danîne û cwîtek ga û devêk û, hılanîne vana biwin ku hejderha xwe je pêşî avê ye yan de, vana, cemaet avê xwe hilîni,

va tere ye vî keçika ra tere meselen je henda ha ku cemaet veyegeri va lawika ye vî keçika ra tere. Keçik yeyê:

-lê sa çi, cewan î tu têtî çi? Ez bedbext im şansê mi haka haniye, nika nowa min e gerê hejderha mi bixwe, tu têtî çi? Tu mêwi, tu mêwi.

Va yeyê:

-mege xwînî mi je yî te swîr e? Ez têm ba mi jî bixwe.

Va tere hesawê xwe ta hejderha xwe je pêşî avê yeye yan ku bêwi meselen wan bixwe û dêve bixwe,

va lawika şûr je wer xwe yekişîni tere ye şûr ku ye serî vî hejderha wa lêtêxini, va qîjîni we viya yekevi va verdekevi tere, va lawika jî ye dû yekevi, feqe<sup>213</sup> ye keçikê ra yeyê ku:

-birev here ye beyî xwe ra bêj avê je ser şêhr yan kin, av xerawiyê neke, ez terim dîsa têm.

Va ye dû vî periya yekevi tere yewîni ku va çû a wer hesaw ke le Pelexterê<sup>214</sup> wan deran kevrek hılanî kete bin vî kevra dîsa va kevra hanî pêşiyê.

Hanî pêşiyê va lawika jî tere nîşanêkê le vira datîni le wer vî kevra jeyê veyegeri tê.

---

<sup>213</sup> Tenê

<sup>214</sup> Navê cihekê ye li nêzî gundê Rehmanqulî li Deregezê

Veyegeri tê va fam deke ku va şîlwara je periyana ketiye, viya fam deke, va veyegeri tê wexta va keçika tê xewer deye bavê yeyê ku:

-lawikekê dande<sup>215</sup> hejderhê, hejderha kuşt, av tê şêhr xerawiyê yeke avê je ser şêhr ye yan de.

Ye vî keçika ra yekine dawî yeyên:

-mege xwînê te je yê xizanê xelkê swîr e tu, xizanê xelkê kulli çûn hejderhê xwarin, tu sa çî revî hafî.

Ye viya ra yekine dawî, va yeyê:

-bewo<sup>216</sup> ye xweyê<sup>217</sup>, lawikekê hejderha kuşt, yeyê ez hatim ege na ez çûm ku hejderha mi bixwe.

Ta wê çaxê va lawika tê yeyê:

-baca yeyê her cûr dekin mi bikin yeyê mi dandiye hejderhê, hejderha nika çûye fêlen<sup>218</sup> ku tine. Vîna ye viya ra jî yekine dawî, yeyên:

-nika ew qariya jî, vê kêşa<sup>219</sup> bêwi essi<sup>220</sup> em nafilitinî,

Yeyê:

-elan ku tine, ka nika hûn carê destpaçe<sup>221</sup> mewin.

Jeyê va keçika ku yeyê gerê hejderhê bixwarana nika gerê viya ye te yê nî. Tînin vî keçika le viya eqed dekin, le viya eqed dekin, jeyê va çend rozêki le vira yesekini, ye keçikê ra jî yeyêji ku:

---

<sup>215</sup> lêxist

<sup>216</sup> bavo

<sup>217</sup> Bi xwedê

<sup>218</sup> niha

<sup>219</sup> Vê cara

<sup>220</sup> Eslen/qet

<sup>221</sup> Ecele mekin

-resma me ye ta çel rûyî em em kar xwe ye jinê xwe nakinî, mesel nê nêzîk.  
Çel ro ku red wû hînganê tu jina min î ta wê çaxê tu xwenga min î.

Jeyê va çend rozêkê ku le vira yeseke ni va huldesti tere yeyê gaşe herim pêrçe  
peyda kim lê ez tay çî wextê le vira bisekinim.

Va huldesti tere vî kevra hiltîni nîşane ku danîwûne yekevi yewîni baxek e  
baxek e ye bin zemîne wa ku hûşê yêkê tere ku tikevî vî baxa, va tere le penêk xwe  
veyeşêri yewîni ku keçikek kitawek le wer e yexwîni, ye vî, yêk je der da kete orta vî  
baxa ningî xwe yekullê, yekullê yeyê va keçikê ku kitaw le wer e yeyê:

-xenca<sup>222</sup> sa çî tu yekullêyî tu têyî?

Yeyê:

-îşala le Qerenoker kim ku nenê wî daxê wî biwîni, yeyê ez deçûm le şehrekê  
laş maş hewûn mi ew yekir yexwar yeyê hat ye şûr dandê hem qewara mi şîlwara mi  
je mi ket hem jî ningê mi kire birîn.

Va hîn ye viya ra gep deke ku xwenga yên tê serî xwe girêyê, yeyê:

-xenca te sa çî serî xwe girêyê?

Yeyê:

-îşala Qerenoker nenê wî daxê wî biwîni yeyê Qerenoker dande mi serê mi  
kire birîn, ye şûr lêxist serê mi kire birîn.

Va keçika yeyê:

-hînga ez ku aşiqê Qerenoker im çî? Va yeyê, hînga va her du xwengana jî  
yeyên Qerenoker, yeyê:

-Qerenoker nika le vira we gîrê<sup>223</sup> we kevi hûn çer dekin?

---

<sup>222</sup> Kurtbûyiya xwengêcan e.

Yeyên:

-Qerenoker ye gîrê me kevi wer yexwinê ku çilkê<sup>224</sup> xwînê le zemînê nekevi, wî haka ezawî<sup>225</sup> yekinî.

Va yeyê:

- lê ez ku aşiqê Qerenoker im çi? Hînga vina yeyên:

-na tu aşiq wûyî aşiq newûyî, viya em zexmî<sup>226</sup> kirinî, em wî bernayinî.

Va le wer vina yegeri,

[evelê jî va dêviperiyana ye hêkelê pîlê rastê qesem dexwarine ku kar xwe meselen we karî vayî yên nekin]

va yeyê:

- ye hêkelê pîlê xwe yî rastê qesem<sup>227</sup> bixwin ez le vira Qerenoker verxinim.

Hînga va xwengana qesem dexwin va yeyê Qerenoker were wer dêri<sup>228</sup>, Qerenoker verdekevi tê yegîrî yeyê:

-baca yeyê, bibaxşînine mi yeyê mi ku dande te qewara te je te ket, şîlwara te je te ket, sa mi bûye bela.

Yeyê zanî çi bela hatiye serî mi ye bayîsi<sup>229</sup> wê şîlwarê?

---

<sup>223</sup> Têkeve destê we

<sup>224</sup> dilop

<sup>225</sup> Em wî biêşînin

<sup>226</sup> birîndar

<sup>227</sup> sond

<sup>228</sup> Xwe nîşan bide

<sup>229</sup> Ji bo/ bi wê sedemê

Jeyê vayî jî ku serê xwe girêyê, lê ez mecbûr im ye swîti<sup>230</sup> vî kara ye swîti vî şîlwara hatime; hali hekayetê mi we vî cûra.

Va le vira hawêki ye ser vîna wa yegirî jeyê hînga yeyê:

-nika je vî parça<sup>231</sup> gerê henekê ye mi yên. Ez gerê je viya biwim parçeni.

Jeyê va huldestin terin topek parçe tînin yene viya yeyên:

-va parçe ye her çi yewê biwe.

Ew parçe le cem me pir e.

Hînga va xwengê vana yê qiçik jî des je viya nake, va yeyê:

-ez aşiqê te me, gerê tu mi ye xwe ra biwê.

Va viya jî hiltîni pêrçe jî hiltîni tê. Tê le ba viya jî nayêji ku, ceryanî<sup>232</sup> xwe nayêji.

Yeyê:

-lê mêrek e. Va tèn tène mala vî paşaya ku qêzê paşê jî daye viya, tène wê je wê bar dekin, paşa çiçes esbaw û cil û desgah û tîni sa vîna ra bar deke, çend espan bar deke,

qêzê xwe jî ye çend nokeran va yeye viya yeyê:

- hilîn here ew ku gerê hejderhê bixwarana tu biwe ba we jina te wi. Viya hiltîni periyê jî hiltîni tèn. Vana tèn çend şevanerûyan vana ye rê tèn tay tèn yegêne vî şehri ku qêza wêzîr lê ye.

---

<sup>230</sup> Ji ber

<sup>231</sup> qumaş

<sup>232</sup> Serpêhatiya xwe

Tên va topê pêrçe hiltîni yewe<sup>233</sup> mala paşê yeye<sup>234</sup> paşê ku sa jinê xwe tike şîlwar, jeyê va her du keçikana jî tîni mala qêzê wêzîr jeyê tê vina herdu le xaniyêkê rayekevin, va herdiyê evelê ku hesaw bûne jinimêrê hev, le xaniyêkê rayekevin.

Vana êvari hawêki ye ser hev da yegîrîn yeyê:

-çi şansi min î pest<sup>235</sup> heye ku nika ez vana çer kim. Ez nika lê ye vina ra bêjim ez jinek im lê surrê mi faş dewi lê neyêjim ez nika vana çer kim.

Vina tay virda wêya yekin, heft sal jî durist dewin, heft sal jî durist dewin, va yeyê:

- ka ez îrû verkevim ka le vî mêrî xwe yî berefbûyî<sup>236</sup> bigerinî ka le vî şehra tine wexekê.

Va huldesti tere bazarê virda wêya yegeri yewîni ku xwesiya viya je wê ya teştek le ser tepê<sup>237</sup> ye je hewliyek verket. Va yeyê:

-xelê<sup>238</sup> tu çi yekê?

Yeyê:

-kohnan<sup>239</sup> deşom lawo ca, kohnê xelkê yeşom.

Yeyê:

-siweynda mala Qerenoker pirs ke were kohnê jinê mi bişo.

Va yeyê:

---

<sup>233</sup> dibe

<sup>234</sup> dide

<sup>235</sup> nizm

<sup>236</sup> Nifirek e/ berefbûn yanê ji nav çûn

<sup>237</sup> ser

<sup>238</sup> xaltî

<sup>239</sup> cil

-rind e keşka lê kohnê jinê te bêwim bişom.

Navî viya jî wer verketiye ku kulli zanin Qerenoker kî ye.

Va je wî red dewi yewîni ku paşa rûniştiye le derî hewliyêkê quranê yexwîni,  
va yeyê:

-apo le vira çi yekî?

Yeyê:

-quranê yexwînim sa mirdê<sup>240</sup> xelkê.

Yeyê:

-siweynda mala Qerenoker pirs ke were sa mirdê me sûrêk quran bixwîn.

Va jî yeyê:

-rind e.

Va je wî red dewi yewîni ku tere derî kelepziyêkê yewîni ku mêr jî le  
kelepziyê ye, tiji dwînişk<sup>241</sup> wûye, tiji çermî<sup>242</sup> wûye, le vî kelepziya ye, va ye vî  
reîsî kelepziyê ra meselen deyêji:

-ku siweynda kelêki temîz çê ke pêye<sup>243</sup> va nokerê xwe bişîne derê mala  
Qerenoker.

Hînga va ew yeke, yeyê:

-pêye vî nokerê xwe.

Yeyê:

---

<sup>240</sup> mirî

<sup>241</sup> rûn

<sup>242</sup> Rûn û don/ pîs bûye.

<sup>243</sup> bide

-sa çi je va nokerê temîz yêki neyême ku pêyême viya, va tiji dwînişka çi ye ku pêyême viya bişînim!

Yeyê:

-pêye wî bişîn. Eger pêyê yêke yên serî te yebirim. Pêye wî bişîn, ew lazimê min e.

Va yeyê:

-rind e.

Siweynda kelêk çê yeke le siwê je zû ya, temîz viya çê yeke jeyê serpûşekê<sup>244</sup> jî we rûyî viya ra yekşîni, viya yeye ser tepî viya yeyê:

-biwe mala Qerenoker pirs ke buwe mala Qerenoker.

Va tere mala Qerenoker pirs deke va jî tê ye qêzê ra yeyê:

-ku mi hersê jî îrû peyda kirin le vî şehra, hem paşa hem jina paşê hem jî mêrê xwe me peyda kir. Yeyê:

-siweynda le siwê kelêki le kelepzeyê kelêki tîni yeyê wextê ka hanî ez yeyê biwe xêni, wextê ku hanî xêni tu huli bifirê gaşe aşkar kinî la tay çi wextê haka sergerdan<sup>245</sup> winî bisekininî.

Va huldesti tîni yeke, yeyê:

-biwe xêni.

Va yeyê tîni xêni va keçika huldesti apişmîşi viya yewi yefiri viya<sup>246</sup>, yefir viya yeyê:

---

<sup>244</sup> qapaxekê

<sup>245</sup> Li bendê

<sup>246</sup> Pê ra şer dike



-weyîn le vê henda dayîn kwîr î mege.

Dayeye viya, viya qiyî yeke û apîşmîşi viya yewi, va herca destpiyê viya yelerzin va yeyê:

-aqay Qerenoker lê jinê te çi xicaletan<sup>247</sup> yeye mi, yeyê:

-xaniketi ew jina mi nini ew jina te ye.

Va yeyê dîsa yeyê:

-lê bifkir aqay Qerenoker jinê te çi xicaletan yeye mi.

Ta dusê caran ye viya ra yeyêji hînga va ewa xwe hiltîni, kumê xwe hiltîni porê viya ye ser da berdeye porê xwe yeyê:

-xani ye ser te wa bikevi, te va kar wû te hanî serê me. Ez qêza zêrger im ew jî qêza wêzîr e. Te sa çi le me haka kir, te em bedbext kirinî nika heft sal in te em sergerdan kirinî, ye vî şehra wa te bedbext kirinî.

Va kohnê xwe têxini yeye viya yeyê:

-birev, mere kelepeziyê jî, birev here hemamê kohnê xwe bêxin xwe bişo temîz va kohnana jî le xwe ke verkev were. Ye kesi ra meyêj tu gepan here tikeve hemamê xwe bişo were.

Va verdekevi yerevi ku ye ortê xiyabanê wa tere dê bervê yewi yeyê:

-nenê<sup>248</sup> Qerenoker jina min e ne.

Va yeyê:

-xef ke canemerg vî gepa meyêj, nika yê te ye ku me je vî şehra jî verxinin.

---

<sup>247</sup> şerm

<sup>248</sup> dayê

Yeyê:

-na ye quranê Qerenoker jina min e.

Va je viya red dewi berve bavê yewi yeyê:

-bewo terî ku?

Yeyê:

-teme mala Qerenoker.

Yeyê:

-Qerenoker jina min e ne.

Va yeyê:

-xef ke canemerg vî gepa meyêj, sa çi vî gepa yeyêjî

Yeyê:

-na lê Qerenoker jina min e, a va kohne ne dane mi gotiye here hemamê.

Jeyê terin vina kulli terin le vira ku berefî ser hev dewin hînga yeyê:

-lê ye paşê ra yeyê lê xanî te bikevi te sa çi le me haka kir, te em bedbext kirinî, va kar wû te hanî serê me!

Hînga ta wê çaxê heft sal jî ku lê durist wûne lê vina verdekevin tîn kull le vira yegêne hev, hînga Qerenoker tere ye vina herdu keçikana ra, ye periyê ra jî ye qêzê paşê ra jî yeyê:

-êyni heyxet<sup>249</sup> ez jinek im ez mêrek ninim,

---

<sup>249</sup> heqîqet

Yeyê:

- mêmê me kesek hin e.

Va her çî ku mi gep kiriye sa te, va sa va herdu keçikana gep deke yeyê:

-nikana jî yese kinî gerê mêmê me hilgirî, hilgirin hûn jî le cem me bisekinin eger nasekin jî we yewim, te yeyême cem beyî te, te jî yewim le şûna te datînim veyegerim têm.

Vina herdu jî yeyên:

-na meger em je we zêye ku nininî, em herdu jî mêmê te hildegirinî le cem we zindegî yekinî.

Vina jeyê jî huldestin mali doletê xwe bar dekin, lê çend salan Qerenoker le vira nav verketiye, esbaw hilgirtiye, mal çê kiriye, vina terin çar pênc hespan yekirin tînin wesayêlê xwe le hespan bar dekin, paşê jî hiltînin jinê jî hiltînin mêmê xwe jî hiltînin veyegerin tên ku hîn jî le ser paşatiyê yekine dawî. Ew yeyê ez yewime paşa va yeyê ez yewime paşa, hîn kes nebûye paşa, hîn jî le ser paşatiyê yekine dawî, paşa tê le ser têxt rûyeni dîsa yewi paşayê evelê hînga tînin heft şevârûyan sa mêmê xwe yekine dawet, va herdu keçikana jî vertêxinin tînin, ew le wê tene ser zindegiya xwe ez jî hatim gîştîme qulixa<sup>250</sup> te.

---

<sup>250</sup> xizmet

## FERHENGOK

Di vê beşê de hin bêjeyan ku li herêma Deregezê hene, li vir hatine amadekirin. Ferhengokeke bêjeyên taybet ku li herêma Deregezê berbelaw in. Di vê lîstê da bêjeyên ku heta radeyekê di kurdiya bakurde nayên dîtîn yan jî ew bêje bi wateyêke din li Deregezê berbilav in, tên destnîşankirin. Gelek ji van bêjeyan di zimanê farsî yan tirkiya herêma Xorasanê de jî xuya nakin, yan eger jî ew bêje di eslê xwe de ji zimanekî din hatibin deynkirin, ji ber guherînên fonetîk û guherîna wateya wan êdî bi hêsanî nayê famkirin ka gelo ev bêje bi eslê xwe ji kîjan zimanî hatine girtin.<sup>251</sup>

<b>Kurmanciya deregezê</b>	<b>Wateya û şirvoveya bêjeyan li gor kurdiya bakurî</b>
Aciz	Zirav, ne stûr, ne qalind, zeîf, nazik, tenik.
Acizbûn	Ziravbûn, nazikbûn, tenikbûn.
Amixte	Amuxte, li kesek yan tiştek adet kirin. Eslê wê farsî ye. Ji hînbûnê hatiye, farsî: amûxten
Anix	Giyadermanek e ku li çiyên şîn dibe, kekîk

<sup>251</sup> D. Îzolî **ferheng Kurdî-Tirkî, Türkçe-Kürtçe**, Weşanên deng, Çapa 7, Stenbol, 2013  
 Zana Farqînî, **Ferhenga Kurdî-Tirkî**, Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê, Çapa 4, Stenbol, 2013  
 Mehmet Tanrikulu, **Ferhenga Tirkî-Kurdî**, Podium, Stockholm, 2000  
 Gîwî Mukriyanî, **Ferhenga Kurdistan kurdî-kurdî**, Enstîtuya Kurdî ya Amedê, Amed, 2004  
 Kamêran Botî, **Ferhenga Kamêran kurdî-kurdî**, Spîrêz, Duhok, 2006  
 احمد عضدى، **فرهنگ و لغت نامه کرمانجی**، انتشارات احمد عضدى، بجنورد، 2003  
 هه ژار، هه نېانه بورينه فرهنگ کردی-فارسی، سروش، تهران، 2009  
 Michael, L. Chyet, **Ferhenga Kurmancî-Inglîzî**, Yale University, New Haven and London, 2003.  
 Salah Sadallah, **English-Kurdish Dictionary**, Avesta, Stenbol, 2000.  
 Umîd, Demîrhan, **Ferhenga destî**, Istanbul, Sewad, 2007.  
 Taufiq Wahby & C. J. Edmonds, **A kurdish-Englîsh Dictionary**, London, Oxford University Press, 1996.

Anixê kîviyan	Cûreyeke giyayê çiyayî ye ku wekî anixê ye. Cureyek kekîk e.
Ar	Are, nav, di nav de.
Aramkîne	Bi aramî, hêdî hêdî.
Arbirûsk	Agirê birûskê.
Arav	Navbera du tiştan. Sinorê du tiştên dijber. Weke aravê bihişt û cehenemê
Ardane	Golikên ku ji şîr hatine kirin, êdî şîr naxwin
Azirandin	Eziyetkirin
Alistin	Bi zimanê xwe tiştekan ...
Aşne	Dost, heval
Atile	Cudakirin
Avrêj	Cihê ku ava baranê têda dihrrike û digihêje newalan
Avrû	Şeref, namûs
Avreşîn	Av pijiqandin.
Awandin	Xistina tiştekan bi zorê di nava tiştekan din da
Awirdan	Mirûzdan, rûyê xwe tirs û tal kirin
Axir	Axur, axûr, tewle.
Axirbarî	Zarokê herî dawîn di malbata da

Axirpişt	Zarokê herî dawîn di malbata da
Baxtere	Sebze û xiyar û bacan
Barrijîn	Dengê berxan li pey mîhê
Bizdandin	Qetandin
Barî, bayî	Kaseyeke mezin
Best	Zinar û lat
Bûsat	Mal, jiyan
Bezandin	Revandin
Bîxî	Hertim
Bêdad	Stem, zilm
Bêderî	Mist, kefê destan
Bîne	Çadir, kon
Bînedar	Koçer
Bêar	Bêxêret, bêşeref
Bîsû	Qumaşê ku dişewtînin û ariya wê li ser birînan datînin
Bîngav	Serêvar, dema nû dinya tarî dibe
Bîtin	Elekkirina ardê
Bîçin	Dirûn, genim dirûn

Bêcekirin	Dabeşkirin
Berk	Xurt
Bernexûn	Serûbin, bereks
Bervexwe	Xwexwaz, kesên ku hemû tiştî tenê ji bo xwe dixwazin
Berfindîl	Cihê ku berf ji bo havînê lê tê berhevkirin,
Bexşî	Dengbêj, hozan
Berik	Tû, mêweya dara tûyê
Birake	Destebira
Bertavikîn	Nexweşiya ji ber tîna tîrêjên rojê
Beca	Teqrîben, kêmezêde
Bejî	Wehşî, kedî nbûyî
Bangî	Girîna bi dengê bilind li pey miriyan
Barşeng	Barxwar, dema ku bar xwar dibe. Dema tişteke xwar dibe û hevsengiya wê li hev dikeve, dibêjin filan tişt şeng bûye
Bicûlî	Goreyên rîs
Bûkil	Pêlîstokeke biçûk ku di şîna keçikên nezewicî da çêdikin
Birajin	Jina birayê mirov
Bariş	Baran

Canik	Keçikên nûbalixbûyî
Cihaz	Kurtanê devan
Cixir	Rêrew, dema berf dibare kesek tê ciqirê vedike, rê vedike. Bi wê rêya ku di nava berfê da vedibe dibêjin cixir.
Cûle	Petêxên negihîştî
Cûm	Yekîneya hejmartina benîştan, cûmeke benîştê
Cixrix	Mekîneya pembû paqijkirinê
Cemente	Heywanên wehşî, canewerên wehşî
Cire	Nebalix, negihîştî, ji bo nûçiwanan tê bikaranîn.
Cirecewan	Lawikên nûbalixbûyî
Cizik	Dûyê pêz yê helandî
Canemerg	Ciwanemerg, kesê ku di ciwantiya xwe di dimire
Çal	Bîr, cihê av lê kom dibe. Sarincên avê yên di binê erdê de.
Çispan	Çalak, lezgîn
Çelqandin	Lerzandin, livandin
Çim	Sim, mînak: çimê mangê
Çîg	Negihîştî, garis yan genimê xav.



Çîk	Stêrk
Çevir	Tijîenerjî, bi zor û qawet
Çêllik	Hêllik, pêlîstoka ku zarok bi werîsê ji xwe ra çêdikin
Çepe	Bereks, bernexûn
Çinîçinî	Parçeparçe
Çilpeçilp	Dengê dilopkirina avê
Çûrik	Çîrok
Çing	Nikil, devê balindeyan
Çizirîn	Av yan tiştêkê avek ku hêdî hêdî diherike
Çirrî	Deng, hawar
Çepel	Pîs, qefçil
Çox	Kiras
Çal	Bîr, cihê ku têda av heye
Çirtime	Derbeya aram bi tiliyan
Çirpî	Şaxeyên nazik yên ter ku ji darê tèn jêkirin
Çirtandin	Xwarina dendikan
Çirtan	Toraq û mastê ku li ber royê tê hişkkirin
Çirbûn	Telefbûn, emrê me çir bû: emrê me bi betalî derbas bû

Çaxûn	Bayê sar, sir û seqem û serma
Çarço	Tabût
Çarix	Solên ku ji rîs tîn hûnandin
Çatû	Werîsê ku dewaran pê girê didin
Çor	Nexweşî, derd
Demam	Quntarê çiyar
Dîtmam	Dotmam
Dême	Zemînên yan erdên ku bi ava baranê tîn avdan
Dêze	Qirax
Dêgan	Qesas bi dêgana xwe kirin: bi ya dilê xwe kirin
Dêgana xwe lêkirin	Telafîkirin
Dehîm	Deh rojên ewilê dema ku dayîk zarokên xwe dihînin diniyayê
Destbol	Kesê ku pere zêde xerc dike,
Derrizîn	Şkestin
Delengaz	Daliqandî
Delalet	Şîret, pend û nesîhet
Dermend	Nexweş

Derdê karî	Nexweşiya kujer
Dubextî	Pêncîpêncî, yan dibe yan nabe
Duqurne	Dupişte, duderbe
Dûxhefsar	Hefsarê serê mehînan
Dedê	Sernavek e ji bo bangkirina dayîk yan xwenga mezin
Dûlax	Toz û xwelî
Dûle	Dengê guran
Dumake	Berxê ku ji du mîhan şîr dixwe
Dwîn	Dûvê pêz, rûn
Duşeng	Xwar û nehemseng
Dutar	Tembûra xorasanî
Durne	Navê balindeyekê ye/ navekê jinane
Derçe	Deriyên biçûk
Duhal	Hamile/ducan
Day	Dîwarên ku ji xweliyê çêdibin
Dirav	Pere,
Diremezorî	Bi darê zorê
Dahatin	Tiştê li kesekê hatin, mînak: dema kesek cilekê li xwe dikin, û ev cil xweş li bedena wî/wê bê, dibêjin lê

	dahatiye.
Deştvan	Kesê ku karê parastina zeviyan dike.
Dankirin	Xalîkirina dew ji meşkê
Dan	Gav, dem
Damarû	Jina bavê mirov/damarî
Dalwar	Zêdekirina darên tirî li ser çend darên din û çêkirina sîwanê
Daf	Dafik,
Daqultandin	Xwarin
Dagerandin	Vegerandina ji bilindiyê
Dageriyan	Vegeriyana ji çiyê
Dirîv	Nîşan, dax, şewat
Dara	Zengîn
Dagirtin	Ragirtin, hilgirtin, hêlan
Dakişiyar	Ji ya xwe hatin xwarê
Divîdar	Darek wekî spîndarê ye.
Daçiyar	Dazelîn, dawerivîn
Dwîtin	Dotin/didoşe/bidoşe, doşîn
Dwîz	Dûz,rast

Ewrawî	Ewrên ku bi xwe ra baranê dihînin
Emelî	Pêketî, mubtela
Eydî	Xelata roja newrozê
Engilûsk	Gustîlk
Engez	Çen, parçeya jêrîn ya devê mirov
Ender	Zarokên ji du bavan yan ji du dayîkan, ne nêz,
Elêlo	Bangnîşana nêr
Emen-demen	25 rojan berî newrozê rojeye taybet heye ku dibêjin emen-demen
Elêlê	Bangnîşana mê
Elexoş	Tehdîd
Elefcûş	Dema destpêka biharê ku giya nû şîn dibin
Evelkişt	Nixurî
Evelbarî	Nixurî
Erman	Hêvî
Erwet	Rezîl
Êgin	Xurt, bihêz
Fal	Cotbûna hesp yan keran
Firk	Piştêş,

Fek	Dev
Falik	hêkê ku ji bo mirîşkan datîn ku ew hêkên xwe yên din li wir bikin
Feroş	Zûgihîştî, mînak; filan tişt feroş e, yanî ji dema xwe zûtir çêbûye
Fîtikîn	bi devê xwe deng derxistin
Firêwan	Zêde, dibe ku ji feravana farsî hatibe girtin
Firo	Şîrê nû, dema ku heywan nû dizên
Fit	Kesê ku zimanê wî/wê baş nager û nikare bêjeyan baş bilêv bike
fîrîtin	Firotin/difroşe/bifiroşe, firoştin.
gulpepûk	Giyadermaneke ku li çiyayê şîn dibe, bîhneke xwe yê pîr xweş heye.
Guşare	Guhar/ gûşvareya farsî
Gaşe	Belkî, eger bibe
Gîr	Zeft, zeftkirin, asê/gîrkerdena farsî
Gep	Peyv, gotin, bêje
Gepkirin	Axivîn
Guzeran	Jiyan, ji guzeştên a farsî ku bi wateya derbasbûnê ye
Gurdekirin	Wêrîn,

girê/girûşk	Bend, girê
Gurling	Civat, berhevbûn
Gurrijîn	Dengê bilind derxistin
Guçik	Guh
Guhdagirtin	Guhdarîkirin
Gamergî	Nexweşiya ku ga pê dimirin
haka	Weha, wesa, wanî, bi vî awayî.
hêrijandin	Westandin.
Hingiftin	Dîtin
Hiltekandin	Ji hev cuda kirin, livandin
Halîbûn	Bihîstin/ famkirin
Hişkesalî	Sala bê berf û baran
Herrok	Kesê ku hertim dikene
Hîlî	Awêne/neynik
Hêt	Ran
Hêvalek	Gêzî
Hînga	Piştire
Hewale	Jor

Hêzkirin	Cudakirin
Heylo	Awaz
Heledad	Talan, wêran
Hemzik	Cêwî, cot
Hênijîn	Dema ku kesek dixwaze rakeve, çavê xwe vedike û digire/ xew û şiyarî
Hela	Hîn jî
hawêk	Demekê/ gavekê
Haj	Gêj û mat
hekem	Hereket/bizav
hegerdî	Beredayî/ mirovên bê cih û mekan/ mirovên bê armanc
haka/hakana	Wisa
heşametkişandin	Alîgirîkirin
hesend	Hêsan
Haş	Aram, bêdeng
hulistiyan	Rabûn
heşawkirin	Bibakirina genimî,
Hûj	Wehşî
Lîp	Tijî, dagirtî



lêmişt	Tiştên ku ji lehiyê bi cih dimînin
Lêlo	Bangnîşana nêr
Lêlê	Bangnîşana mê
Lat	Destvala, destxalî
Lemeç	Pîs, qefçil, nepaqij
Leqem	Xeber, sxêf, xeberên pîs
Lemş	Sist, bê hereket
Letay	Sxêf, xeberên pîs
Lafok	Derwîn, fêlbaz
Lorik	Zarok, bebek
jîr	Bîna, kesê ku dibîne. Filan kes kor nîne, bîna ye
Jûnî	Çok
jeniyar	Dubare,, ji nû ve
Jendin	Vekirina heriyê pêz
Jeyê	Piştire
jîr	Jîr, jêhatî, zîrek
keweg	Riziyayî û pûç û vala
Kêş	Car

Kêz	Kêzik
Kurrik	Gore, cûrap
kuncandin	Dewsandin, pelixandin
Kok	Kêfxweş û serhal, filan kes kok e; yanî gelekî kêfxweş e.
kemişîn	Kemînkirin
Kînga	Kengî, çi wextê
kelegî	Gundî
Keşka	Xwezî
Kol	Heywanê bê şax yan şaxsikestî
kelepa	Berjêr
Kûtî	Pîs
kelexo	Xwêdana sar ku ji ber nexweşiyên weke tansyonê û şekerê çêdibe
Kûniş	Pîs, kesê bedkar
keçilok	Giyayek e ku ji şîreya wê benîştan çêdikin
korkork	Balindeyeke weke bazê ye, dema hewa tarî dibe ew difire
Kesûg	Darê dirêj ku pê agirê tendûrê li hev dixin
Kût	Berhevbûn, kûtîkirin; berhevîkirin

Kokel	Pêçandî
Kundî	Kûzên mezin ku ji bo parastina genim û cê bi kar dihên
Koşik	Kunê bêvil
Kuşnî	Goleş, werzişeke kevn ya îranê ye
kunkunîşk	Qulqul
Kort	Çal, bîr
Kuttek	Stûn
Kotel	Berjor, rêya berjor
Kişte	Qêysiyên ku li ber tavê hatine hişkkirin
Kam	Parçeyek ji devê mirov yan heywanan e.
kizirîn	Şewitîn
Karî	Kêrhatî
Kirdar	Reftar, tevger
kirkaw	Navê darekê ye
karsaz	Kesê ku kêşeyan çareser dike
Kele	Gund
Kalîn	Dengê berxê, dema ku bangê diya xwe dike
Kal	Petêx

Kal	Rêya ku av ji xwe ra vedike
Kar	Rêrewek di navbera du çiyayan da
Kaçî	Navê xwarinekê ye ku bi ardê gênim çêdikin
kemer	Çiya
kwîr	Kor, kûr, bêçav, nebîna.
meyandin	Ji şîr mast çêkirin
Mel	Gav, sat, kêlî; mela biharê: wextê biharê
Meyn	Mêjî
Meym	Darên tirî
meykan	Çêlikê mirîşkan yên ku mezin bûne lê hîn hêk nakin
mengal	Dasê mezin
meske	Nivîşk
Melte	Meqsed
Mefer	Hêz û qawet
mexelgah	Cihê istraheta pêz
mergan	Nêçîrvan
Meçît	Mizgeft
merixandin	Xewandin yan raketandina hesp û keran

Mûzî	Pariyên mezin yên xwarinê
Mizî	Bêhal û tenbel
Moj	Jinap
minminîk	Perperok
Mird	Cureyeke bihokan e
Mired	Mirî
mala ku	Xwezî ku
Mida	Hêvî
Micî	Nîsk
Malîn	Temîzkirin
Mang	Gêj û mat
malmişt	Çopên ku ji miştina malê berhev dibin
Mastan	Navê jinane, jinên ciwan û dilber
mekerçîn	Berazê mê
marzûpişt	Hestiyê seranserî yê piştê mirov
Nefçe	Cewan
nemekzewal	Kesê ku şukir nake, israfkar, kesê ku qedr û qîmeta qenciyan nizane
Nênir	Nexweşiya ku mirov kor dike

nîvtirk	Kesên ku baş nizanin kurmancî biaxivin, zimanê wan baş nagere
nemaz	Nimêj
Neqil	Çîrok
nûsikandin	Zeliqandin
negamerg	Kesê ku ji nêşka va dimire
nexere	Rêya teng û biçûk
Narî	Firavîn
nalijîn	Nalîn û ax û wax kirin
navpîl	Navmil
nika	Vê gavê, niha, noke. Niho.
Naraw	Tenbel
pa	Şiyar, hişyar.
Pîl	Mil
pabûn	Şiyarbûn, hişyarbûn.
padevan	Gavan, naxirvan.
perçiftin	Perçivîn, perçifîn, werimîn.
peqandin	Teqandin
Peg	Şefeq, serê sibehê

pijiqandin	Belakirin
Pamal	Binpê ji paymala farsî hatiye girtin
Pelik	Giyayeke dermanî ye ku bo qerisîn û nexweşiyê baş e
Pîj	Şîş, sîx
Pirikîn	Bêhniyîn
Pît	Şidandî
Pîtkirin	Şidandin
Pîşkîn	Bêhniyîn
Piz	Cenîn
Pesar	Çol
Pest	Nizm
Perêk	Hin, hin kes
Pizdan	Hevalê cenînê
pişirandin	Hûrhûrkirin
Permûç	Çilmisî
Pexte	Pembû
pelçiqandin	Teqandin, qeliştandin
Pût	Yekîneyeke endazegirtina weznê ku 16 kîlo ye

Pirtiftin	Şewitîn
Pirzilîn	Çilmisîn
pirandin	Lêxistin, lêdan, kutan.
Pirçene	Pirgep, kesê zêde diaxive
pirrikîn	Bênijîn, bêhnijîn, pişkandin, pişikîn, biniştin.
pûrtkirin	Pûrtikandin, pûrt jê rakirin. (k) bn :kirin.
Qizilbaş	Li Xorasanê bi mirovên zana û jîr ra dibêjin weke qizilbaşekê ye.
Qend	Şekerê hişk ku pê çayê vedixwin
Qers	Çepik
Qeter	Rêz, dibe ku ji qetara erebî hatibe girtin
Qîl	Didanê heywanên dirende
Qewax	Şkeft,
Qefçil	Pîs, nepaqij
Qeftal	Kêlek
Qefs	Payîz
Qelp	Asê
Qerez	Dijminî, mebest û meqsed
Qulmit	Qalind, stûr



Qonc	Qurmê darê
qerrişîn	Terikîna ji ber sermayê
Qunde	Pembû
Qurne	Nêrî, navoka giyayê
Qiçik	Biçûk
Qulp	Destiyê firaxan
qurifandin	Dewisandin, guvaştin
qurijandin	Bi dengê bilind axifîn
Qincîr	Çilmisîn, permûçbûn
Qoşme	Navê sazê ye ku ji hestiyê baskê bazan çêdibe
Qarok	Kesê ku zû diqehere
Qij	Tevlihev
Qirim	Nexweşiya bêderman ku ji bo heywanan dihê
qajeqaj	Deng
Qiştik	Balendeyeke mîna qijikê ye, nîşana şûmbûnê ye
Qaşil	Poste
Qirik	Qijik
Qirjilîn	Şewitîna sethî

qareyîn	Qehirîn, qarkirin, xeyidîn, hêrisbûn.
qawan	Berazê nêr
Qaçî	Meqes
qatix	Mast
qarkirin	Qareyîn, qehirîn, xeyidîn, hêrisbûn.
reşme	Kemberbendê mêran
radûkirin	Teqîbkirin, li pey çûn,
rûçikandin	Pûrtikandin, pûrt jê rakirin
rapêkirin	Bi dû ra çûn, radûkirin
rûkêş	Qumaş yan layeyek li ser tişteke danîn, ji farsî hatiye girtin
rengbaz	Hîlebaz, xapînok
rêjûblêj	Israfkirin
rêya kakêş	Rêya kadiz
Rîçe	Rîşe, kok
Rîv	Aveke nûsek ku dema zayînê ji bedenê derdikeve
Rijî	Dûyê reş/şewat/tiraf
reşandin	Belakirin
Refş	Xeml, xweşiktî

Rep	Rabûyî
Repal	Qambilind û zirav
rûkêşkirin	Poşandin,
rexne	Derz, derizîn, qeliştok
Rizî/riziyayî	Xerabbûyî
Rikîn	Serhişk
Rûgewr	Mezin
raparzinîn	Parzûnkirin
rahevketin	Bi hev ra şer kirin
raçavkirin	Çavdêrkirin
rameyandin	Tiştêkê dîk bi awayê asoyî li erdê danîn
ranekêş	Dirêjkirina karekê
raxîşkirin	Li pey xwe kişandin
rûqalbûn	Bi kesekê ra şerkirin
ragankirin	Zêde dotina şîr ji çêlekê yan pez
rageriyan	Dînbûn
ragirtin	Kêm xerckirin
raketin	Razan

raşikestin	Temambûn, nêzî dawiya demekê bûn
ragûm	Kesê ku rêya xwe wenda kiriye
rapêkirin	Li pey hev çûn
rajandin	Livandin
rîvî	Rovî, navê heywanekê ye
sa/sewa/sewê	Bo/ ji bo
serbider	Pispor
serbîrkin	Bibîranîn
Sîs	Spî
sêxiştî	Ji sê rêzan pêk dihê/ berbilavtirîn qaliba helbestan li Xorasanê
sêvê zemînî	Kartol
sîqal	Saf û biriqandî
sêvik	Navê hestiyekê ye li ranê mirov
serpê	Kelepaçe
Sîrt	Bilindî, berzahî
silûk	Navê canewereke biçpk e ku li derdora avê dijî
serbar	Barê zêde
sellat	Leqeba eskerên tirman û orisan

Sem	Jehr, ji farsî hatiye girtin
sewad	Şiyana xwendin û nivîsînê, ji farsî hatiye girtin
sewaddar	Xwenda
stewr	Neza
sîpildax	Sorbûna post yan birîndarbûna bedenê mirov
serhewale	Berbijor
serekîlepa	Berbijêr
Seft	Deng dibe ku ji sewta erebî hatibe girtin
selabela	Şewirîn
seqetbûn	Mirina heywanên heramgoşt
seraw	Jor
siresir	Bi dengê nizm axavtin
sersa	Haydar
sekirin	Lêgerîn
Sû	Zat, batin
sûsnîmûsnî	Xalxalok
sîrelaş	Çêlikên balendeyên dema ku hîn biçûk û bê per in
simsimîn	Gerîna li derekê yan cihekê bi mebesta bi destxistina tişteke

Siza	Ceza
smar	Çem, rûbar
simsime	Cureyek xwarinê ye
salifîn	Idarekirin
şekirin	Kanîn, karîn, tiwanîn, şiyar.
serçavî	Serekanî, çavkanî, çavik.
şamar	Navekî jinane bo jinên kurd li Xorasanê
Şime	Şîrê pez û dewaran dema ku nû dizên
şingandin	Deng jê derxistin
şeliqîn	Birîndarbûna navranê mirov ji ber rêçûna zêde
şelûkût	Kesê nexweş û pîr
şemal	Ba
Şiyar	Dengê hespan
Şîlik	Ser serê mirov
şiyarkirin	Cotkirina erdê
Şeng	Xwar
şengij	Xwar
şengijîn	Xwarbûn

şewate	Birîndar û zererdîtî
Şelp	Pelê daran
şeqqe	Dunîv
şekerlêv	Lêvşekerî,
Şoxî	Henek, ji farsî hatiye girtin
Şûltî	Nerm û avekî
şevnêm	Ava ku êvarê li ser giyayan çêdibe
Şeşik	Navê lîstikekê ye
Şilî	Baran
Şixil	Parçeyeke biçûk ji darê
şîlwar	Damanê jinane
Şirim	Hindik û hêdî
şakê-makê	Navê lîstikekê ye li Xorasanê
tawandin	Pêçandin
Tîtik	Nozad, zarok, bebek
Tirêm	Gelo
Tîlaz	Saf
tiryak	Madeya hişbir, esrar

teliqîn	Zayîna heywanên heramgoşt
tendûr	Tenûr
taştemal	Aşpêjxane
talandin	Talankirin, tamamkirin
Toraq	Mastê hişk ku di postê da dihêlin
Tav	Roj
Tav	Baranê tund û têper
Têxer	Caşik, zarokê keran
Tell	Hempa, reqîb
temûz	Havîn
Teyar	Amade
teqafil	Ji nişkê va
tevdan/tavdan	Li hev xistin
tevrabûn	Balixbûn, mezinbûn
Teft	Germ
tefteba	Bayê germ
Tej	Qomaşên çêkirî ji pirça bizinan ku dixwazin pê konekê çêbikin
Tisî	Xalî



Tore	Şanoger/ hejar û feqêr
Teda	Bingeh
teraşe	Darên hûrik
Toqer	Karker
tûlûşî	Pereyê ku mêvan li dawetê xelatî mazûvan û bûk û zavayî dikin
tepandin	Tiştêkê bi zorê bixî nava tiştêke din
Titûn	Dû
Torqe	Navê balindeyeke efsanewî ye
Tûş	Hed û sinor
tûşeşhatin	Rûbirûbûn
Toqer	Eşîret
timêşe	Hertim
Tiftîk	Pirça pêz yan deveyan ku jê kuman çêdikin
tirmansehra	Kurdên Xorasanê bi Tirkmenistanê ra dibêjin tirmansera
tirman	Tikman
Taş	Xwarin
taştepêj	Aşpêj
taxil	Azoxe, azoqe, erzaq, xwarin.

tîkan	Strî, kelem, dasî, pîj. Ji tirkî hatiye girtin
Virnî	Berxên ku herî dawî tèn dinyayê
vabaydan	Ji nêşka ve ji xewê şiyarbûn
velandin	Helandin
vibirûskîn	Şerqdan,
vexemirandin	Bêdengkirin
veşemitîn	Ketin
veşikandin	Dulayekirin, takirin
vetewşîn	Kontorola xwe ji dest dan, şemitîn
werre	Wesa, weha, wilo, bi wî awayî.
xijxijonek	Cihê ku zarok xwe li ser berfê dixijxijînin
xapexap	Karekê bebername û bê plan
Xejîr	Laşxur
xêwebixar	Xêwe û Buxara, du bajarên Tirmanan ku berê bazara kolefiroşan li wir hebû
xêylek	Gelek
xêllik	Karasê şivanan yê ku ji kulavê tê çêkirin
xwezî	Avê devê mirov
Xîş	Xizm

Xerman	Bênder
Xewitîn	Lêgeriyan
Xesandin	Mêritî yan nêritî jê standin
Xurîn	Berî ku kesek taştê bixwe, dibêjin xorîn e
Xwînsar	Xemsar, bê hîs
Xef	Bêdeng
Xuriş	Mastê hişk
Xurandin	Tiştêk bi kesekê xurandin, dan xwarin
Xudgo	Şair
Xurag	Xwarin
Xwastok	Parseksifet
Xwang	Xwîşk
Xwastigar	Xwazgîn
Xopan	Wêran
Xorr	Ne qelew, kêr wezn
Xore	Cizam, nexweşiyek e
Xicaw	Deng, awaz
xizan	Zarok

Xij	Şemitok
Ximexim	Kelîna avê ji bin erdê
Xilxilandin	Westandin
Xişt	Kelpêç
xerman	Melok, komeke qesela genim, ceh , nok û hwd.
xermangeh	Ciha ku çend xermanan tê de kom dikan.
xizan	Zarok
Zimang	Cihê ku piraniya demê sî ye û roj li wê derê nakeve./ bervajiya berojê
Zaw	Newal
Zawçe	Newalê biçûk
Zireme	Bêmentiq
Zikine	Kesê ku zêde ji xwarinê hez dike
Zille	Westiyayî
Zoq	Kevirê biçûk
Zûlle	Dengê guran
Zîne	Pilekan/ merdeven

*Cedwela 6: Ferhengok*